

K.T.
ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ



MAKEZAGONA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

MEWLÛDNAME'YA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ: BANDORA WÊ YA LISER
ZIMAN, ÇAND Û WÊJEYA KURDÎ
(METN & LÊKOLÎN)

LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

ÎDRÎS KAVAL

ŞÊWIRMEND

Por. Dr. VECHÎ SONMEZ

WAN-2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



MOLLA HÜSEYN-İ BATEYİ'NİN MEVLİDİ: KÜRT KÜLTÜRÜ, DİLİ VE
EDEBİYATI ÜZERİNDEKİ ETKİSİ
(METİN & İNCELEME)

YÜKSEK LİSANS

HAZIRLAYAN

İDRİS KAVAL

DANIŞMAN

Por. Dr.VECHİ SÖNMEZ

VAN – 2019

KURTE

MEWLÛDNAME'YA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ: BANDORA WÊ YA LISER ZIMAN, ÇAND Û WÊJEYA KURDÎ

Îdrîs KAVAL

Mela Huseynê Bateyî, yê li Colemêrgê, li Gundê Bate hatiye dinyayê û mexlesa xwe ya edebî jî ya ji vî gundî wergirtî. Melayê Bateyî, zana û helbestvanekî hêja yî Kurd e. Bateyî bi berhem û terzê xwe yê resen ve, yê bûye stêrkeka geş ya Cîhana Edebiyat'a Kurdî. Bateyî, di Dîroka Edebiyata Klasîka Kurdî de, xwediyê yekemîn Mewlûda Kurdî û menzûm e. Ev Mewlûd hêj nihe jî di nav gelê Kurdistanê de, dema şahî, qendîl û rojên pîroz di ête xwendin û guhdarkirin. Bateyî, bi vê berhema xwe ve, yê bûye sazûmanê "Ekola Bateyî" û bi terzê hunermendiya xwe ve jî, ji bû avahiyê edebiyat, huner û çanda Kurdî, yê bûye xîm û sitûnek bingehîn.

Heta nihe çî lêkolîn û vekolînên akademîk bi vî rengî, di derbarê şirovekirin û hilsengîna Mewlûda Bateyî de nehatîne kirin. Ya ku me tespît kirî, li ser Bateyî û berhemên wî heta nihe tenê du xebatên akademîk yê hatîne kirin. Lê ew jî ne di vî warî de ne. Xebatên akademîk yê ku li ser Bateyî hatîne kirin: Ya yekem Zîver Îlhan, bi navê "Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)" û duyem ji ya Hayder M. Othman e, bi navê "Di Helbestên Melayê Bateyî Da Binyada Hizr û Rûxsarê" ye.

Peyvên ku em biberfîrehî li sersekinîn û me beyan kirîn: **Dîn, Çand, Ziman, Edebiyat** û têkiliyên van peyvan yê bihevrene. Wek têkiliya **dîn û çand**, têkiliya **dîn û zimanî**, têkiliya **dîn û edebiyatê**, têkiliya **çand û zimani**, têkiliya **çand û edebiyatê**; têkiliya **ziman û dînî**, têkiliya **ziman û edebiyatê** û têkiliya **edebiyat û dîrokê**.

Peyvên Sereke:

Melayê Bateyî, Mewlûd, Çand, Ziman, Dîn, Bandor, Edebiyat, Kurdî û Têkilî.

Hejmara Pera : 164

Şêwirmend : Por. Dr.VECHÎ SONMEZ

ÖZET

MOLLA HÜSEYN-İ BATEYİ'NİN MEVLİDİ: KÜRT KÜLTÜRÜ, DİLİ VE EDEBİYATI ÜZERİNDEKİ ETKİSİ

İdris KAVAL

Molla Hüseyin Bateyi, aslen Hakkari'nin Bate köyündendir ve Bateyi, edebi mahlasını da buradan elde etmiştir. Bateyi, Klasik Kürt Edebiyat'ının en önemli şairlerindedir. Gerçek adı, doğumu ve yaşadığı yüzyıl hakkında araştırmacılar farklı sonuçlara varmışlardır. Bu çalışmaya göre; Bateyi'nin gerçek adı **Mela Huseynê Bateyî**'dir ve Bateyi, XVIII. yüzyılda, yaklaşık 1750 civarında yaşamıştır.

Bateyi, Kürt Edebiyatı'nda ilk Kürtçe Mevlid'i yazan bir şair ve alimdir. Bateyi Mevlid'te, Hz. Muhammed'in Nuru'nun yaratılışını, doğumu ve çocukluğunu mucizevî, edebi ve manzum bir şekilde yazıya dökerek paha biçilmez ve kendisini aşılmaz bir **Mevlid'i Nebi** eserini Kürd Edebiyatı'na kazandırmakla, Mevlid alanında **Bateyi Ekolü**'nün oluşmasına vesile olmuştur.

Bateyi hakkında, şimdiye kadar yapılan çalışmalar, Bateyi'nin gerçek edebi değerini ortaya koymakta eksik kalmıştır. Şimdiye kadar tespit ettiğimiz, akademik düzeyde, sadece iki tane yüksek lisans tezi yazılmıştır. Birincisi Zafer İlhan, Bateyi'nin Mevlüdü üzerine; "**Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)**" ismi ile 2014 yılında Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümüne sunmuştur. İkincisi, Hayder M. Othman, "**Di Helbestên Melayê Bateyî Da Binyada Hizr û Rûxsarê**" adlı çalışmadır, 2016 yılında Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümüne sunmuştur.

Fakat şimdiye kadar, Bateyi'nin edebi kişiliği üzerine ve Bateyi'nin okuyucularını bu kadar kendisine hayran bırakmasının sebepleri üzerine ciddi her hangi bir araştırma yapılmamış. Bateyi'nin asıl Kürtçe kelime ve deyimlerini korumada ne kadar hizmetler vermiştir? Mevlid ile Kürd kültürüne, Kürt Edebiyatı'na ve Kürt Dili'ne ne kadar etkide bulunmuştur? gibi sorular şimdiye kadar yanıtız kalmıştır.

Anahtar Kelimeler: Melayê Bateyî, Mevlid, Klasik Kürt Edebiyatı, Çand, Dil, Edebiyat, Din Etkisi.

Sayfa Sayısı : 164

Tez Danışmanı : Por. Dr.VECHÎ SÖNMEZ

ABSTRACT
THE MEWLÛD OF MOLLAH HUSEYN BATEYÎ
İdris KAVAL

Mollah Huseyn Bateyî is from Batê village and he has taken his pen name from there. Today, Batê village is administratively in Beytüşşebab where depends on the town of Sirnak. Bateyî is one of the most important poet of Classical Kurdish Literature. Researchers have different results about his real name, birth and lived a century.

Bateyî is the owner of the literary works personality. He is the first mewlûd writer poet in Kurdish literature. The Mewlûd which was written by poet in accordance with mewlûd writting tradition, it has written with shape of poetry masnavi. In addition, there are verses praising about Allah and Muhammed in this book such as Muhammad's birth and his childhood have been explained in a miraculous way. His poems which scattered in different places, was collected in recent years by precious researchers. Some of these poems in terms of contents are munacaat, some of them are naat, and some of them are also human love themed poems.

Batê has not got a certain divan of poems, but he wrote many greatful poems which are known by heart among people. Some of his poems are being song by singers and dengbêj. Many writers and researchers who are interested in the history of Kurdish literature have written about Melayê Batê, but their studies are restricted to his biography, his life, death, and they have collected only some of his poems. Until now there is not a scientific study about his poetry.

As Batê is a classical poet of Kurdish; he often used words from Arabic, Persian and Turkish languages. For this reason we added a dictionary in the final section in order to make Melayê Batê's poems more understandable for readers.

Key Words : Melayê Bateyî, Mevlid, Classical Kurdish Literature, Chand, Language, Literature, Religion Influence.

Page Numbers: 164

Thesis Advisor: Prof. Dr. VECHÎ SONMEZ

NAVEROK

KURT	I
ÖZETİ	II
ABSTRACT	III
NAVEROK	IV
KURTEBÊJE	VI
PÊŞGOTIN	VII

DESTPÊK	1
I. DI EDEBIYATA KURDÎ DE MEWLÛD	1
1.1. Wateya Peyva “Mewlûd”ê	1
1.2. Kevneşopiya Mewlûd'ê	1
1.3. Mijarên Mewlûdan	2
1.4. Di Zimanên Cuda de Mewlûd	3
1.5. Mewlûdên Kurdî	3

BEŞA YEKEM

JIYAN Û BERHEMÊN MELA HUSEYNÊ BATEYÎ	4
1. JIYANA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ	4
1.1. Welatê Bateyî Hekkarî û Colemêrg	4
1.2. Gundê Bate Yê Ku Melayê Bateyî Mexlesa Xwe Ya Edebî Jê Wergirtî	5
1.3. Dîroka Gundê Bate	5
1.4. Navê Bateyî	5
1.5. Jiyana Bateyî û Serdema jiyana Wî	7
1.6. Xwendina Bateyî	10
1.7. Mexles û Nasnavên Bateyî	12
1.8. Nesla Bateyî û Dumêza Wî	13

2. BERHEMÊN BATEYÎ	15
2.1. Mewlûda Bateyî	15
2.2. Hemaîl'a Bateyî	16
2.3. Helbestên Bateyî.....	16

BEŞA DUYEM

1. DÎN, ÇAND, ZIMAN, EDEBIYAT Û BANDORA WAN LISER MEWLÛDÊ	17
1.1. Dîn	17
1.2. Çand	20
1.3. Ziman	24
1.4. Edebiyat.....	25
2. TÊKILIYÊN DÎN, ÇAND, ZIMAN Û EDEBIYATÊ	27
2.1. Têkiliya Dîn û Çandê.....	27
2.2. Têkiliyên Dîn û Ziman	29
2.3. Têkiliyên Ziman û Çandê	29
2.4. Têkiliyên Ziman û Edebiyatê	30
3. BI ÇEND UNSÛRAN VE BANDORA MEWLÛDÊ LISER ÇAND, ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ.....	30
3.1. Bi Unsûrên Edebî Ve	30
3.2. Unsûrên Hunerî	34
3.3. Bi Unsûrên Dînî Ve.....	40
3.4. Bi Unsûrên Zimanî Ve	82

BEŞA SÊYEMÎN

1. METNÊ MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ.....	94
2. ENCAM.....	147
3. ÇAVKANÎ.....	153
4. PÊVEK	156

KURTEBÊJE

amd.	:	amedekar
b.n.i.b	:	binêre nusxeya idrîs Bateyî
h.	:	hejmar
h.b.	:	heman berhem
hwd.	:	her wekî din
m.	:	mirin
p.r.	:	partîka Xalid Sadînî
r.	:	rûpel
sxl.	:	silavên xuda liser bin
wer.	:	werger
t.b.b.	:	li tevahiya berhemê binêrin

PÊŞGOTIN

Edebiyata Klasîk, wekî behr û deryayan ya berfireh, kûr û dirêj e. Di vê derya û behrên çandî û edebî de tijî dur, yeqût û mercanêt edebî yê heyn. Behr û deryayek ji wan jî Edebiyata Klasîka Kurdî ye. Ew kesê ku xwe li vê derya û behra edebî day û bi awayek melevan ve di nav de geriyay, ew wan nîrxên edebî dibîne, jê îstîfade diket û ji bona îstîfadekirinê jî wan di danîte qada edebî. Lê me dît û tespît kir ku durr û yeqûtên wek Bateyî di vê deryayê de, heta nihe bi awayekî hurgulî û berfireh nehatîne tespît kirin û qîmeta wî ne hatiye zanîn û diyarkirin. Edebyata Klasîka Kurdî di hemî waran de ya beyar e û pêwîstî bi xebat û lêkolînên zanyarî û 'ilmî ye; da ku ew nîrxên edebî û çandî bêne zanîn û ji hunera wan hunermendan îstîfade bête kirin.

Melayê Bateyî wekî dur û yeqûtekî di nav vê deryaya edebî de bi awayek dînî ve bi lewnek zindî dîtewîstî. Ji ber mijar û bandora Mewlûdê ya dînî, me di vê xebatê de giranahî da ser aliyê Bateyî yê dînî û Mewlûdê, kaca nîrxên dînî li ser çanda Kurdî çine, çi qas û çawan bandor liser çand û zimanê Kurdî kiriye? Bi vê mijarê ve jî me tespît kir ku Bateyî li ser Çand û Edebiyata Kurdî bandorek hêja ya kirî û di warê edebî de wek durr û yeqûtan di nav Cîhana Edebiyata Kurdî de dibirisqe û pêşiya şa'îr û hunermendên dîv xwe jî ya rohnî û geş kirî.¹

Mijara teza me **Bandora Mewlûdê ya ku li ser Çand, Ziman û Wêjeya Kurdî**'ye. Em bi taybetî li ser "**Mewlûda Nebî**" sekinîn û me ev berhem ji layê çandî ve vekoland û şîrove kir kaca bi çî awayî bandor liser çand, ziman û edebiyatê hatiye kirin. Ji ber ku mijara Mewlûdê Hebîbê Xweda Hz. Muhammed e, em bi taybetî li ser aliyê wê yê dînî jî rawestiyan û me bandora wê ya di warê dînî de jî li ser çand, ziman û wêjeya Kurdî tespît û şîrove kir.

Mela Huseynê Bateyî, bi 'eslê xwe ve ji Gundê Bate'yê ye û yê li Gundê Bete hatiye dinyayê û nasnav û mexlesa xwe ya edebî jî ya ji vî gundî wergirtî.² Gundê Bate, îro ji aliyê îdarî ve yê liser navçeya Elkê. Elkê jî ya li ser wîlayeta Şîrnexê. Kar û xebatên heta ku nihe lêkolîneran liser Bateyî kirîn, li ser navê wî, li ser jidayikbûna wî û sedsala ku tê de jiyay, tam

¹ M.Xalid Sadî (2009), *Mela Huseynê Bateyî Jiyana, Berhem û Helbestên Wî*, Nûbihar Yay, İstanbul, r. 33

² İlhan Ziver (2013), *Mewlûda Melayê Bateyî*, (Teza Lîsansa Bilind, a ne weşandî.) *Enst. zimanên Zindî Zanîngeha Artukliyê, Mêrdîn* r. 19

nehatîne tespîtkirin û yên gihîştine encamên ji hev cuda.³

Li gorî vê xebatê, navê Bateyî, **Mela Huseynê Bateyî** ye û Bateyî, yê di sed sala XVIIIan de, nêzîkî 1750'ê yê jiyay. Bateyî şexsîyetekî xwedî berhem e. Di Dîroka Edebiyata Kurdî de helbestvanê ku cara yekem Mewlûd'a Kurdî nivîsî Bateyî ye.⁴ Mewlûda ku helbestvan nivîsî, ya li gor kevneşopîya nivîsîna mewlûdan bi şîklê nezma mesnewî hatiye vehonandin.⁵ Di berhemê de, beş û risteyên ku meth û pesnên Xwedê û Hz Muhemmed(sxl) didin, yên hatîne nivîsîn û ji xuliqandina nûrha Pêxemberî heta ji dayikbûn û zarokatiya Wî, bi awayek edebî û mu'cîzewî jê hatiye behs kirin û ew mijar bi awayek edebî yê vehonandin.

Heta nihe çî lêkolîn û vekolînên akademîk bi vî rengî, di derbarê şîrovekirin û hilsengîna Mewlûda Bateyî de nehatîne kirin. Ya ku me tespît kirî, li ser Bateyî û berhemên wî heta nihe tenê du xebatên akademîk yê hatîne kirin. Lê ew jî ne di vî warî de ne. Xebatên akademîk yên ku liser Bateyî hatîne kirin, ya yekemîn; Zîver İlhan ya di sala 2014 an de bi navê "**Mewlûda Mela Huseynê Bateyî (Metn û Lêkolîn)**" ye, wek **Teza Lîsansa Bilind** ya ji Zanîngeha Artûqluya Mêrdînê re pêşkêş kirî. Xebata duyemîn jî ya Hayder M. Othman e. Othman jî ev xebata xwe ya bi navê "**Di Helbestên Melayê Bateyî Da Binyada Hizr û Rûxsarê**" ve kirî û di sala 2016 an de wek **Teza Lîsansa Bilind** ya ji Zanîngeha Yûzûncû Yîla Wan'ê re pêşkêşkirî.

Çavkaniya ku min ji bona beytên Mewlûdê bîngêh girtî Nusxeya Îdrîs Bateyî ya neçapkirî ye. Me ji bo mînakên beyt û risteyên Mewlûdê ev nusxe bîngêh girt. Ji bona şîrove û şerha Mewlûdê, çavkaniya min ya herî girîng û yekem jî nevyê Mela Huseynê Bateyî yê heftemîn, ê ku nihe jî bi nêzî 80 saliya xwe ve li Gundê Qewalê dijîtin, Mela Salih Qewal e.

Teza me, ya ji despêk û sê (3) beşan ve pêk hatî:

Em di **despêkê** de, li ser peyva "**Mewlûdê**", "**Kevneşopîya Mewlûdê**" û "**Cihê Mewlûdê di Edebiyata Kurdî de**" sekinîn.

Di **Beşa Yekem** de, li ser "**Jiyan û Berhemên Bateyî**" û Çavkanîyên wî sekinîn.

³ Hayder Mohammed Othman (2016), *Di Helbestên Melayê Bateyî de Hizr û Rûxsarê*, (Teza Lîsansa Bilind, a ne weşandî.) *Enst. zîmanên Zindî Zanîngeha, Van Yûzûncû Yîlê Wan*, r. 45

⁴ M. Zahir Ertekin (2015), "Yekem Mewlûda Kurdî û Bandora Wê ya Li Mewlûdên Dû Xwe", *Beytüşşebap ve Molla Hüseyin Batevî Sempozyum Bildirileri*, İstanbul: Şırnak Üniversitesi Yayınlar, s. 183-199.

⁵ OTHMAN, b.n.b., r.33

Di **Beşa Duyem de**, li ser wate û bingehê peyvên "**Dîn**", "**Çand**", "**Ziman**", "**Wêje**" û "**Edebiyat**"ê sekinîn û pişt re jî me di derheqê "**Têkiliyên Dîn, Çand, Ziman û Edebiyatê**" de çend agahî dan û "**Bandora Mewlûdê**" ya liser "**Çand, Ziman û Edebiyat**" beyan kir.

Di **Beşa Sêyem** de jî em liser "**Metnê Mewlûda Mela Huseynê Bateyî**" sekinîn û me ev metne li ber heft (7) nusxeyên cuda ji nûve kirîtîk kir û nivîsî. Ji bû vê xebatê min nusxeyek metnê Mewlûdê, ji bû ku metnek resen derkeve holê, li ber metnê Mewlûd'a Gundê Qewalê, ya ku neviyê Mela Huseynê Bateyî yê heftemîn, Mela Salih Qewal li gor selîqe û xwendina bab û bapîrên xwe yê heta heftê xwendîn û nivîsîn, amadekir, ji ber ku ev kevneşopiya selîqeya mewlûdê ya dumêz û neviyên Bateyî heta babê heftê berdewam kirî bi vê wesîleyê ve bête parastin. Ji bo amadekirina Metnê Mewlûdê, Çap û Nusxeyên ku li pêşçav û bingeh girtin ev heft (7) hebin:

1. Nusxeya Mela Salih Qewal
2. Çapa Îlhan Zîver
3. Nusxeya Gundê Bate
4. Çapa Husên Şemrexî
5. Çapa 'Ebdulbasîd 'Ebdulsemed.
6. Çapa Xalit Sadînî
7. Çapa Zeynel 'Abidîn Zinar

Bi wesîleya vê rêbaz û xebatê ve, ji bo ku di dawiyê de metnekî nêzikî metnê orjînal yê destxetê Bateyî derkeve holê, me guhdariya selîqeya xandina çar melayên ku, bi babikê heft û heştê ve digehine Bateyî kir. Ji bûna sererastkirin û nivîsîna metnê mewlûdê lî, me gelek îstîfade ji Mela Saih Qewal kir û ji bilî wî jî me ji Mela Mehmût, Mela Teyîp û Mela Qiyas Qewal jî Mewlûd guhdar kir û wan jî ji bûna metnekî resen kedek mezin da. Ji bûna vê keda wan hemiyar sipasdarim.

Di hemû pêngavên nivîsîna vê tezê de ked û xuha hevîna min Cerîdê û dîde û bînahiya çavêt min Rêber û Rêzan jî zêde ye. Ji bûna vê keda wan jî gelek sipasdarim. Di amadekirina vê tezê de, rêberî û şîretên şewîrmendê min Prof. Dr. Vechî SONMEZ gelek çêbûn. Ez bi taybetî sipasiyên xwe ji re dikem. Doç.Dr. Nesim SONMEZ jî ji bû min gelek bû arîkar û rêzan. Ji bûna rêber û rêzaniya wî jî gelek sipas dikem.

Îdrîs KAVAL

Wan -2019

DESTPÊK

1. DI EDEBIYATA KURDÎ DE MEWLÛD

1. 1. Wateya Peyva “Mewlûd”ê

Mewlûd, peyveke 'Erebî ye. Ev peyv ya ji peyva “wîladet” ê hatiye bidestxistin. Peyva "mewlûdê" ji aliyê wateya ferhengî ve tê wateya dem, dîrok û cihê jidayikbûnê. Her disa di ête wateya rojbûyîna kesekê⁶ û kesê ku ji nû ve jî hatiye dinyayê.⁷

Bi Awayê Terîmê ve Peyva Mewlûdê di ête du Wateyan:

- a. Merasîmên ku ji bo bîranîna dem û dîrok û roja jidayikbûyîna Hz. Muhammed(sxl.) têne çêkirin.
- b. Berhemên ku behsa bûyerên berî jidayikbûna Hz. Muhammed (sxl.) û bûyerên piştî jidayikbûna wî qewimîn diken.
Çi merasîm bin, çi berhem bin; wateya termînolojîk a "mewlûdê" bi şexsê Hz. Muhammed Pêxember (sxl.) ve girêdayî ye.

1.2. Kevneşopiya Mewlûdê

Pîrozbahiyên mewlûdê cara pêşî, bi awayekî fermî di serdema Fatimiyan de, li ser wextê Mu'iz Lîllah (972-975) de yê hatîne dest pêkirîn. Paşê di serdema bûrayê Selahaddînê Eyûbî, Atabegê Hewlêrê Muzaferuddîn Gokborû de (1190-1233), di nav gel de yê belave bûyn.

Beriya Gokborû, **Sibt Ibnu'l-Cewzî**(1201), behsa mewlûdên derdora Bexdayê û xelatên ku mewlûdxanan diwergirtin, kiriye.⁸ Ji ber ku di serdema Selçûqîyan, Eyyûbîyan, Memlûqîyan û Osmanîyan de vê kevneşopiyê berdewam kiriye piştî hingê jî ev kevneşopiye ya di nav gelên Misîman de belav bûy û rûniştî. Ev kevneşopiye, hêj jî di nav gelek cîvakên Misîlman de, tê pîrozkirin û berdewamkirin.

Di serdema Ebu'l-Ebbas Ehmed b. Muhammed b. Huseyin es-Sebtî el-Azefî (1236) de,

⁶ Ferit Develioğlu (1996), Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Sözlük, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, r. 636

⁷ Ziver, b.n.b.r.54

⁸ Ahmet Özel (2004), İslam Ansiklopedisi, Diyanet Vakfı, cilt29, Ankara, r. 475

merasîmên mewlûdê yên li Bakurê Afrîqayê destpêkirîn û paşê li Endulusê jî yêt belavebûyn.

Mebest û armanca merasîmên pêşî di sîyasî bûn. Ev merasîme, pitir li seray û qesrên mîr, hakim û padîşahan de, bi awayekî fermî û ji gel dûr ve di hatine sazîkirin û pîrozîkirin. Di wê serdemê de, hêj helbest nederketibû pêş û merasîmên mewlûdê tenê ji bo Hz. Muhammed (sxl.) ne di hatine nivîsîn. Ji bo Îmamê 'Elî, keça Pêxember Fatma, Îmam Hesen, Îmam Huseyn û ji bo çar xelîfeyan jî mewlûd dihatine nivîsandin û vehonandin.

Mewlûdnameya herî kevin **“Mewlûdu’l-Erûs”** e. Ji bilî vê di serdema Atabegê Hewlêrê Gokborû de, ji aliyê Zanyarê Hedîsê Îbn Dîhye ve mewlûdnameyek ya hatiye nivîsîn. Ev berhem jî di nav berhemên kevin ên mewlûdan de derbas dibe.⁹

1.3. Mijarên Mewlûdan

Naveroka hemû mewlûdan ne weke hev e. Her şa’îrek li gor xwe mijarekê ji yekê di hîlbijêre û li gor usluba xwe berhema xwe di vehonîtin. Lê mewlûdên ku ji bo Hz. Muhammed hatîne nivîsîn, bi tevayî, nûra Hz. Muhammed, ji dayikbûna Wî, bûyerên ku ji ber bûyîna Wî qewimîne, jiyana Wî, exlaq û şema’îla Wî, mesaja îlahî ya ku cenabê Pêxember aniye, hezkirina Pêxember û pesindana Pêxember yên kirîne mijarên mewlûdên xwe. Di hin mewlûdan de jî beşên weke mî’racê û wefata Cenabê Hz. Muhammed (sxl.) jî yêt hatîne nivîsîn.

1.4. Di Zimanên Cuda de Mewlûd

Mewlûd, heta niha bi gelek zimanan ve yêt hatîne nivîsîn. Mewlûd pêşî bi Zimanê 'Erebî yêt hatîne nivîsîn. Hêj di sedsala XVan de, nêzîkî 500 mewlûdên 'Erebî yêt hatîne tespîtîkirin. Navên mewlûdên 'Erebî bi tevayî **“Mewlûdu’n-Nebî”** an jî **“Mewlûdu’u Resûlîllah”**¹⁰ e.

Di Edebiyata Tirkî de jî mewlûdan cihekî giring yê girtî. Heta niha 63 berhemên mewlûdê yên ku bi zimanê Tirkî hatîne nivîsîn, yêt hatîne tespîtîkirin.¹¹ Li gorî lêkolîna Hasîbe Mazîoğlu, ji bilî 63 mewlûdên ku Ayşe Necla Pekolcay’ê tespîtî kirin, 12 mewlûdên din jî yêt hatîne tespîtî kirin.¹² Di nav van me-wlûdan de, ya herî zêde bi nav û deng **“Vesîletu’n-Necat”** e. Ev

⁹ Ziver, b.n.b.r.58

¹⁰ Ziver, b.n.b.r.59

¹¹ Ayşe Necla Pekolcay(1993), Mevlid, Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, r.40

¹² Hasibe Mazîoğlu (1997), Türk Edebiyatında Mevlid yazan Şairler, Ankara Üniv. DTCF Türkoloji Dergisi, c.6., h.1, r.32

Mewlûd'e ya ji aliyê Sulêman Çelebî ve hatiye nivîsîn. Irmgard Engelke, ev Mewlûda Çelebî ya wergerandiye Almanî û F.Lyman Mac-Callum jî ya wergerandiye Ingilîzî.¹³

Di kutupxaneyên Tîrkiye'yê de ji bilî Mewlûdên 'Erebî û Tîrkî; Mewlûdên Farisî, Kurdî, Arnawûdkî, Çerkezî, Boşnakî û Rûmkî jî hatîne tespît kirin.¹⁴

1.5. Mewlûdên Kurdî

Di Edebiyata Kurdî de nivîsandina Mewlûdê ya bi Melayê Bateyî dest pêkirî, di bin bandora wî de ya bi pêş ketî û li gor wê bandorê jî **Ekola Bateyî** ya derketiye holê. Kevneşopiya Mewlûdê di hemû zaravayên Kurdî de hêj jî berdewam diket, gelek mewlûd piştî Bateyî yê hatîne nivîsîn.¹⁵

¹³ Tayyip Okic (1995), *Tefsir ve Hadis Usulü'nün Bazı Meseleleri*, İstanbul, Nun Yay, s. 45.

¹⁴ Ziver, b.n.b., r. 23.

¹⁵ Ferhad Shakely (1998), *Modern Kürt Öykü Sanatı*, wer. Rohat Alakom, Avesta, İstanbul, r.22

BEŞA YEKEMÎN

JİYAN Û BERHEMÊN MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

1. JİYANA BATEYÎ

1.1. Welatê Bateyî Hekkarî û Colemêrg:

Hekarî, navê herêmê Hekariyatê ye. Bi hezar salane ku ev herêm bingehê jînê ye ji bû hemû cînare dewletan jî yê boye cihê jînek hevpar. Bi rêveberîya Mîr û Begên Hekariyê ve, Hekariyat ya li gor dem û dewran, li aliyê sînoran ve hatiye guhartin û herêm carna ji Wan, Bîtîs û heta Amedê berfireh bûy û rêveberên demê, hukmê xwe li tamamî Bakurê Kurdistanê yê reşandî. Di van çaxên dawî de, di nabeyna salên 1840-1850 de, li ser dewrê Padîşahê Osmaniyan Ebdulhemîd'ê Duyem de, li ser hukumraniya Mîrê Hekariyê Nurullah Begê, Mîrektiya Hekkariyê bi bêşengî û serkêşîya Mîrê Cizîra Botan Bedîrxan Begê û bi piştgiriya Mîrê Miksê Xan Mehmud Begê ve tifaqa Kurdistanê pêkanî. Lê Belê bi hîle û pîleyên Ingilîziyan ve Dewleta Osmaniyan ev hukumranî û tifaqa Kurdan belavkir û dawî li Mîr û Begên Kurdistanê anî. Eve nêzîkî 150'î sale Osmaniya, Mîrektiya Hekkariyatê ya hilweşandî û bi dawî kirî.

Colemêrg di qedîm de navenda Mîrektiya Hekkariyê, Paytextê Mîrektiya Hekkariyê û cihê Mîr û Begên Hakariyê bû. Piştî ku Mîrektiya Hekariyê hate hilweşandin, Dewleta Osmaniya Wîlayeta Wan'ê ava kir û rêveberîya Hekariyê jî bi Wîlayeta Wanê ve girê da, heta ku Komara Tirkiyê avabûy. Piştî Komara Tirkiyê Hekarî wek şehrekê hate qebul kirin û binav kirin. Colemêr ji hingê were wek Hekkarî diête zanîn. Lê ya rast ewe ku Colemêrg di qedîm de navend û paytextê Mîr û Begên Mîrektî û Begîniyên Hekariyatê bû.

Sadînî li ser vê mijarê weha dinivîse: "Hekarî, ji demên neolotîk heta nihe cihê jiyana mirovan bûye. Hekarî cihekî avadar, çiyayî û zozanî ye. Pez û heywan û dewar lê têne xwedîkirin. Ji ber hindê jî herdem yê bûye cihê êrîş û nijdeyên qebîle, 'eşîret û dewletên din. Hekarî di dema Xelîfetiya Ebbasiyan û Buweyhiyan, li devera Bexda û Mezopotamyayê û ji dema Eyyûbiyan ta dema Osmaniyan, mîrektiya Hekkariyê hebû û roleke wê ya girîng di dîroka

Kurdistanê de hebû. Mîrektiya Hekariyê di dema Nûrullah Begê de li gel Mîrektiya Cizîra Botan hate hilweşandin. Mîrektiya Hekariyê di dema Suleyman Begê de qediya û bi ser Muteserrifiya Wanê ve hate girêdan."¹⁶

1.2. Gundê Bate Yê Ku Melayê Bateyî Mexlesa Xwe Ya Edebî Jê Wergirtî

Bate, gundekî qedîmtirîn/kevintirîn ji gundên mîrektiya Hekariyê ye.

Ji Colemêrgê heta Bate, di rêka Siwara Xelê de, 85 km ye. Bes gundê Bate bi ser qeza Elkê/Bêşebabê, di sala 1991ê de, ji ber îdareya awarte bi ser Şirnexê ve hate girêdan. Ji ber hindê jî, her çenda ku Bateyî, bi her awayekî ve di Colemêrgê jî bin, bi îdara xwe ya fermî ve yê li ser Şernexê. Ji Şernexê heta Bate 130 km ye. Navê vî gundî ji qedîm heta niha Bate ye û bi Tirkî jî navê wî "Guney Yaka" ye. Gundê Bate yê ketiye binê Derya Zêr, li silsila çiyayê Kato, ji Siwara Xelê wêdatire. Li doraliyên wî, piştî bakurê wê Derya Zêrî û zozan in. Bate, yê ketiye dolnewaleka mezin, gundekî bi dar û bar, bi av û derav e. Pêşiya 1990î nêzikî 50 mal lê hebûn. Lê niha ev jimare kêmtire.¹⁷

1.3. Dîroka Gundê Bate

Sadînî: "Di derbarê dîroka kevnare ya gundê Bate de me çû jêder û çavkanî nedîtine. Bes roja 17ê Tebaxa 2004ê ez bi xwe li gel Mela Muhemed Salihê Qewalî, ku wekî neviyên Mela Huseyn tê naskirin, çûme gundê Bate û me geryanek lê kir. Gundiyên ku li Bate dijîn kes nizane, ka bapîrên kê pêşiya kê hatine vî gundî. Bes qinyata min ev gund ji qedîm ta niha, yê misilmanên kurd e. Wan gundiyan jî ji bab û bapîrên xwe nebihîstine ku kesekî ji xeyrî misilmanan li vî gundî jiyabe. Ji xwe di her çar aliyên gund de behsa minasib û pîr û mezarên şêxa dihate kirin."¹⁸

1.4. Navê Bateyî

Di derheqê navê Melayê Bateyî de lêkolîner di hemfikir nînin. Hin ji wan dibêjin navê Wî "Ehmed" e, hind dibêjin navê Wî "Huseyn" e û hind jî di bêjin navê Wî "Hesen" e.

¹⁶ M.Xalid Sadînî (2010), *Mela Huseynê Bateyî Jiyân, Berhem Ê Helbestên Wî*, Nûbihar Yay, İstanbul, r. 11.

¹⁷ Sadînî, b.n.b. r. 13.

¹⁸ Sadînî, b.n.b. r. 13.

Lê wek Sadînî gotî,¹⁹ ez jî ji ber **çar defîlan** di bêjim navê **Bateyî** yê rast "**Huseyn**"e û di nav xelkê de wek **Mela Huseynê Bateyî** tê zanîn.

Delîlê Yekemîn: Li ser "**Hemaîl**"a Bateyî ya ku neviyên keça wî Zulfê, parastine, ku nihe jî li dev Mela Hecî Muhemmedê Şembî ye, wisa ya hatiye nivîsîn: "**Sahîbûhû we Malîkûhû Huseyîn binî Mustefa.**" Yanî xudanê vê "**Hemaîl**"ê Huseyîn ê kurê Mustefa ye. Navê nivîskarê "**Hemaîl**"ê "**Huseyn**"e.

Delîlê Duyemîn: Mela Durbaz, neviyê Mela Huseyn, li ser "**Hemaîl**"a ku nihe li dev neviyê Bateyî Mela M. Salih Qewal e û nusxeyek vê Hemaîl ê nihe ya di dest min jî de, di perê dawî de wisa ya hatiye nivîsîn:

"**Sewedehû Mela Durbaz binî Mela Tahir binî Huseyn.**" Yanî yê ku eve nivîsî Mela Durbaz ê kurê Mela Tahir ê kurê **Huseyn** e. Heke ku ev "**Huseyn**" e Mela Huseynê Bateyî bît, wê gavê beyan e ku navê Mela Huseynê Bateyî, "**Huseyn**"e.

Di vê agahiyê de, di derheqê dumêza Bateyî de agahiyek jî derdikeve holê: Yanî sê babîk der dikevine holê: Mela Durbaz, Mela Tahir û Huseyn. Lê belê ya ku nediyar û herî balkêş ew e ku leqebê "**Mela**" ji bû "**Huseyn**" ne hatiye nivîsîn. 'Eceba ev "**Huseyn**" Mela Huseynê Bateyî ye yan yek ji bilî wî ye. Heke ev "**Huseyn**"e Mela Huseynê Bateyî bi xwe nebîtin, wê gavê rêzebapka Mela Huseynê Bateyî, ya ku di beşa jêrîn de, Mela Salih Qewal bû me rêz kirî kêm dibîtin.

Delîlê Sêyemîn: Neviyên Bateyî yên li Gundê Qewal û Gundê Bate dijîn û xelkê Gundê Bate û Gundê Qewal û Herêma Lêwînê hemî jî, "**Bateyî**" bi navê "**Mela Huseynê Bateyî**" dizanin û dinasin. Li gorî neviyê wî Mela M. Salih Qewal, navê Bateyî yê rast "**Huseyn**"e û ji ber ku mela bû peyva "**mela**" û ji ber ku navê gundê wî Bate bû, Wî paşnav û mexlesa "**Bateyî**" ya li navê xwe zêde kirî û navê wî yê temam jî yê bûye **Mela Huseynê Bateyî** û heta nihe me ji bab û qalên xwe jî navê wî wek **Mela Huseynê Bateyî** yê bihîstî, zanî û gotî.

Delîlê Çaremîn: Li gor çend lêkolînerên dawîya vê sedsalê; wek Babê Zêrevanê, M. Xalid Sadînî, Me'rûf Xeznedar û Tehsîn Îbrahîm Doskî jî navê Bateyî yê rast "**Mela Huseynê**

¹⁹ Sadînî, b.n.b. r. 23.

Bateyî” ye. Lê Mele Mehmûdê Bazidî û Mehmed Emin Zeki Bey gotîne navê wî Ehmed e.²⁰

1.4.1. 'Eşîra Bateyî

Sadinî, di vê mijarê de weha dinivîse: Melayê Bateyî, ne ji Eşîra Ertûşiyîyan e. Lewra devoka Gundê Bate û ya Ertûşiyîyan ne wek hev e û mirovên Bateyî û Gundê Batê xwe ji vê 'eşîrê nahesibînin.²¹

Lê dema em li çapên Mewlûda Bateyî dinêrin, em dibînin ku li ser hinde çapên Mewlûdê, navê Bateyî, bi paşnavê **“Ertûşî”** ve wek **“Mela Huseynê Ertûşî”** yê hatiye nivîsîn. Ji bilî vê jî, lêkolîner Marûf Xeznedar jî dibêjin Bateyî ji 'Eşîra Ertûşiyîyan e. Lê ev mijare heta nihe jî bi gingeşe ye, kaca Bateyî ji kîşk 'eşîrê ye. Ya ku min bihîstî; hin dibêjin Bateyî ji 'Eşîra Ertûşiyîyan e û hin jî dibêjin ji 'Eşîra Pinyanişyan e û hin jî dibêjin ji 'Eşîra Muzîr'yan e.

1.5. Jiyana Bateyî û Serdema jiyana Wî

Heta nihe gele lêkolîneran li ser serdema jiyana Bateyî gele agahî yê dayn, lê belê ev agahî ji nivîyê zêdetirîn, di xeletin û di bê belge ne. Li gorî hin lêkolînerên weke Sadiq Behaddîn Amêdî, Qanatê Kurdo, Muhemmed Emîn Zekî,²² Bazil Nikitin, Minorsky, Elaeddîn Seccadî; Bateyî yê di sala 1414 an di 1417an de hatiye dinyayê û di 1491-1495an de jî wefat kirî.²³ Li gorî hin lêkolînerên weke Marûf Xeznedar, Feqî Huseyîn Sağniç, Amir Hassanpour, Ebdurreqîb Yûsif; Bateyî, yê di sedsala XVIIan de hatiye dinyayê û di sedsala XVIIIan de çûye ber dilovaniya Xwedê.²⁴ M. Xalid Sadinî, bi **şêş delîlan** ve koma duyemîn rastir dibîne:²⁵

Delîlê Yekemîn: Ji ber ku Bateyî, di helbesta bi navê **“Bi Dil Îro Xedeng im”** de bêjeya **“tiveng”**ê ya bi kar anî.

MÎNAK:

“Du eslanan wereng hatin

Bi tabûr û **tiveng** hatin

²⁰ Sadinî, b.n.b., 30.

²¹ Ziver, b.n.b., r. 33.

²² Sadinî, b.n.b., 34.

²³ Sadinî, b.n.b., 35.

²⁴ Sadinî, b.n.b., 35.

²⁵ Ziver, b.n.b., r. 34.

Bi şimşîr û xwedeng hatin
Qirên îna Musilmanan”²⁶

Bikaranîna "**tiving**"ê ne delîlê sedsala 16 û 17an e. Lewra li gorî “Tevârîh-i Cedîd-i Mir’ât-ı Cîhân”, “Tevârîh-i Âl-i Osmân”, "**tiveng**" li Ewrûpa ne hatiye îcad kirin, ya li Asyayê di sedsala 14an de hatiye îcad kirin. Artêşa Osmaniyan jî beriya artêşên Ewrûpayê **tiving** ya bi kar anî.²⁷

Delîlê Duyemîn: Piştî ku, demek dûr û dirêj, nabeyna Mîrên Hekariyê û Padîşahên Osmaniyan xweşbûy, ji bûna şer û cengan, sulh û selahetan, bi hev re rabûn û rûniştin. Di vê serdemê de, ji salên 1690î vir ve, di navbera Mîrê Hekarî û Osmaniyan de serdemeke baş derbaz bû. Di wê serdemê de Mîrê Hekkarî û Osmaniyan pevne li hemberî Îranê şer kirin. Wê serdemê Melayê Bateyî jî di Medresa Meydanê ya Colemêrgê de mudderisîti dikir. Ji ber wan têkiliyên bi Tirkan ve, di helbestên Bateyî de bêjeyên Tirkî zehf yê hatine bikaranîn.

Delîlê Sêyemîn: Delîlê sêyemîn jî helbesta danberheviya Melayê Bateyî û Melayê Girgaşî ye:

MÎNAK:

Bateyî:

Nefextû fihî mîn rûhî
Be’îd e bête tefhîmê²⁸

Li gorî nêrîna Sadinî, heke di risteya “Nefextu fihî mîn rûhî”(min ruhê xwe pif kirê) de “Nefextu” li gorî hesaba ebcêdê bête hisapkirin, sala 1717 an derdikeve holê.

NEFEXTÛ:

N, F, X, T. 50(N) + 80(F) + 400(X) + 600(T) = 1130 H ye. Ew jî dibite tarîxa 1717ê mîladî.²⁹

Delîlê Çaremîn: Delîlê çaremîn jî çîrokek e. Ev çîrok li Colemêrgê weha tê kotin: Wextê

²⁶ Sadinî, b.n.b., 36.

²⁷ Sadinî, b.n.b., 35.

²⁸ Sadinî, b.n.b., 37.

²⁹ Sadinî, b.n.b., 37.

hêj Melayê Bateyî zarok, Mîr Êzdînsêr ew dîtî, ew yê bi xwe re birî û daye xandinê. Ew mîr jî Êzdînsêrê Çaremîn e û 1696 an de Mîrîtiya Çolemergê ya kirî. Ev Êzdînsêr jî kurê Şerefxan Begê Mîrê Hekkariya ye û neviyê Zekeriya Begê hevçaxê Şerefxanê Bedlîsî ye. Em ji dîroka nivîsandina “Şerefname” ya Şerefxanê Bedlîsî hîn dibîn ku Zekeriya Beg, di 1596an de li ser hikum bûye. Piştî wî, kurê wî hukim kiriye û paşê jî neviyê wî Êzdînsêr bûye mîr. Ev jî dide zanîn wextê ku Êzdînsêr, Bateyî dîtî û ew bi xwe re birî û danaye ber xwandinê, dawiya sedsala 17an bû.

Delîlê Pêncemîn: Di derheqê sedsala ku Bateyî tê de jiyay, delîlek din jî “**Hemaîl**”a Bateyî, ya li Gundê Bate ye. Bateyî di vê **Hemaîl**'ê de serdema nivîsîna berhemê ya aşkere kirî. Em ji wêrê dixwînin ku ev berhem di serdema Îbrahîmxanê Hekariyê ya hatiye nivîsîn. Tê zanîn ku Îbrahîmxan di navbera salên 1700-1742an de li Colemêrgê Hikum yê kirî.

Delîlê Şeşemîn: Delîlê şeşemîn jî ev e ku Mela Mensurê Girgaşî di sedsala 18an de yê jiyay. Lewra helbesteke wî ya di mecmu'eyekê de hatiye nivîsînê. Ev Mecmu'e jî ya di sala 1768an de hatiye weşandin.³⁰ Ji ber ku Bateyî û Mela Mensûrê Girgaşî; danberhev û helbest bi hev re nivîsîne û jidayikbûna Girgaşî 1678 e, dîroka jiyana Bateyî bi texmînî zelal dibe.³¹ Lê gelo dema ku Bateyî û Girgaşî bihev re helbest nivîsîn, Bateyî çend salî bû ? Ji bo vê pirsgirêkê du bend weke delîl yê di destê me de³²:

MÎNAK:

Girgaşî:

Bixwînin nuqtaya **eswed**

Reqem kêş di dîwanê

Hisaba cezme ya ebced³³

Eswed:

Elif: 1, Sîn: 60, Waw: 7, Dal: 4 e. Eve jî dikene 72. Li gorî vê hesabê; dema ev helbest hatiye nivîsîn, dibe ku Girgaşî 72 salî bît. Ji ber ku herdu helbestvan hevalê hev in, temenê wan jî

³⁰ Abdulreqîb Yusuf, Şairên Klasîk ên Kurd, wer. Elî Şêr, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1988, r.67

³¹ Sadîni, b.n.b., 40.

³² Ziver, b.n.b., r. 37.

³³ Sadîni, b.n.b., r. 40

nêzîkî hev e.

Girgaşî Di helbesta xwe ya bi navê **“Beyta Biharê”** de jî wiha gotiye:

Reqem kirin **'qaf' û 'nûn'**

Nuqtayê mala eded

Bi nexmê mayeştêhûn³⁴

Li gorî hesaba ebcedê **qaf û nûn**:

Q: 20, N: 50 e, ew jî dike **70**. Li gorî vê hesabî em dikarin bêjîn, temenê Girgaşî wê demê 70 bûye.

Ji ber van delîlan li gorî dîrokên ku nivîskar û lêkolîneran jî dayn, bi texmînekê, em dikarin bêjîn ku Mela Huseynê Bateyî yê di sedsala XVIIan û XVIIIan de jiyay.³⁵

1.6. Xwendina Bateyî

Melayê Bateyî, kurê Mustefa ye. Bateyî yê li malbateke oldar hatiye dinyayê. Mustefayê babê wî Sofî bû û bi sofîtî yê hatiye nasîn. Çar kurên Sofî Mustefa hebûn: Ehmed, Huseyn, Osman û Muhemed. Dema Mela Huseyn hatiye dinyayê birayê wî Ehmed mezin û melayê gundê Pîrûsiyan bû. Belkî ji ber vê çendê be, Pîrûsî bi awayekî mubalexeyî xwe li Mela Huseynê Bateyî dikene xudan. Weydî ji bilî cînare gundîti yê çu pêwendiyên Pîrûsiyan û Bateyî'yan pêkve nîn.

Mela Huseyn, pêşî li dev birayê xwe Mela Ehmed dest bi xwendinê kir û heta mazin bûy. Piştî bûye pazde salî û paşve yê çûye Colemêrgê û li Medresa Mîr Zeynel Begê Hekarî (ku di 1585ê de hatibû avakirin û nihe jî li binê Êrisan nêzîkî Kumbeta Sor kaviên wê hêj jî di kifş in.) xwendina xwe domand û piştî ku xwendina xwe qedandî demekê li Medresa Sor ya Colemêrgê Mudderrisî kir.

Ji berhemên Bateyî têtê fehmkirin ku Bateyî ji xeynî Kurdî; zimanê Farisî, 'Erebî û Tirkî jî dizanî. Li gorî peyv, têgeh û biwêjên ku Bateyî di helbestên xwe de bi kar anîn, diyar e ku ew di 'ilmê Edebîyatê, Dîrokê, Belaxetê, Hedîsê, Tefsîrê, Fiqhê û Kelamê de jî 'alimekî zana û mahîr e.

³⁴ Sadini, b.n.b., r. 41

³⁵ Sadini, b.n.b., r. 41

Eve jî tê wê me'nê ku Melayê Bateyî 'Alimekî dazde 'ilm û bi 'îcaze bûye.³⁶ Li gorî ku Ebdureqîb Yûsif û Tehsîn Îbrahîm Doskî jî dibêjin, dibe ku Bateyî, li medreseya Miksê jî qederekê xwendibe û 'îcazet ji wêrê wergirtibe.³⁷

Li gor agahiyên ku Zîver didetin Bateyî, li Miksê, li Medreseya Mîr Hesenê Welî yê dest bi xandina xwe kirî û 'îcazeta xwe jî ya ji wêrê sitendî. Piştî ku Bateyî 'îcazeta xwe wergirtî, seydayê wî, ew yê ji bû Mudderrisîtiyê şandiye Colemêrgê û li wêrê çend salan Mudderrisîti ya kirî. Bateyî, piştî hingê yê vegeryaye Miksê û ji Mîrê Miksê xestiye ku medreseyekê ava biket da ku li wêrê Mudderrisîtiya xwe berdewam biketin. Mîrê Muksê ev daxaza Bateyî ya bicih anî û medreseyek ya jê re çêkirî. Ev medrese heta şerê Cîhanê yê duyemîn jî ya avabû. Lê piştî hingê medrese ya hatiye hilweşandin û şewitandin. Di vê şewitandinê de kitêbên ku ji Mela Huseyn mayn jî hemî yê hatîne sotin.³⁸

1.6.1. Zewaca Bateyî û Malbata Wî

Bateyî yê zewicî, xwedan mal û malbate û babê sê zarokan e.³⁹ Di helbestên wî de navên keçên wî û xanima wî derbaz dibin; lê navê kurê wî derbaz nabî. Li gorî M. Xalid Sadinî, kurekî Bateyî bi navê Mela Tahir yê hey û ew jî babê du zarokan e. Mela Tahir Mela Huseyn. Mela Tahir kurê xwe Huseyn yê bi bapîrê xwe Mela Huseynê Bateyî ve navkirî.

Li gor ku nevyê Bateyî Mela Muhemmed Salih Qewal didete zanîn: "Piştî ku Huseyn xand û bûye mela, yê ji bo melatiyê koçî Herêma Lêwînê kirî û li Gundê Qewalê binecih bûy û bûye Melayê Qundê Qewal û Herêma Lêwînê. Mîrê Qewalê bi hemî lewnan piştevaniya Bateyî ya kirî û bi vê piştevaniya Mîrê Qewalê ve kurê Mela Tahir, nevyê Bateyî, Mela Husênê biçûk yê li Qundê Qewalê bûye xwedî mal, milk û war. Nihe jî ew war û milkê Bateyî, li Qewalê dimîne û bi navê mehela "**taxi**" tête zanîn. Eve pênc (5) babikên ku neviyên wî li Gundê Qewalê li ser wê axê dijîn û Melatiya Gundê Qewalê berdewam diken."

Mela Huseynê Bateyî, yê çûye Hecê⁴⁰ û li wêrê helbesta xwe ya bi navê: "**Hilo Rabe Ebul Qasim**" jî nivîsî û xwendî.

³⁶ Sadinî, b.n.b., r. 41

³⁷ Tehsîn Îbrahîm Doskî û Muhsîn Îbrahîm (2005), Melayê Bateyî Jiyana û Berhem, Spîrêz, Hewlêr, r.45.

³⁸ Ziver, b.n.b., r. 39.

³⁹ Doskî b.n.b., r. 46.

⁴⁰ Doskî b.n.b., r. 48.

MÎNAK:

"Hilo rabe Ebu'l-Qasim
Hilo ey Qasidê Ekber
Hilo Fexra Benî Haşim
Hilo rabe tu yî Rehber"⁴¹

Bateyî piştî ku ji hecê vegerya wefat kir. Rîwayetek heye ku dibêje Bateyî yê çûye Bexda û li wir bi şêxekî re munazereyên 'ilmî yêt kirin. Li gorî rîwayetên nêviyên Bateyî, Mela Huseynê Batêyî mirovekî dîndar, bisebir, zanyar û nefis piçûk bû.⁴² Weke ku wî jî bi mexlesa "**Feqîr**" ve feqîriya xwe ya dîyar kirî û gotî, ew "**Feqîrê Bateyî**" bû.

1.7. Mexles û Nasnavên Bateyî

Melayê Bateyî, di helbestên xwe de mexlesa "**Feqîrê Bateyî**", "**Melayê Bateyî**", "**Bateyî**", "**Batê**" û "**Batey**" ya bi kar anî. Di nav helbestên wî yên bi mexles de, mexlesa "**Bateyî**" 8 caran ya bikaranî. Mexlesa "**Bate**", 2 caran û mexlesa "**Batey**" jî 15 caran ya hatiye bikaranîn.⁴³

Bateyî Mexlesa "**Feqîrê Bateyî**" ya di dawiya Mewlûdê de bi vî awayî vehonandî.

MÎNAK 1:

Bo cemî'ê muslimîn û salîhe
Bo **Feqîrê Bateyî** el fatîhe **(b.n.i.b. Beyt: 570)**

Bateyî Mexlesa "**Batê**" ya di helbesta "**Ji Bextê Min Reşî Rabû**" de bi kar anî:

MÎNAK 2:

Eger çî ew ji min sil bû
Ji bo **Batê** Hemaîl hat⁴⁴

Bateyî Mexlesa "**Melayê Bateyî**" di helbesta "**Çiriya Paşî û Pêda**" de ya bi kar anî:

⁴¹ Sadîni, b.n.b., r. 45

⁴² Ziver, b.n.b., r. 40.

⁴³ Ziver, b.n.b., r. 42.

⁴⁴ Sadîni, b.n.b., r. 46

MÎNAK 3:

Ji Çîrya Paşî û pê da
Melayê Bateyî kanê
Sefer kêşa bi Miksê da
Li ser wextê zivistanê⁴⁵

Bateyî Mexlesa "**Bateyî**" ya di helbesta xwe ya bi navê "**Ya Îlahî Ez Xerîb im.**" de bi karanî. Lê ji ber kêşeya helbestê, mexlesa xwe herfek jê kêma nivîsî ya bû ye "**Bateyî.**"

MÎNAK 4:

Av û xwîn barîn peyapey
Daîma bedhal e "**Bateyî**"⁴⁶

1.8. Nesla Bateyî û Dumêza Wî

Mela Huseynê Bateyî hindî ku em pê dizanîn kurek û du keç hebûyne: Tahir, Zulfê û Asmîn. Di derheqê Tahir de çu îşaretên diyar nînin, ji bilî ku kurê wî Mela Durbaz li ser **Hemaîl**'a bapîrê xwe "*Sewedehû mela Dirbaz bîn mela Tahir bînmela Huseyîn*" nivîsî. Li gor agahiyên vê **Hemaîl**'ê, diyar dibe ku Mela Durbaz kurê Mela Tahir e û dîsa diyar dibe ku Mela Tahir jî kurê Mela Huseynê Bateyî ye. Lêbelê Melayê Bateyî di çî helbestên xwe de behsa kurê xwe Tahir nekir ye. Bi tenê navê keçên xwe, Asmîn û Zulfê di helbestên xwe de yê nivîsîn.

MÎNAK:

Aşiqê zulf'a reş im
Aşiqê şeydayê zulf
Be bade lew serxweş im.
*Serxweş û sewdayê zulf.*⁴⁷

Kolê te me ez xulam
*Bateyî kil şaye zulf.*⁴⁸

⁴⁵ Sadînî, b.n.b., r. 47

⁴⁶ Sadînî, b.n.b., r. 49

⁴⁷ Sadînî, b.n.b., r. 149

*Xwihê avête alalan
Şepala taze asmîn e⁴⁹*

*Ji asmîn û terazîm bû
Bi naz û işwe mezin bû⁵⁰*

Li Gor Ku Mela Salih Qewal di dete zanîn "Nesl û Dumêza Bateyî" weha ye:

"Bateyî bi nesla xwe ve neslek **Tahirî** û **Siddiqî** ye. Bab û bapîrên Bateyî yê ji Başûrê Kurdistan'ê hatîn bû nav Gundê Ertûşê û ji wêrê jî mişextî Gundê Pîrosyan bûyn û yên bûyne Melayên Gundê Pîrosyan. Babê Mela Huseyn Mustefa ye. Mustefa mirovek sofî bû û bi wek Sofî Mustefa dihate naskirin. Sofî Mustefa çar kur hebûn: Ehmed, Huseyn, Osman û Muhemmed. Birayê Bateyî yê mazin Mela Ehmed, Melayê Gundê Pîrosyan bû. Wextê ku Mela Ehmed Melatiya Gundê Pîrosyan dikir Bateyî, ji wî ders hilgirt û li dev wî bû xudan 'îlm û mela. Piştî ku Bateyî bûye mela, gundiye Bate jê daxaz kir ku bibîte Melayê wan. Mela Huseyn, teklîfa gundiye Bate qebûl kir û çû bû Melayê wan. Piştî ku qederekê melatiya Gundê Bate kirî, ji bo xandina medresê ji Bate derket û li medreseyên Iraq û Kurdistanê yên cuda cuda gerya û xand, heta ku 'îlmê xwe tamam kirî û bûye xudan 'îcaze û 'alimekî dazde 'îlim. Piştî ku Bateyî bûye xwedan 'îcaze, çû Miksê li Medrese ya Mîr Hesenê Welî qederekê Mudderîsîti kir û piştî hingê jî çû Colemêrgê li Medreseya Sor ya Meydanê Mudderîsîtiya wê jî kir û feqî dane xandin. Piştî ku qederekê li Colemêrgê jî Mudderîsîti kir di dawiyê de teqawîd bû û zivîrî çû ser milk û warê bab û qalên xwe li Gundê Bate binecih bû. Bateyî li Gundê Bate wefat kir û li ser axa bab û qalên xwe hate veşartin. Hêj nihe jî kavle wî bi feqîrî diyar e û ziyaretgeha xelq û 'alemê ye."

1.7.1. Mela Huseynê Buçûk(Qewalî) û Dumêza wî

Mela Salih Qewal dibêjît: "**Mela Huseynê Buçûk** ji bo Melatiyê qesta zozanan kir û ji Gundê Bate derket hat da biçît bû zozanên Feraşîn, Bileh û Binevşiyân. Lê wextê Ku ji Gundê

⁴⁸ Sadînî, b.n.b., r. 151

⁴⁹ Sadînî, b.n.b., r. 155

⁵⁰ Sadînî, b.n.b., r. 155

Bate derketî rêvingiya xwe di Gelyê Qewalê û di Derîkê Qewalê re kir û derbaz bû hat şevkê li Mîrê Qewalê bû mêhvan. Wextê ku Mîrê Qewalê zanî Mela Huseyn yê ji bû melatîyê derketî û qesta zozanan kirî. Teklîfek jê re kir û Got: Em jî di bê mizgeft û melayne. Keremke ez dê ji bû te mizgevtêkê avakem. **Mela Huseynê Buçûk** ev teklîfa Mîrê Qewalê qebûl kir û li Qewalê dest bi Melatîya Qewal û Herêma Lêwînê kir. **Mela Huseynê Buçûk** sê kur hebûn. Mela 'Elî, Mela Yasîn û Mela Muhemmed."

Mela Salih rêze bapêkên xwe weha di hejmêre û xwe bi bapêkê heftê ve di gehînîte Mela Huseynê Bateyî:

"**Mela Salih**, kurê **Mela 'Elî**, ew jî kurê **Mela Salih**, ew jî kurê **Mela 'Elî**, ew jî kurê **Mela Husênê Buçûk (Qewalî)**, ew jî kurê **Mela Tahir**, ew jî kurê **Mela Husênê Bateyî** ye. Mela Salih Qewal bi bapêkê pêncê ve xwe digehînîte **Mela Husênê Buçûk (Qewalî)** û bi **babê heftê** ve jî xwe di gehînîte **Mela Husênê Bateyî**. Bapêkê Mela 'Elî heta bapêkê pêncê yê bi bapêrên xwe ve hatîne navkirin."

2. BERHEMÊN BATEYÎ

Li gor lêkolîna me Bateyî sê berhem yê nivîsîn: **Mewlûd, Dîwan(Helbest), Hemaîl**. Lêbelê ji van her sê berhemên wî, heta nihe tenê **Mewlûd** û **Hemaîl** yê hatîne dîtin û ketîne destê me. Berhema wî **Dîwan** heta nihe nehatiye dîtin. Lê belê ji **Dîwana Bateyî**, heta nihe 30 **Helbest** yê ketîne destê me. **Babê Zêrevanî**, behsa "Tecwîda Qur'ana Pîroz" û "Eqîdeya Îmanê" diket, dibêjîtin Bateyî xwediyê 5 berheman e, lê ev kitêb windayîne û çu delîl li ser wan di destê me de nînin.⁵¹

2.1. **Mewlûd**

Di edebiyata Kurdî de **mewlûdnameya** yekem ev berhem e.. Gelek nusxe û çapên wê yê heyn. Ev berhema hêja ya bi Kurdî nivîsî. **Mewlûd**, ji aliyê terkîban ve ya di bin bandora Zimanê 'Erebî de may û ji aliyê sernivîsan ve jî ya di bin bandora Zimanê Farisî de may. **Mewlûda Bateyî** berhemek manzûm e û bi şiklê mesnewî ve ya hatiye nivîsandin.⁵² Di serê berhemê de pesndana **Xwedê** û **Pêxember** ya hey. Naveroka wê xêra xwendina **mewlûdê**, afirandina nûra Hz.

⁵¹ Ziver, b.n.b., r. 42.

⁵² Ziver, b.n.b., r. 44.

Muhemmed (sxl.) û afirandina Hz. Adem (as), întîqala nûra Hz. Muhemmed (sxl.), ji dayikbûna Ebdullah bavê Muhemmed (sxl.), peymanbestina Cihûyan ji bo kuştina Ebdullah, zewaca Ebdullah û Amîne, mizgîniya pêxemberan li hemlê Amînê, wefata Ebdullah, ji dayikbûna Hz. Muhemmed (sxl.), bûyerên şeva Xudêdana Hz. Muhemmed, nîşanên ku Ebdulmutilib di wê şeva Xudêdana Wî de dît, hatina Helîme yê bi bal Mekke yê ji bo şîrdana Hz. Muhemmed û birina wî, vegera karwanê Se'diyan ji Mekkê, di nav qabîleya Se'diyan de bûyerên ku ji Pêxember çêbûyn, vegera Helîmê bi bal Mekke'yê ve ji bo teslîmkirina Pêxember li Amînê, dua û paşgotin.

2.2. Hemaîl

Berhema Bateyî ya sêyemîn **Hemaîl** e. Heta nihe sê destxetên Hemaîlê yên ketîne destê me. Yek ya Gundê Batê ye, yek ya Gundê Qewalê ye, li dev neviyê Bateyî Mela Salîh Qewal, ya di jî ya li Gundê Elkîkê, li mala Cemîl Axa'yê Giravî.

Hemaîl, hêj nehatiye latînîze kirin û çapkirin. Lê ez vê gavê li ser dixebitim û min ji nivîyê pitir ya latînîze kirî. Xuda iznê bidetin, ez dê di demek nêz de xelas kem û deme çapkirin. Hemaîl, ya bi zimanê 'Erebî û Farisî hatiye nivîsîn. Di derkenarên wê de, kîjan beş di derheqê çî de ye, bi Kurdî ya hatiye nivîsîn. Sernivîsên wê bi hibra sor in. Di bin her sernivîsê de “Bismillahîrrahmanîrrahîm” ya hey. Ayet, navên Xwedê, hind navên ku me jê fehm nekirî yê heyn. Hemaîl, exleb ji du'a pêk diêtin, navê hin derman û gîyayan, herf û reqemên tilsimê yên tê de. Di her beşê de ayetên Qur'anê yê heyn; lê gelek caran ayet nîvero yê hatîne hiştin. Gelek caran ayet û du'a bi tevde yê hatîne nivîsîn.

Di dawiya Hemaîlê de, bi zimanê 'Erebî wisa ya hatiye nivîsîn:

Hemaîl, bi alîkariya Xwedayê (ku Melîk û Celîl e) li ser destê kêmê îbadan di meha pîroz a Remezana şerîf, di wextê îşa de xelas bû. Ev jî di dema hakimê hukûmetê, Mîrê Mîran Îbrahîm Xan Beg, Xweda bi rehma xwe lê bike, si'ûd û paşeroja wî binêre û tiştên ku bixwaze jê re hêsan bike, hatiye nivîsîn.

2.3. Helbest(Dîwan)

Helbestên Melayê Bateyî, ji aliyê wî ve nehatine komkirin. Helbestên wî di destxetên cur be cur de yê hatine qeytkirin. Ev helbestên wî, berî nihe di hin kitêbên wek **Dîroka Edebiyata Kurdî, Mêjûyî Edebî Kurdî, Kovarên Nûbihar'**ê de û di hin berhemên biyografîk weke kitêba

Tehsîn Îbrahîm Doskî ya bi navê "**Melayê Bateyî Jiyan û Berhemên wî**" de, yê hatîne çapkirin. M. Xalid Sadîni jî di dawiyê de ev helbestên wî di kitaba xwe ya bi navê "**Mela Huseynê Bateyî (Jiyan, Berhem û Helbestên wî**" de berhev kirin û di weşexaneyê Nûbihar'ê de çap kirin.⁵³ Heta niha 30 Helbestên Bateyî yê ketîne destê me. Helbestên wî 7 heb jê munaca'at in, 6 heb jê ne't in, 17 heb jî helbestên curbecûr in. Bateyî di van helbestan de carna evîna xwe ya beşerî carna ya îlahî ya aniye ziman.

2.4. Zembîlfiroş:

Zembîlfiroşa ku Qenatê Kurdo dibêje⁵⁴ ya Melayê Bateyî ye, ya ji aliyê A.Sosin ve hatiye weşandin. Kurdo, ji destnivîsa xwe Zembîlfiroş'ê jî hin çarîn wek mînak yê dayn. Lê delîlek weke mexlesê, me peyde nekir ku em bibêjin ev berhem ji aliyê Bateyî ve ya hatiye nivîsîn.⁵⁵

BEŞA DUYEMÎN

1. BI KURTAHÎ DÎN, ÇAND, ZIMAN, EDEBIYAT Û BANDORA WAN YA LI SER MEWLÛDÊ

1.1. DÎN

1.1.1. Wateya Peyva "Dîn" a Ferhengî

Peyva dîn, ya ji binyadê tîpên '**d-y-n**' yê hatî bidest xistin⁵⁶ û di ferhengê de diête van wateyan:

"Mazinahî", "serwerî", "zordarî", "bendetî", "bi bendetiyê ve xwe teslîmkirina tiştêkê", "deyndarîbûn", "ser tewandin", "heq wergirtin", "hukumdarî" û "rêveberî", "şerî'et", "qanûn", "rêk", "mîllet", "edet", "teqlîd", "cezadan", "mukafatdan". Peyva "dîn", bi awayê "nav" ve jî diête van wateyan: "hemberî", "têkili", "îta'et", "zîllet", "xwe mazinkirin", "serketîbûn", "hukumranîti", "şerî'et", "bendetî" "îsyankarî", "mîllet", "mal û mulk", "tewhîd", "yekêtî."⁵⁷

⁵⁴ Rênas Jiyan, *Melayê Bateyî-Mawlûd û Hemû Helbestên Wî*, Ç. Yekem, Weş., Amed 2013, r.55.

⁵⁵ Ziver, b.n.b., r. 45.

⁵⁶ Mehmet Bulut (2009), *Delilleriyle İslam Akaidi*, Erkam Yayınları İst. s. 123.

⁵⁷ Bulut, b.n.b.r. 145.

1.1.2. Di Qur'an'a Pîroz De Peyva "Dîn"

Peyva dînî di Qur'an'a Oîroz de, 92 caran derbazdibe. Di Qur'an'ê de ev peyve bi van me'na derbaz dibin: "reveberî", "rêba"z, "îte'et", "biryar", "tewhîd-yekêfî", "îslam", "şerî'et", "sînor-hudût", "orf-'edet", "ceza", "hesap" û "millet."⁵⁸

Bi awayek dî, di Qur'an'ê de peyva dînî ji aliyê çêkirin-sazkirin û xuliqandinê ve du me'na didet:

a. Ji bo Xuda: Dîn bi me'na yekem ve; yê ku xulqiyet çêkirî û bendetî jê re diête kirine û ya ji bûna Ellah-Xweda hatiye gotin.

MÎNAK:

Hakîmbûn-hakimiyet: Yê ku dibin hukumraniya xwe de dihêle, digire, yê ku hesabê di pirse, ceza û mukafatê didetin.

b. Ji bû İnsan: Bi me'na yê ku hatiye xuliqandin, bendetî, sertewandin, xwekêmdîtin, teslîmbûn, 'evdînî-bendetî.⁵⁹

1.1.2.1. Ayetên Di Derheqê "Dîn"î De

Di Qur'anê de, ji bawerî, sîstem û qanûnên mexlûqatan re jî, dîn yê hatiye gotin:

MÎNAK:

Di Sureyê Kafirûn de Xuda weha ferman dîke:

" Dînê we bû we, yê min jî bû min."⁶⁰

Li ser vê jî dîsa bi awayek xusûs û taybet jî bi peyva "dîn" ve " Dînê Îslamê" yê hatiye bikaranîn.

MÎNAK:

Xuda di Qur'an'ê de wiha ferman dîketin:

" Li ba Xuda, bê şûp û şik Dîn Îslam e" ⁶¹

⁵⁸ Ali Akdoğan, "Kültür ve Din", Din Sosyolojisi El Kitabı, ss.437-451., ss. 447.

⁵⁹ Akdoğan, b.n.b.r. 449.

⁶⁰ Qur'an, 109/6

" Ewên ku ji bilê Îslamê dînekê hildibijêrin û qebûl diken, bila bizanin ew ji wan qet naête qebûl kirin û ew dê di axîretê de, ji wan kesên di zîyanê de, ête hisapkirin û cihgirtin." ⁶²

Beşên 'ilmî yên ku bi dînî ve di eleqeder, peyva dînî ya li gor bawerî, dîtin û nêrînên xwe beyan û me'ne kirîn. Zana û 'alimên dînê îslamê jî peyva dînî ya li gor Qur'an'ê, bîr û baweriyên Dînê Îslamê beyan kirîn. Li gor 'alim û zanayên dînê îslamê, me'na Dîn'î wiha ye:

Dîn ew rêk û rêbaze ku wan însanên xudan bîaqil; bi viyan û erênîya wan ve, ji bûna ku li dînya û axîretê jîyanek maqul û xweş bi qanûn û sînorên îlahî ve wan hem li dînya yê û hem jî li axîretê bi huzûr diêxîtin e. ⁶³

Di hemû çandên dînî de, peyva ku dîn pê hatiye te'rîf kirin û me'ne kirin de jî ev peyvên hevpar yê heyn: "rêk", "bawerî", "edet" û "bendetî." Ev peyve hemî jî bîngêhê dînî di nav xwe û hundirîya însan de, bi me'ne û wate diêxin û bi wê wateyê ve bi me'na dikevin û xwe di jîyanê de derdixîne holê û jîyan û bawerî û felsefeya şexsî û civakî bi vê watê ve xwe nîşan diden. ⁶⁴

Serkeftî û şehrezayîya dînekê jî ew e ku ne jibûna yekane û aqilmendên sereke qanûnên exleqî danî û wan pê perwerde biket û jîyana wan saz biketin, ya herî muhîm ew e ku dîn ji bûna hemû qadên jîyanê û ji bûna hemû kom û tebeqeyên însanan jî qanûn û rêbazên exlaqî danî û jîyanek maqul ji bûna hemû şexsîyet û komên civakê saz biketin e.

Dîn ew fikr, raman û bawerî nîne ku tenê di qelb û wijdana mirovî de dijît û bê'emel dimîne. Dîn ew e yê ku encamên wî di jîyana şexsî û civakî de bi awayekî zindî û berbiçav xwe di qadên jîyana hemû mexlûqatan de diyardiket û ji bûna hemû mirovahiyê jîyanek bi rûmet pêşniyar diket û vê jî bi awayek bîngêhî ve bi rêk û rêbazên exlaqî ve di jîyanê de derdixînte holê û mirov û miravahiyê di bin çandek mayînde de saz diketin. Di encamê de derdikevîte holê ku dîn; sîstem û qanûnek îlahî û Rebbanî ye. Ji ber vê yekê, qanûn û prensîbên ku em qebûl dikeyn, pêwîste li gor qanûn, sîstem û prensîbên îlahî bin. Heke ew sîstem û qanûn ne li gor sîstem û qanûnên îlahî bin, ew hemû li nik Xuda di bêbingeh in û batil in. Li gor vê me'neyê, qanûn û sîstemên ku bi me'na dîn ve ji layê mexlûqatî ve hatîne danîn û saz kirin hemî di batil in. ⁶⁵

⁶¹ Qur'an, 3/19

⁶² Qur'an, 3/85

⁶³ Akdoğan, b.n.b.r. 512.

⁶⁴ Akdoğan, b.n.b.r. 512.

⁶⁵ Selim Eren (2007), İnanç ve Sosyo-Kültürel Çevre Etkileşimi, Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, Sivas, c.XI, sayı:1, ss. 129.

1.1.2.2. "Dîn'ê Heq"

Dîn'ê heq ew e yê ku Xuda bi rêka peyxemberên xwe ve ji hemû mexlûqatî re bi sîstem û qanûnan ve şandîn. Xuda bi vê riyê ve bendetîya 'evda, ya ji holê rakirî û 'evdîniya ji bo Xudê tenê ya qebûl kirî û li gor vê eqîdeyê esasên dînî yên li vê cîhanê sazkirîn û qanûnên jiyane yên danandîn û bi vê sîstema dînî ve însan hemî yên wekhev girtin. Xuda bendetîya ji bo benda, qet'îyen qebûl naket û li gor esas û qanûnên "**Dîn'ê Heq**", çî kes ji çî kesî re maqûltir nîne û nahêlîtin evdînî û kolefî dinava 'evdan de çê bibe. Li gor dînê îslamê: "**Maqûliya însan, tenê ya di teqwatiyê de.**"⁶⁶

1.1.3. Taybetiyên Hevpar Yên Di Hemû Dîn û Baweriyên De

Li gor 'ilmên dînî, unsûr û taybetiyên di hemû dîn û baweriyên de cî digirin ev in:

1. Tiştên ku di ser tebî'et-xeza û însan re hatîne girtin. Wek Xweda, melek, cin û heyînen rûhanî.

2. Jêk cudakirina qudsîyet û ne qudsiyetê

3. Bendetî, toren û 'ayîn

4. Orf û 'edetên nivîskî û nenivîskî. Wek kêtêbên minbarek û qanûnên exleqî

5. Nîzam û sîstem û qanûnên jiyane

6. Kom û cema'etên civakî û 'aîdîyeta van koman.

7. Dîtin û baweriyên 'alem, însan û jiyana nepenî⁶⁷

1.2. ÇAND

1.2.1. Wateya Peyva "Çand"ê Ya Ferhengî

Çand di nava demeke dirêj de ji hemû nirxên mirovahiye yên madî û manewî pêktêtin. Çand fikr û jiyana civakê ye. Çand, nasnameya gelekî pêk tîne û wî gelî ji gelên din cuda dike.

Çand, ew nirxên bingehînin yên ku ji aliyê însanan ve bi awayek dîrokî û civakî ve di wextekî dîr û dirêj de, bi pêşketineke demek dîr û dirêj de bi nirxên maddî û me'nevî ve hatîne bidestxistin û xemilandin. Çand bi vê taybetiya xwe ve ji aliyê însanan ve ya hetîye sazkirin û bi

⁶⁶ Eren, b.n.b.r. 132.

⁶⁷ Eren, b.n.b.r. 136.

destxistin. Mirovan, piştî hingê ev nirxên çandê yê ji mirovên piştî xwe re hêlandin û danîne meydana jîyan û mirovahiyê. Tevî mirovahiyê jî ya ji vê îstîfade kirî û hêj jî diketin. Hîndî ku wêdatir e jî ew bi vê sazkirin û bandorkirina nirxên cuda ve jî dê ête dewlement kirin û xwemilandin.⁶⁸

1.2.1.1. Unsûrên Çandê

Bi kêmahî şeş unsûrên çandê yê heyn:

1. Zîman
2. Dîn
3. Dîrok
4. Huner
5. Fîkr û Raman
6. Orf û 'Edet⁶⁹

1.2.1.2. Cureyên Çandê:

a. Çanda Maddî û HêmanênWê:

Hemû cure amûr, avahî, telefon, cil û berg û hwd. Ev çande ji her cure alet û navgîniyên ku ji aliyê civatekî ve têne pê'emelkirin pêktêtin.⁷⁰

b. Çanda Manewî û HêmanênWê:

Bawerî, exlaq, dîrok, ol, felsefe, kevneşopî, orf û adet, şeweyên hizirandin û fikirînê û hwd.

Beşa maddî ya çandê, li gor beşa manewî, zûtir diguherîtin. Çanda ne me'newî, pîçekê li paş çanda maddî dimîne û çanda maddî dişopîne. Di encama vê yekê de jî çanda me'newî, hewl dide ku bikaribe wek çanda maddî tevbigere, an jî bigihêje wê.⁷¹

1.2.2. Pêkhatina Çandê

Çand, bi yekîtiya tevlihev ya unsûrên maddî û manewî pêktêtin. Wekî hînbûniyên tevlihev yê şexsî, wekî zanyarî, hunerî, teknîkî, navgînî, alav, exlaqî, orfî, adet û bawerî yê. Ev nirxe wekî awayê jiyana civakekê têne qebûlkin.⁷²

Çand, dinav komeke civaka mirovan de bi awayekî 'eyan û beyan de xwe saz diketin. Çand, tiştên ku ji aliyê însan ve hatîne zanîn, hînkirin û parvekirin hemûyan dinava xwe de

⁶⁸ Thomas S. Eliot (1981), *Kültür Üzerine Düşünceler*, çev. Sevim Kantarcıoğlu, Ankara, s. 245.

⁶⁹ Fatih Özkan (1997), *Din Kültür İlişkisi, Teza Lîsansê ya Neweşandî*, Ankara, 143.

⁷⁰ Eliot, b.n.b.r. 249.

⁷¹ Eliot, b.n.b.r. 254.

⁷² Recep Kılıç (2006), "Din ve Kültür", *Din Bilimleri 2*, Ankuzem Yayınları, Ankara, s. 322.

dihewînîtin. Çand bi vê taybetmendiya xwe ve pêkanek, sazûmanek û avahiyek ji neynika jiyana mirovahiyê ye. Berdewamiya çandê qet û qet qut nabe û ji ber ku bi tiştên ji aliyê virovana ve ya hatiye hînkirin û parvekirin. Ev avakirina avahiyê çandê, ji despêka xuliqandina însanan ve ya pekhatî û heta ku jiyana mirovahiyê hebe jî dê bi awayên cuda cuda jî li vê cîhanê berdewamketin. Çand bi taybetmendiya xwe ve jî dê sazûmana vê avahiyê hertim parêzîtin û her dem jî dê xwe ji nû ve sazketin û heta ku jiyana mirovahiyê bi dawî dibe jî dê vê sazûmana xwe berdewam ketin. Însan û zimanê wî, dîn û baweriya wî, xarin û vexarinên wî, jiyana wî ya civakî, zanîn û orf û 'edet û kevneşopiyên wî û nirxên însanî yên me'nevî hemû cihê xwe dinav vê mijarê de digirin.⁷³

Avabûna çandê, ji mal û kîskê nirxên neteweyan ve pêktêtin. Bi pêkhatin û li hevhatina wek nirxên ziman, dîn, exlaq, aborî, zanyarî, fikr û ramanên neteweyî civakê bi tevahî saz diken. Wekî nirxên baweriyê, qanûn, orf û 'edet û pîrensîbên exlaqî.

Çand Taybetiyên Çandê:

Çand, ji aliyê însan ve di ête fêrbûn.

Çand, ya di her lewnê jiyandê de hey û her civakek xwediyê çandekê ye.

Çand, ji aliyê endamên civakê ve tê parvekirin û hevpar tê jiyand.

Çand, taybetmendiyeke bingehîn ya civaka ye.

Çand, civakan ji hevdu cuda diketin.

Çand, her dem bi unsûrên nû ve diguhere û xwe nû dike.

Çand, bi rêya mîrateya civaknasî ve dewrê nîşan diguhere û xwe nû dike.

Çand, razber(soyut) e û ne berbiçav(somut) e.

Çand, bi temamî di ête hîskirin, lê bi temamî nayête dîtin.

Çand'a maddî û unsûrên wê, li gor unsûrên çanda manewî, zûtirîn tene guherîn.

Çand, bi hêlên xwe yên hevpar ve di her civakekê de xwe beyan diket.

Çand, bi taybetmendiya xwe ve li gor civakan tene guherîn.

Çand, wezîfeya venêrana civakê pêktîne.

Çand, bi guherîna unsûrekê ve, guherîna beşên di jî eleqederdiketin.

Çand, dinav xwe de yekwicûd e û xwediyê yekêtiyê ye.

⁷³ Kılıç, b.n.b.r. 249.

Çand, xwediyê sistemek simbolîk e û ji sembolan ve pêktê.
 Çand, hem maddî ye, hem manewî ye. Dinav van her du aliyan de wekhevî ya hey.
 Çand, di nav cîhana xwezayî û civakî de xwedî wateyeke wergeriyê ye.
 Çand, tebî'etê xwezayê di bin bandora xwe de dihêle.
 Çand, hem xwediyê wekheviyê ye, hem jî xwediyê jêk cudakirinê ye.
 Çand, kirin û gotinên şexsan saz diket û wan li gor civakê amade diketin.
 Çand, şexsîyet û nasnameya civak û civaknasiyê saz diket.
 Çand, ya dîrokî ye, ji paşerojê heta roja meya îro ya hatî.
 Çand, berhema hemû mirovan û virovahiye ye.
 Çand, di her civakekê de bi awa û terzek cuda ve di ête guherîn.
 Çand, nêzikatiya şexsan beralî dike û pergala civakê saz diket.
 Çand, ji civakê re dibe nasname û civakan jêk cuda dike.
 Çand, hestên piştgirî û yekîtiyê pêk tîne û "hişmendiya em-me" yê avadiketin.
 Çand, kesayetiya civakî pêk tîne.
 Çand, "Komelayetî"yê derdîxe holê.

Her çi qas endamên civakan û welatên wan neşibin hev jî, lê mirov di warê biyolojîk de di şibin hev. Lê belê mirov di warê bawerî, fikir, nêrîn û şeweyên têgihîştinê de ji hev cuda ne. Ya ku vê cudabûnê derdixê holê di serî de bandora çandî ya ku mirov tê de dijî ye. Mirov, çandê bi pêv ajoya civakbûnê re bi dest dixin.

Mirov di nava çanda ku tê de dijî de tê dinyayê. Taybetmendiyên çandê ji dê û bavê xwe, ji derdora xwe, ji hevalê xwe, ji dibistanê, ji kûçe û dorhêla kar hîn dibe. Ji vê pêvajoya hînbûnê ya ku mirov heta 'emrê xwe yê dawî dijî re "civakbûn" tê gotin.

Mirov di nava pêvajoya civakbûnê de dijî û dibê endamekî/ê wê civakê. Ji şeweyê têgihîştina bûyeran bigire heta lixwekirina cil û bergan, ji şeweyê fikirandinê bigire heta şeweyê nêzikatiyê û di her mijarê de bandora çandê liser mirovan çêdibe.⁷⁴ Pêvajoya civakbûnê heman kesên dina va civakê de dijîn, dişibîne hev. Lê her çi qas mirov di nava heman cihê çandî de bijîn jî, ji ber ku taybetmendiyên her mirovan yê afrînerî di cudane, kesayeta wan jî ne wekî hev e.

Mirovan, nirxên çandê yê ji mirovên piştî xwe re hêlandin û danîne meydana jiyana û

⁷⁴ Ejder Okumuş (2003), Toplumsal Değişme ve Din, İstanbul, s. 343.

mirovahiyê. Tevî mirovahiyê jî ya ji vê îstîfade kirî û hêj jî diketin. Hîndî ku wêdatir e jî ew bi vê sazkirin û bandorkirina nirxên cuda ve jî dê ête dewlement kirîn û xwemilandin.

1.3. ZIMAN

Ziman, amûrê têgehiştina di nabeyna mirovan de ye. Ziman, xwedî qanûn û sîstemên taybet e û bi van qanûn û sîstemên xwe yê taybet ve hertim bi pêşve diçe û dewlement dibe, dîyar nîne kaca kengî bingeh û temelê ziman hatiye avêtin, ziman xwedî bingeh û temekekî nîne û ji ber vê taybetiya wî jî mirov fehm naketin kaca ew çawan û kengî ava bûye.

Ziman, amûrek e yê ku ji dangan ve hatiye ristîn û vehonandin.⁷⁵ Ziman amûrê ragihandina çandê yê herî tekane ye. Heke ziman neba, ragihandina çandê jî nedi bû û çand; da di demê xwe de mînit û wînda bît. Lê ziman çandê di ragehîniyê nîfşên mirovahiyê yê nû û çandê ji tunebûnê xwelas diketin.

Jiyan bêy ziman nameşe, ji ber vê qanûnê, însan di hemû gav û dem û wextan de yê ji aliyê ziman ve hatiye dorpeçkirin û di bin bandora wî de may.⁷⁶ Di dawiya vê dorpeçkirinê de jî jiyana însanan bi hemû aliyan ve ya bûye barek û ketiye ser milên ziman û ziman jî ew barê çandê yê li dem û dewran û cî û waran bê rawest ragihandiye dema me.

Bi kurtahî çend taybetmendiyan ziman:

Ziman, unsurê çandê yê ewelîn û herî bingehîn e.

Ziman, hebûna civaknasiya hemû komên mirovahiyê ye.

Ziman, xezîneya hemû serhatiyên neteweyî ye.

Ziman, xezîneya fikr û ramanên mirovahiyê ye.

Ziman, xezîneya hemû nirxên maddî û me'newî ye.

Ziman, xezîneya hemû destkeftiyên mirovahiyê ye.

Ziman, perçeyekî jiyana însanan yê xwezayî-tebîî ye.

Ziman, ji ber ku tebîî ye, di bîte neynika jiyana civakê ya herî berbiçav.

Ziman, tiştên çandî û hûnerî yê ku koma civakê derxistîne holê, îfade diketin.

⁷⁵ Bayram Ayaz (2007), kovara Demokrat, Hejmar: 1, Bihar, *Ziman û Netewe, Neteweperwerî û Neteweperweriya Zimanî*, r. 33.

⁷⁶ Ayaz, b.n.b.r. 53.

Ziman, amûrê ragihandîna çandê ye.

Ziman, sistemeke ji dengan pêkhatîye.

Ziman, têgehestin û têkiliyên mirovî saz diket û pêktîne.

Ziman, amûrekî têkilahiyê yê herî girîng û pêşveçûyî ye.

Ziman xwedî taybetmendiyên hebûna fikr, raman, aqil û zeka ye.

Ziman, mexlûqekî zindî û civakî ye.

Ziman, bi taybetiya yekbûyîne ve serkirdeyê taybetmendiyên miletbûyîne ye.

Ziman, hemû gavan têkildare di gel dîrok, civak, dîn, çand û zimanê gel.

1.4. EDEBIYAT

1. Têgeha "Edebiyat"ê ya ji peyva Zimanê Erebi "edep"ê hatiye peydakirin-bidestxistin.⁷⁷ Edebiyat, ew e ku mirovî fikr, raman û hestên xwe, bi şêwazek xas û xusus ve bi ziman û uslûbekê ve di çerçeweya prensîb û quralan de, bi nivîskî yan jî bi devkî bînîte ziman.

Edebiyat jî xwediyê rêk, rêbaz, qanûn û prensîban e. Ji ber ku Edebiyat jî xwediyê rêk û rêbaz û qanûnan e 'ilm û zanyariyek e. Çimkî Edebiyat jî wek 'ilmên dî, xwetêgehiştin, şîrovekirin,⁷⁸ rexnekirin, li hemberî hev niqaş kirin û xwedîpêngavên bi cî kirinê ye.

2. Edebiyat, di wateya giştî de zanistekê ku jiyana mirovahiyê ji bo me dide têgihandin e. Edebiyat, amûrekî estetîk ê çand û hunerê ye û di dîroka neteweyan de, bûyerên wekî şer, leheng, mirovahî, huner, pêkenîn, lawij, rexne û kurtejiyan, gotar, gengeşî û şanoyê bi zimanekî wêjeyî û hunerî radixe holê.⁷⁹ Deqa xweşik, xweş, xwedîya taybetiyeke hunerî bi armanca têrkirina xwendevan a bi vî rengî nivîsîn, an jî ku ne xwediyê armanceke wisa be jî, ji aliyê teşe û naverokê ve, xwediyê van taybetiyan wekî wêje tê binavkirin.

Têgeha "edebiyat"ê, bi wateya ku îrû em bikartînin, ya ji aliyê Şînasî ve wek tûr-şikleke hunerê hatiye gotin û nivîsîn.⁸⁰ Berî Şînasî; ji bûna peyvên nazim û nesîrê peyvên "helbest" û "nijinandin" ê dihatine bikaranîn.

⁷⁷ Resul İzeddin Mustafa (2007, Bir Şair ve Düşünür Olarak Ehmedê Xanî ve Mem u Zîn, Avesta Yayınları, İstanbul, 341.

⁷⁸ Mustafa, b.n.b.r. 351.

⁷⁹ Cem Dilçin (1992), "Fuzulî'nin Şiirlerinde Söz Tekrarlarına Dayanan Bir Anlatım Özelliği", AÜ DTCTF, Türkoloji Dergisi, Sayı: 1/X, s. 321.

⁸⁰ Georges Mounin (1964), "Yeni Bir Şiir Okuma ve Dinleme Tekniğinin Doğusu", Türk Dili, Sayı: 114, Mart s.98.

Di dema nihe de, peyv û têgeha "**edebiyat**"ê bi van wateyan ve diête bikaranîn:

Hunera armanc û hedefa wê ew bîtin ku di fikr, raman, hizir û hestên însanan de, bi rêk û rêbazên ziman ve bi gotin û nivîsên bedew û rind ve, bi rêk û rêbaz û terzek estetîk û xweşik û bedew ve mijar, bûyer û sîmgeyan ve hatiye kirin.

Armanca edebiyatê, delalî, xweşikî û bedewîti ye. Du esasên edebiyatê yên bingehîn yêtheyn ku ev her du unsur edebiyatê dikene edebiyat:

1. Ziman- uslûb-şêwaz 2. Bedewîti, delalî û xweşkûki

Ev her du taybetiye jî, hem li gor nivîskar, hem jî li gor xwendevanî diguherbarin. Di edebiyatê de ya herî girîng ew e ku ji bilî naverokê kaca we naverok bi çî terz-uslûb-şêwaz û xweşikiyê ve aniye ziman û nivîsî.⁸¹

Berhema Edebî bi amûr û me'zemeyê ziman ve, bi armanca huneriyê ve bi terzek kelecane, xweşik, bedew û uslûbekê ve yê hatiye nivîsînê. Berhema Edebî ya ji aliyê însanan ve hatiye holê. Ev berhem orjînal e, xweser e, bê heval e, bê mîsal e, tekane ye, şexsî ye û xas û xusus e. Li gor menfî'etî nehatiye nivîsîn. Ji ber ku mijar û bûyerên civakî di nav xwe de dihewînin, wek neynika civakê ye. Berhema Edebî ya bi awayek xeyalî hatiye nivîsîn.⁸² Hunermend, helbestvan çenda ku mijarek ras û durist bikete mijara berhema xwe jî, ew dîsa jî dibîte xeyalî, çimkî hunermend, li gor jiyana xwe ya taybet û li gor derdora xwe, fikr û ramanên xwe, xeyal û tesewira cîhana xwe ya xusûs, me'zeme berhevdikeyin û bûyer û mijarê heyî li gor hindê divêhînin û di rêstînin. Berhema Edebî bi wî awayî ve di bîte neynika civak û jiyana demê.

Şert û Taybetiyên Berhema Edebî:

1. Nijandin û avakirina (nazim-nesîr) berhemê
2. Bikaranîna ziman
3. Lewn û şêwazê îfadekirinê
4. Uslûb- Terz
5. Sen'etên edebî û bikaranîna wan di berhemê de

⁸¹ Ramazan Kaplan (1998), "Edebiyatta Dilin Önemi Nedir?", *Edebiyat Bilgi ve Kuramları*, Anadolu Üniversitesi AÖF, Eskişehir, s. 78.

⁸² Mounin, b.n.b.r. s. 96.

6. Hecm û mazinahiya berhemê
7. Hilbijartina mijarê
8. Dîtin û nêrînên hûnermendî

2. TÊKILIYÊN DÎN, ÇAND, ZIMAN Û EDEBIYATÊ

2.1. Têkiliya Dîn û Çand'ê

Mijara teza me berhema giranbiha Mewlûd e. Mewlûd jî berhemek dînî ye. Mewlûd; ji ber vê xusûsiyeta dînî, bandorek dînî ya li ser çand, ziman û edebiyata Kurdî kirî. Mewlûd; jiyana civakî û şexsî di warê dînî de sazketin û bandoreke giran li ser jiyana wan diketin. Mewlûd bi vê taybetiya xwe ve ziman û edebiyatê jî di hemû qadan de eleqeder dike û bandora sazkirinê li ser çandê jî diketin.⁸³

Ji ber vê yekê emê bi taybetî li ser mijara têkilî û eleqederiya dîn û çand, dîn û ziman, dîn û edebiyatê sekinîn û bi vî awayî ve li berhema dînî ya bi navê Mewlûdê mêzeken ka bi çi qasî û lewnî bandora dînî li ser çand, ziman û edebiyata Kurdî kiriye.

Hem dîn, hem jî çand; her du jî bi jiyana civakî ve têkildarin û ji ber vê xusûsiyetê jî di nabeyna dîn û çandê de munasebetên gelek nêzîk yê heyn û yek û du di nêz de eleqeder diken û bandorê li ser hev diken. Bi vê wateyê ve her civakek ji bû xwe dînek û çandek xas û xusûs ya hey. Çand; wek lewn û şekl û terzê jiyana civakan diête hesabandin. Dîn jî; bawerî, felsefe, tesewir û eqîdeya civakê nîşa didetin.

Çawebe bila bibe, her civakek xwediyê çandek xas û xusûs e. Çimkî her civakek li gor şert û mercên xwe xwediyê jiyaneke ye. Ev cudahiya di nava jiyana wan de, raste rast bi taybetiya bingehê jiyana wan ve girêdayî ye. Jiyana her civakekê jî li gor şert û mercên demê; şert û mercên cî û waran xwedî taybetiyên cuda ye. Ji ber vê yekê jî çandek xas, xusûs, xweser û azad derdikevîte holê. Rastiyeke civakî ye ku her civakek li gor şert û mercên cî û demê, jiyaneke didomînin û li gor şert û mercên wê jiyaneke jî çandek xas û xusûs derdikevîte holê.

Rastiyeke dî jî ewe ku wextê dîn kete nav çandekê, dîn wê çandê li gor nirxên xwe, eqîdeya xwe, felsefeya jiyana û tesewira axîret û cîhana xwe divêtin wê çandê ji nû ve li gor wan nirxên

⁸³ Korlaelçi, b.n.b.r.239.

xwe sazbikeyê û biguherînîn. Dîn di serî de ji mensûbên xwe dixaze ku rewşa jiyana xwe li gor eqîdeya dînî sererast biken û nirxên ku wek 'evdînî û exlaqî li gor jiyana ku dîn te'rîf dike bijîtin. Wextê ku li gor vê felsefeyê jiyana berdewam kir, hemû nirxên dînî di kevine nava jiyana û jiyana wê civakê li gor dînî sazûbê û ev jiyane jî çandê avadiketin.

Di vê babetê de, di vî warî de dîn dikevîte nava çandê û naverokeke dînî lê zêde diketin û bi awayê dînî ve watedar diketin. Lê belê ji ber ku her civakek û şexsiyetek xwedî taybetiyêt çandek xas û xusûs e û ji ber ku her civakek û şexsek li gor têgehiştina xwe ji nirxên dînî ve îstîfade diken; daxiliya dînî ya ji bo çandê cudaye û bandor û sazkirina çandê jî li gor hindê cuda dibe. Têkildarî û bandoriya ku di nabeyna dîn û çandê de çêdibîtin wekhev e. Dîn çawan divêtin bandorê li ser çandê biketin; çand jî di vîtin bandorê li ser dînî biketin. Ji ber vê yekê taybetiyên dînî yên civakî wek bawerî û bendetî di bin vê bandora çandê de dimînin û di warê şeklî de diguherin.⁸⁴

Esas û prensîb û nirxên dînî yên bingehîn li gor civak û çandê naguherin lê belê, tikiliya ku nedîwarê bingehîn de e civakî û çandî diête guhertin. Sedemê vê jî bandora çandê ye. Ji ber ku dîn xwe diparêze û nevêtin ku bingehê xwe biguherîne, her dem xwe ji guherîna bingehîn ve muhazeze diket û bandora çandê dibin te'sîra xwe de dihêle. Ji ber vê yekê jî bandor û guherîna ku ji aliyê çandê ve li ser dînî çêdibe bi giştî di rengdêriyek talî de dimîne.⁸⁵ Bejdariya ku ji nûve çêdibe, ji bûna -şexsiyeta(zarok), ku avabîbin û ji civaknasîyê sûd wergirin û nirxên bingehîn di jiyana xwe de ava biken bandora nirxên dînî yên ku li ser çandê hatîne kirin û jiyana civakî sazkirîn pir girîng in.

Wextê ku şexsiyetek ji bona jiyana civakî di lebitîtin û şexsiyeta xwe avadiketin, ew bandora nirxên dînî li xwe diket û xwe bi wan ve saz diket û şexsiyeteke di bin bandora dînî de avadiketin, bi vî awayî ve jî dinava jiyana civakî de şexsiyata xwe ya xusûs avadike, nasnameya xwe nas diket, bi vê nasnameya xwe ve di nava jiyana civakî de cihê xwe saz diket û jiyana xwe berdewam diketin. Ji bona mijara civakî sembolên dînî û sazkirina civakî bandorek pir mezin li ser avahiya şexsiyeta tekane û civakî diketin.

⁸⁴ Korlaelçi, b.n.b.r.244.

⁸⁵ Ferhâd Şakelî (1996), Mem u Zîn'de Kürt Milliyetçiliği, Doz Yayınları, İstanbul, s. 322.

2.2. Têkiliya Dîn û Ziman

Cih, qad û warê ku dîn bandorê lê diket û xwe dinav de saz diketin, yek ji wan jî ziman e. Bandora ku dîn li ser ziman diket, di jiyana rojane de zimanê ku diête bikaranîn, li gor nirxên bingehîn ên dînî şekîl digirin û bi dînî ve dixwemilin jî ispata vê yekê ye ku ziman li gor dînî şekîldigire û xwe saz diketin.⁸⁶

Ziman bi vê taybetiya xwe ve, derûniya baweriya şexwsîyeta jiyana însan derdixîniye holê û bi vî awayî ve jî nasnameya şexsî di nava jiyana civakî de bi lewnekî taybet ava diket û wî dikete xwedî nasnameyek azad û serbixwe. Di dawiyê de ziman, dibête amûrê ragihandin, beyankirin û naskirina nasnameya kesane û şexsîyeta însanî.

Dema ku mirovî di nav koma civakî de tevlihev dibe û nasnameya civakê bi ya xwe ve tevlihev diket û nasnameya xwe nas diketin, gotin û kirinên rojane di dene diyarkirin ku zimanê me, yê di bin bandora sembolên dînî de saz bûy û evene yê bûyne xwedî qalibên esasî. Yanî sembolên ku di jiyana û zimanê rojane de derdikevine holê ew in yên ku ji felsefe û baweriya nirxên dînî ve hatîne hilgirtinê. Ev yeke bandor û têkiliya ziman û dînî bi awayek berbiçav mijarê didanîte holê.

Li gor tespîtekê heta ku perwerdehiya dînî temam nebîtin, dînî zarokan temam nabîtin.⁸⁷ Bi vê wateyê ve kamîlbûyîna ziman û dînî bi hev re temam dibe û bandorek mezin li hev diken. Dîn; zimanî di warê civakbûyîna de eleqeder diket û ji wî re dibête amûrek bingehîn. Ji ber vê yekê jî di jiyana rojane de sembol û îdyomên bingehîn ên ku ziman pê saz dibîtin hemû di bin bandora dînî de avadîbin û ziman pê dixwemil e û çand pê avadibe.

2.3. Têkiliya Ziman û Çandê

Çand, hebûna xwe bi ragihandina nîşên nû ve berdewam diketin. Ji bo vê ragihandina çandê pêwistî ya bi amûrên ragihandinê heye. Amûrê ku çandê, ji nîşan re radigihîne ziman e. Ziman amûrê ragihandina çandê yê herî tekane ye. Heke ziman neba, ragihandina çandê jî nedi bû û çand da di demê xwe de mînit û wînda bît. Lê ziman çandê diragehîniye nîşên mirovahiyê û çandê ji tunebûnê xwelast diketin.

⁸⁶ Şakelî, b.n.b.r.341.

⁸⁷ Şakelî, b.n.b.r.344.

2.4. Têkiliya Ziman û Edebiyat'ê

Di warê wêjeyê de jî, armanca mirov ya ku dixwaze xwe aîdê cihekî bike, xwe eşkere dike, ev jî wek nasnameyeke me ye ji nav nasnameyên me yê din ve xwe derdixe pêş. Li vir jî pêwistiya wêje û gotûbêjê derdikeve pêşberî me. Mirov di jiyana xwe de pirr tiştan dibîne, dibe xwedantecrûbe. Û ji aliyekê fikrî ve jî bi riya nivîsandin û gotinê dixwaze wan tiştan derxe holê; hin kes bo diyarkirina wan hîsan ji xwe re wêjeyê hildibijêrin, hin kes jî tenê axaftinê hildibijêrin. Di wêjeyê de jî bi vî awayî vegotina netewe/millet avadibe, yan jî li gorî Anderson⁸⁸ tê afirandin û xeyalkirin. Wêjeya neteweyî jî wisa tê avakirin, bêguman pê zimanek neteweyî. Loma di vi xalê de rola zimên girîngiya xwe nîşan dide.

Wêje bi metod, kaîde, vebêj û vegotina xwe ve, helbet bi zimanî neteweyî, yê cema't û gel, xwe aşkera dike û derdixe holê. Vêca di xwedîbûna wêjeyekê de jî ziman roleke mezin dilîze û wêje jî bi taybetî girêdayî ziman e. Piştî van gotinan, em dikarin bi rehetî û bi awayekî zelal bêjin ku wêje, ji xeynî rola netewe, pêşî her tiştî aîdî zimanekî ye, ji ber ku vegotina wî ancax pê zimanekî dikare ava bibe. Weke tê zanin, li gorî zanyaran, ziman çawa netewê diafirine, ava dike û bi vî awayî jî dike xwedî nasname, bi heman awayî jî vê dike wêjeya neteweyekê. Ji ber ku bê ziman wêje çênabe, em dikarin bêjin ku nasnameya wêje û nivîskar jî di warê çand û wêjeyê de ancax bi ziman ve ava dibe.

3. BI ÇEND UNSÛRAN VE BANDORA MEWLÛDÊ LISER ÇAND, ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

3.1. Unsûrên Edebî

3.1.1. Unsûrên Şeklî

a. Tertîba Mewlûdê

- 1- Meth û pesîndana Xwedê
- 2- Meth û pesndana Pêxember
- 3- Xêra xwendina Mewlûdê
- 4- Afirandina Nûra Hz. Muhemmed (sxl.)

⁸⁸ Şener, b.n.b.r.249.

- 5- Afirandina Adem Pexember (as)
- 6- Întîqala Nûra Muhemmed (sxl.)
- 7- Ji dayikbûna 'Ebdullah babê Muhemmed (sxl.)
- 8- Peymanbest û sozdayîna Cuhûyan ji bo kuştina 'Ebdullah Babê Pêxember
- 9- Zewaca 'Ebdullah û Amînê
- 10- Mizgîniya Pêxemberan li Amîneyê ji bo hemla wê
- 11- Wefata 'Ebdullah Babê Pêxember
- 12- Ji dayikbûna Hz. Muhemmed (sxl.)
- 13- Bûyerên di şeva ji dayikbûna Pêxember de qewimîn
- 14- Nîşanên ku 'Ebdulmutilib di şeva ji dayikbûna Pêxemberî de dîtin.
- 15- Hatina Helîmê bi bal Mekke, ji bo şîrdana Hz. Muhemmed.
- 16- Vegera Helîmê û karwanê Se'diyan ji Mekkê
- 17- Di nav Qebîleya Se'diyan de bûyerên li ser Pêxember çêbûyn
- 18- Vegera Helîmê bi bal Mekkê ve ji bo teslîmkirina Pêxember li Amînê
- 19- Du'a û paşgotin

3.1.2. Kêşeya Mewlûdê

Kêşeya Mewlûda Bateyî, “**Fâîlâtûn Fâîlâtûn Fâîlûn**”e. Eve ji Behra Remelê qalibekî nesalîm e. Li gorî kêteyên girtî û vekirî me qalibê arûzê tetbîq kir. Li ser hin xaneyên jêrîn ev tetbîqkirin wisa ye.⁸⁹

Hemdê bê hed bo Xudayê 'alemîn

- ž - - / - + - - / - + -

Ew Xudayê daye me dînê mubîn

(b.n.i.b. Beyt: 1)

- + - - / - + ± - / - + -

Fâîlâtûn Fâîlâtûn Fâîlûn

Ya Reb îmanê dixwazin em mudam

+ ž - - / - + ± - / - + -

Jê rê alaya Muħemmed we's-selam

(b.n.i.b. Beyt: 11)

- ž ± ± / ± + - - / - + -

Fâîlâtûn Fâîlâtûn Fâîlûn

⁸⁹ Ziver, b.n.b., r. 45.

Em kirine ummeta Xeyru'l-Beşer

- + ± ± / - + ± - / - + -

Tabi'ê wî muqtedayê nam(i)wer

(b.n.i.b. Beyt: 2)

± + - - / - + + - / + + -

Fâ'ilâtûn Fâ'ilâtûn Fâ'ilûn

Gote min: "Da biçneve bêzeħmetê"

- + - ± / - + ± - / - + -

Min gotê: "Nê hatî nûra reħmetê"

(b.n.i.b. Beyt: 28)

- ž - - / ± ž - ± / - + -

Fâ'ilâtûn Fâ'ilâtûn Fâ'ilûn

Çûn îradet hatî Sulţanê refî'

- => + - - / - ž - - / - + -

Çêkitin Adem bi vî şeklê bedî'

(b.n.i.b. Beyt: 28)

- + - => - / - + + - / - + -

Fâ'ilâtûn Fâ'ilâtûn Fâ'ilûn

3.1.3. Şemaya Qafiyeyên Mewlûdê

Şemaya qafiyeyan, weke hemû mesnewiyan, her xane di nav xwe de biqafiye ne.

MÎNAK:

aa, bb, cc, dd, ee.

a _____'alemîn

a _____mubîn

b _____beşer

b _____namiwer

c _____'ezîm

c _____Kerîm

d_____temam

d_____selam

e_____Celal

e_____bêzewal

3.1.4. Redîfên Mewlûdê

Redîf, di helbestan de, ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, wekheviya qertafên hevpar e. Berî qafiyeyê redif diête tespît kirin. Ger ku redîf hebe mirov wê dinivîsîne û derbasî qafiyeyê dibe. Ger ku tune be mirov li wekheviya dangan digere û wan li gorî navê qafiyeyan bi nav dike. Bateyî di Mewlûdê de redîf jî yet bi kar anîn.

MÎNAK:

Serfê Mewlûda me yek dîrhem fer e

Hemberî yek kohê zêrê eþmer e

(b.n.i.b. Beyt: 28)

Ey þeffî'ê darûyê her 'îllet ê

Dîde û bînahiya vê ummet ê

(b.n.i.b. Beyt: 13)

Gotî: "Nûra yek Nebîyyê mazin e

Seyyîd û hem serwerê nesla min e"

(b.n.i.b. Beyt: 104)

Ez dizanim la îlah îlla tu yî

Ew Muþhemmed hemberê îsmek bû yî

(b.n.i.b. Beyt: 67)

Paþê bir avête baxê Cennetê

Keyî darê jê bixwe her nî'metê

(b.n.i.b. Beyt: 90)

3.1.5. Qafiyeyên Mewlûdê

3.1.5.1. Qafiyeya Tam

Qafiyeya tam, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê,

wekheviya du dengan e. Di Mewlûdê de gelek caran qafiyeya tam hatiye ya hatiye bikaranîn.

MÎNAK:

Ew Hebîbê rohnîya heft asîman
Her du 'alem qalib ew rûh û rewan

(b.n.i.b. Beyt: 16)

3.1.5.2. Qafiyeya Dewlemend

Qafiyeya dewlemend, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya sê dengan û zêdetir e. Qafiyeya dewlemend, di Mewlûdê de ji ya tam kêmtir be jî, qafiyeya dewlemend di Mewlûdê de pir e.

MÎNAK:

Destegîr û mustexaşê her du kewn
Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn

(b.n.i.b. Beyt: 14)

3.1.5.3. Nîv Qafiye

Nîv qafiye, di helbestan de ji paşiya risteyê ber bi serê risteyê ve, ji xeynî redîfê, wekheviya dengê bitenê ye. Di Mewlûdê de nîv qafiye, kêmtir caran ya hatiye bikaranîn.

MÎNAK:

Saliha tesbîhi kir nûra şikerf
Şeş mî'et elf û çihar û bîst û elf

(b.n.i.b. Beyt: 48)

3.2. Unsûrên Hunerî

3.2.1. Hunera Şibandinê (Teşbîh)

Hunera şibandinê, ji bo ku peyv, bihêztir bikevîtin tê bi karanîn. Pêwîste peyva bêhêz, bête şibanî peyva bihêz.⁹⁰ Di Mewlûda Bateyî de, hunerên teşbîhê zehf in.

⁹⁰ Kadri Yıldırım, Çeviri ve Kavramsal Tahlil: Ehmedi Xanî Mem û Zîn, Avesta Yayınları, 2010, r. 54.

MÎNAK:

Serfê Mewlûda me **yek dirhem fer e**
Hemberê yek **kohê zêrê eħmer e**

(b.n.i.b. Beyt: 28)

3.2.2. Hunera Teşbihî Belîx

Ev hunere jî cureyeke hunera şibandinê ye. Di vê şibandinê de tenê ya ku dişibe û ya ku tê şibandin tê bikaranîn.⁹¹

MÎNAK:

Dilnewaz û pêk ve naz û **qenîleb**
Kes nedî şêrîntir ez bînta Weheb

(b.n.i.b. Beyt: 196)

3.2.3. Hunera Îstîarê

Ev hunere jî, hunereke şibandinê ye; lê di vê şibandinê de ji ya ku dişibe û ya ku tê şibandin yek tenê tê bikaranîn.⁹² Ji vê hunerê çend mînak di Mewlûdê⁹³ de yet heyn.

MÎNAK:

Revde gurgek hate **berxê nû ciwan**
Lê belê hişyar e lê zîba şivan

(b.n.i.b. Beyt: 177)

3.2.4. Hunera Têkiliyê (Tenasûb)

Di yekeya helbestekê de eger peyvên ku di navbera wan de têkilî hene bi hev re bêne bikaranîn navê wê hunerê tenasûb e.⁹⁴ Di Mewlûdê de ev huner ya di pir beytan de hatiye bikaranîn.

MÎNAK:

Rohnikêt wî şîn kirin **dar û nebat**
Çûn di erdê da û pa û mayî mat

(b.n.i.b. Beyt:110)

⁹¹ Yıldırım, b.n.b. r.55.

⁹² Yıldırım, b.n.b. r.56.

⁹³ Yıldırım, b.n.b. r.57.

⁹⁴ Yıldırım, b.n.b. r.58.

3.2.5. Hunera Bibîranînê (Telmîh)

Telmîh, hunera edebî ye, ya ku kesên navdar û dîrokî di înite bîra mirovan⁹⁵. Di Mewlûdê de zehf ya hatiye bikaranîn.

MÎNAK:

Fexrê **Îbrahîm** û **Îsmâil** û **Nûh**

Mustefayê ba wefayê ba fitûh

(b.n.i.b. Beyt:19)

3.2.6. Hunera Dubarekirinê (Tekrîr)

Hunera dubarekirinê, heke di peyvekê herfek yan kîteyek bête dubarekirin û yan jî beytek, peyvek du yan sê caran bête dubarekirin, li wir hunera tekrîrê çêdibe.⁹⁶ Di Mewlûdê de, di çend beytan de ev huner ya hatiye kirin.

MÎNAK:

Merheba ey 'alî sultan **merheba**

Merheba ey kanê 'îrfan **merheba**

(b.n.i.b. Beyt: 189)

3.2.7. Hunera Danaxiftinê (Întaq)

Întaq, ji bilî mirovan axaftina hebûnan e. Şa'îr carna, ji bilî însanan, tiştekdî didete axiftin, axiftin xususiyeteke mirovan e, heke ev xususiyet ji bû mexlûqqak dî hate bikaranîn, ew dibite hunera întaqê.⁹⁷ Wekî ku Bateyî di Mewlûda xwe de qelem daye axiftinê û hunera Întaqê kirî.

MÎNAK:

Ya qelem binvîse emrê padîşah

Ez çi binvîsim bi ferman ya Îlah

(b.n.i.b. Beyt: 64)

⁹⁵ Mehmet Bulut, Delilleriyle İslam Akaidi, Erkam Yayınları İst.2009, r. 66.

⁹⁶ Rênas Jiyan, *Melayê Bateyî-Mawlûd û Hemû Helbestên Wî*, Ç. Yekem, Weş., Amed 2013, r.55.

⁹⁷ Jiyan, b.n.b. r. 78.

3.2.8. Hunera Bangîniyê-Gazîkirinê (Nîda)

Hunera Bangînî, denglêkirin û gazîkirin e. Bi tevayî bi peyvên weke “ey, ya, eya” tete kirin.⁹⁸

MÎNAK:

Merheba **ey** 'alî sultan merheba

Merheba **ey** kanê îrfan merheba

(b.n.i.b. Beyt: 189)

3.2.9. Hunera Dijwateyîyê (Tezat)

Di risteyê de yan jî di beyt û çarînan de ji aliyê wateyî ve du peyvên dijwateyî bi hev re tèn bikaranîn.⁹⁹

MÎNAK:

Yek li destê **rastê** hat û yek li **çep**

Yek li piştê, yek li pêşim ba edeb

(b.n.i.b. Beyt: 269)

3.2.10. Hunera Pirsê (Îstîfham)

Hunera pirsê ye. Gelek caran ev pirs, ne li hêviya bersivê ye.¹⁰⁰

MÎNAK:

Ew kî bûn? Hewwa û Sara, Asî ye

Ya li pêşim Meryema Îmranî ye

(b.n.i.b. Beyt: 270)

3.2.11. Hunera Alîterasyonê

Ev huner, bi dubarekirina dengên bêdeng çêdibe.¹⁰¹

MÎNAK:

Yek li destê **rastê** hat û yek li **çep**

Yek li piştê, yek li pêşim ba edeb

(b.n.i.b. Beyt: 269)

⁹⁸ Jîyan, b.n.b. r. 79.

⁹⁹ Yıldırım, b.n.b.r. 134.

¹⁰⁰ Ziver, b.n.b. r.77.

¹⁰¹ Ziver, b.n.b. r.78.

3.2.12. Hunera Asonansê

Hunera Asonansê, bi dubarekirina dengên dengdêr çêdibe.¹⁰²

MÎNAK:

Yekî der destî mesîn û yekî teşt

Yekî anî came'ê sipî ez beheşt

(b.n.i.b. Beyt: 270)

3.2.13. Hunera Înandinê-Dubarekirinê

Helbestvan, di risteya yekem de peyvekê tîne, heman peyvê di risteya duyem de dubare dîke.¹⁰³ Bateyî, ev hunera înanandinê gele caran di Mewlûdê de ya bikaranî.

MÎNAK:

Merheba ey sîrrê furqan merheba

Merheba dermanê derdan merheba

(b.n.i.b. Beyt: 287)

3.2.14. Xweşbehane (Husn-î Tehlîl)

Hunermend, bûyereke pêkhatî bi sedemeke xweş re girêdide û sedema rastî tê veşartin û penîkirin. Lê her wiha divetin ku helbestvan bi xwe jî, ji bûyerê bi bawer be.¹⁰⁴

MÎNAK:

Ey ne'tê tu ez 'erşî heta ferî şehîra

Ez perteyê nûra te cîhangeştî munîra

(p.x, r. 82)

Bateyî di bêjîtin heke ronahiya pertewê nûra Hz. Muhammed neba, cîhan rohnî nedî bû. Rûnahî ya ji ber nurha wî derketî, roj ji nurha wî ye. Bateyî di vê beytê de Hunera Husn-î Tehlîl ya kirî.

3.2.15. Hunera Mubalexê-Mazinkirnê

Tiştêk biçûk be û miriv mazin biketin. Kesekî ku li şîroveya tiştêkî gelekî zêderewiyê bike, mirov dikare bibêje di vir de mubalexe heye. Di mubalexeyê de tiştên ku mirov jê bawer neke û li

¹⁰² Nezîr Ocak, *Edebiyata Kurdî*, Weş. Sîtav, Ç.Yekem, Wan 2016, r. 124.

¹⁰³ Ocak, b.n.b. r. 128.

¹⁰⁴ Yıldırım, b.n.b.r. 138.

dijî eqlê mirovan tê dîtin û ev tiştên ku tên bilêvkirin tu caran pêk nayên yê nav mubalexeyê de.
Wek Şa'îrek, mêşekê hindî gamêşekê te'rîf biketin ¹⁰⁵

MÎNAK:

Min hebin sêsed hezar 'ezman û dev

Yek demê xafil nemînin roj û şev

(b.n.i.b. Beyt: 556)

Wesfê husna te bibêjim subh û şam

Sed qiyamet dê biçin hêj natemam

(b.n.i.b. Beyt: 557)

3.2.16. Hunera Roçûnê (Îtra)

Helbestvan ne bi tenê pesna kesekî diketin, belkî behsa bab û bapîrê wî jî diketin, di medha wî de rodiçe. ¹⁰⁶ Di derheqê Pêxember de dibêje:

MÎNAK:

Silsila wî ta bi adem da û bab

Pêkve dê biçne beheştê bê hîsab

(b.n.i.b. Beyt: 270)

3.3. Unsûrên Dînî

Dîn, jiyanê bi hemû lewnan eleqeder diket. Jiber vê yekê dîn, jiyan mirov û mirovahiyê hem ji aliyê axretî, hem jî ji aliyê dînyevî ve saz diketin. Dîn, jiyan bixwe ye. Ji ber ku kesê ku bijîtin mutleqe xwedî bîr û baweriyekê ye. Ji ber ku jiyan bêy bawerî nabî. Bawerî dîn e, lê li gor Xuda "**dîn'ê heq**" yek e. Ew jî Dînê Îslamê ye. Lê ji bilî Îslamê dîn pir in, lê belê ew dîn hemî di batilin. Lêbelê dînê batil jî bîtin, xwedî tesewir û baweriyekê ye û jiyanê saz diketin. Ji ber vê yekê, dîn jiyan e, jiyan jî bi giştî, bi bîr û bawerîyan ve di ête jiyan û saz kirin. ¹⁰⁷ Dîn; bi vê taybetiya xwe ve rewşa jiyan ferdî û civakî bi awayê bawermendiyê ve di bin te'sîr û bandora xwe de dihêle. Çi însan nînin ku bêy bawerî jiyanê bidomînin. Her însanek, her qewmek-netewek di xwedî bîr û bawerîyan û li gor bawerîya dînê xwe tesewir û felsefeya jiyan xwe avadiken û li gor hindê jî di nava civakê de cî digire.

¹⁰⁵ Ocak, b.n.b. r. 94.

¹⁰⁶ Mustefa, b.n.b. r. 122.

¹⁰⁷ Othman, b.n.b.r. 139.

Qewmê Kurd jî xwedî bîr û baweriyek bingehîne û li ser vê bingeha bîr û baweriya xwe jî bingehê medeniyeta Cîhanşumûl jî bi maderiya axa maka jiyane a Mezopotamyayî ve bandorek pir erênî ya li tevahiya medeniyetên cîhangirî kirî û jiyana hemû mirovahiyê bi awayek bingehîn ya saz kirî û jiyana ya bi rûmettirîn ê existî. Miletê Kurd, Netewê Kurd; bihemî kevneşopiyên xwe ve bi hemû bîr û baweriyên xwe ve di hemû qadên jiyane de liser axa maka mirovahiyê; ya ku bi navê Mezopotamyayê ve hatiye nasîn tesewir û felsefeya jiyana xwe ya şexsî û civakî ya avakirî.

Miletê Kurd; bi dîn û kevneşopiyên bîr û baweriyên xwe yê 10 hizar salane ve, bi belaviya Dînê Îslamê ve, ev kevneşopiya bîr û baweriyên xwe, eve nêzîkî berî hizar sale bi Dînê îslamê ve yê zêrînkirin û bi vê zêrîniya xwe ve yê bûne xizmetkarên Dînê îslamê û nixê bîr û baweriyên xwe sed qat yê bi rûmettirîn ê existin. Miletê Kurd piştî ku Dînê îslamê bi hemû awayên jiyane ve qebûl kir, êdî di jiyana xwe ya Cîhanî de, jiyana Dunyevî saz kir û bi hemû lewnên jiyana bar ve ji bona Cihana Heqîqî, berê xwe da jiyana Axretî.

Ji ber ku Dîn, jiyane bihemû aliyane ve saz diket û bandorê li ser jiyana şexsî û civakî diketin; jiyana milletê Kurd bê hemdî xwe be jî, dibin bandora Eqîde, Tesewir û Felsefeya Dînê Îslamê de may û ligor esasên bingehîn yê Dînê îslamê hate saz bûn û bingehê avahiyê felsefeya jiyane bi berhemên edebî û zimanê Kurdî havêtin û bandorek mezin li ser çand û kultura xwe kirin. Dînê îslamê di bingehê xwe de xwedî tesewir û felsefeyeke axretiye û vê dinyayê wek zeviyek beyar-neçandî di danîte ber mirovahiyê û di bêjîte; tu li vê zeviyê çi biçînî dê wî piçînî. Ji ber vê taybetmendîya Dînê îslamê; jiyana Miletê Kurd jî bi lewnek bingehîn hate guherîn û tevahiya jiyana xwe ligor Cihana Heqîqî, Cihana Axîretê saz kir.

Eve qedera hizar salane e ku şaîr û hunermendên hêja di nav Milletê Kurd de wek stêrkan di nav cihana edebiyata cîhanî de birisqîn û ji bona bîr û baweriyên xwe wek mûmekê hîlbûn, ronahî dan û xwe helandin û cihana edebiyata Kurdî wek rojê birisqand di nav Edebiyata Gerdonî de. Van Şaîr û Hunermendan, bi zimanê Kurdî ve di hemû war û qadên jiyane de, pêşengiya netewê xwe kir, ku jiyana wan bibîte jiyaneke axretî.¹⁰⁸ Ji ber vê yekê bi hemû sen'et û hûnerên xwe ve civaka Kurd li ser esas û baweriyên dînê îslamê, bi zimanê Kurdî û Edebiyata Kurdî ve gelê Kurd perwerde kir û li Çanda Kurdî xwedî derketin û ev cîhan e ji bo wan kire zeviya çandîna Cihana Axretî.

¹⁰⁸ Osman Aslanoğlu (2017), "Di Mem û Zîn'a Ehmedê Xanî de Hunerên Wêjeyî", Şarkiyat, Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi 14-17 Eylül/September, Diyarbakır, s.371

Dînê îslamê bi çi awayî bandor li ser Çand û Kultura Kurdî kiri ye?

Belê me di serî de got ku dîn jiyana bi xwe ye. Bîr û baweriyên mirov û mirovahiyê di bin olê wan de şekîl digire û tesewira jiyana wan ligor bawerîya dînê wan ava di be. Miletê Kurd jî eve bi hizar salan e ku bi dînê Îslamê ve muşerref bûyn û li gor tesewir û felsefe û eqîdeya Dînê Îslamê de, bingehê jiyana xwe ya dînyevî û uxrewî ya sazîrî û hêj jî berdewam diken.

Rasterast dîn bandorê li ser Şa'îr û Hunermendan diket û şa'îr û hunrmend jî bandorê li ser ziman diken. Ziman jî nirxekî girîngê çand û kulturê ye. Edebiyat bi ziman ve di ê te kirin. Ziman jî ji layê mirovan ve di ête emelkirin. Mirov jî di bin bandor û tesîra rewşa jiyana rojane de hertim dimînin û li gor hindê jî di nivîsin û berhemên edebî diden, çandê pê avadîken û di xemilînin. Ew şa'îr û hunermendên Kurd ên misilman hiş û bîr û hizrên xwe yên edebî di bin sîya eqîde û felsefeya Dînê Îslamê de sazîken û bi vî awayî ve jî berhemên xwe li gor wê hişmendiyê sazîken.

Di esasên eqîde, felsefe û tesewira dînê Îslamê de; dîn jiyana bi hemû awayan ve eleqeder diket û di derheqê hemû qadên jiyana de xwedî biryar e û xwediyê hemû biryarên jiyana ye. Ji ber vê taybetiya dînê Îslamê, şa'îr û hunermendên musulman di bin bandora eqîde û tesewir û felsefeya Îslamê de di mînin û li gor hindê tesewira xwe sazîken û zimanê xwe ligor wê bîr û bawerîya xwe di xwemilînin û bi sembol û metaforên tesewira dînê Îslamê ve teşbîhan diken û fikr û ramanên xwe bi wî awayî avadîken.¹⁰⁹

Ew şa'îr û hunermendên ku di bin bandora dînê îslamêde mayîn û li gor hindê tesewir kirî û fikr û ramanên xwe avakîrîn; ev bandora he bi awayek tabî'î li ser zimanê hunermendî te'sîrê diket. Ji ber ku edebiyat jî bi ziman ve tete kirin, ziman jî li ser edebiyatê bandorê diketin û edebiyat jî wek ziman xîmek ji avahiyê çandê ye. Bi vî awayî berhemên dînî, li ser civakê bandorê diken û bi perwerdekîrîna civakê ve jî çandê sazîketin. Wek mînak, Mewlûd berhemek dînî ye, Şa'îr bi vê berhema xwe ve bîr û bawerîya civakê sazîketin û civak jî bi vê sazûyîna xwe ve jiyana berdewam diket û her gava jiyana wî di bîte êsîleyekê avahiyê çanda Kurdî. Em ê vê mijarê di şexsîyeta Bateyî û berhema wî ya bi nav û deng Mewlûd'ê de li jêr, bi mînakên berbiçav danîne holê.

¹⁰⁹ Bilgin, b.n.b.r. 139.

Li gor dînê îslamê gotina xweşik-bedew 'îbadet e. Wextê kû gotin lî gor hunermendî xêrbît, wê demê her gotin û nivîsên wî di bine 'îbadet û cîhana wî ya axîretê di xemilînîtin. Wextê bawerî weha dibêje, her wext û demê hunermendî dê bi hemû awayan ve bi gotin û nivîsên xwe yên edebî ve bi lewnê xêrê xwemilînîtin.¹¹⁰ Ji ber vê baweriyê jî, ziman dê di qelemê wî de bête hubra zêrîn. Ev hûbre jî dê zîmanî xwemilînî û edebîyat dê pê bi rewac kevît û di dawiyê de jî avahiyê çand û kultûrê pê bête avahiyek zêrîn.

Dînê Îslamê bi vî taybetmendiya xwe ve hûnermandan li dûv gotin û nivîsa bedew û xweşik têxît û wî dikete xweşiknivîs û nivîsên wî jî dikete xîm û êsîlên bingehê çandê. Çimkî, Dînê Îslamê bi gotina xweşik ve xizmeta herî girîng diket û şaîr û hunermandan ji bo ziman û edebiyatê li her dem û dewran bispor diket û avahiyê çandê pê zêrîndiketî û di warê edebiyatê de zîmanê wî hunermendî; li banê gerdonê di nexwşînî û edebiyat û çanda wî netewî wek sitêrka geş di biriqînîtin di nava cîhana edebiyata gerdonî de. Her nivîs û gotina bedew di bête êsîleyekê xîmê edebiyatê û ev edebiyate jî di bête xercê zêrîn ji bona çanda milletê Kurd.

Li gor bawerîya dînê Îslamê, gotina herî bedew û xweşik gotina Xweda ye.¹¹¹ Gotina Xweda jî ya ku hatiye nivîsîn jî berhema mubarek Qur'an'a Pîroz e. Hunermend û Şa'îrên Xwedênas û li dûv gotin û edebiyata xweşik di gerin, demildest di kevine dûv Gotina Xweda ya herî bedew û xweşiktirîn. Jiber vê taybetiyê her hûnermendekê musliman bi hemû lewnan ve jiyana xwe ya edebî-nivîskî li gor Qur'an'a Pîroz saz diket û hemû peyv û hevokên xwe li gor bedewiya gotina Xweda di rêstî û di vehînî û dikene edebiyat û xercê çanda milletê xwe.¹¹²

Şa'îr û hunermendê kû fikr û ramanên wî bi tesewir û felsefe û eqîdeya Dînê Îslamê ve avabûyîn, her çî gotin û nivîsa ji pênûsê wî derdikeve di bête peyvek zêrîn û êsîleyekê dîwarê çanda kurdî. Li gor bawerîya hunermendî, her peyvek xweşik li beranberî zêrekê ye. Her peyvek xîmekê edebiyatê ye, her hevokê edebî jî xîmê ziman e û her xîmekê ziman jî amûrekê ragihandin û dewlemendkirina çandê ye.

Wextê em mêzediken, dibînin ku di nav 'alama Îslamêde hemû şa'îrên bawermendên dînê Îslamê û bi taybet jî Şa'îrên Kûrîdnivîs; di hemû berhemên xwe yên edebî de, bi **"besmele"**, **"hemdele"**, û **"selwele"** yê ve yên dest bi nivîsa berhema xwe kirî. Em di bînin ku dînê Îslamê

¹¹⁰ Ejder Okumuş (2003), Toplumsal Değişme ve Din, İstanbul, s. 132.

¹¹¹ Fatih Özkan (1997), Din Kültür İlişkisi, Basılmamış Lisans Tezi, Ankara, s. 125.

¹¹² Ayaz, b.n.b.r. 145.

bandorek pir girîng ya li ser fikr û ramangerîya van hunermendan kirî. Ji ber vê yekê jî her hunermendekê tesewira zîhna xwe ya bi baweriya xwe ve girêday û berhemên xwe yên bi gotina herî edebî û xweşik Qur'an'a Pîroz ve xwemilandîn¹¹³ û di bin bandora gotin û nivîsa Xweda de mayn û li gor hindê xizmeta zimanê xwe, edebiyata xwe û çanda xwe kirîn.

Em dibînîn ku di bin te'sîr û bandora dînî Îslamê de, gelek cureyên edebî yên wekî **"Edebiyata Siyerê", "Mewlûdname", "Mî'racneme", "HîlyenAme" û "Ne'etname"** yên hatîne nivîsîn û bûyne malê edebiyatê. Ev cure berhemên edebî hemî jî yên bi amûrîya ziman ve hatîne nivîsîn û wek berhemek edebî bûyne malê edebiyatê û du dawî yê de jî her yek ji van yên bûyne êsîleyek ji bûna dîwarê xîmê çandê. Bi vî awayî resen e kû çand-kultur bi van berheman ve ya hatiye dewlementkirin.¹¹⁴

Ev berhemên ku dibin bandora dînî de hatîne meydanê, ji bûna rexneriya van berheman jî gelek berhemên rexneriyê yê hatîne nivîsîn û her yek ji wan jî berhemek edebîye û ew jî bi rexneriya xwe ve her dîsa bi wesîleya berhemên ku di bin bandora dînî de hatîne nivîsîn yê derketîne meydanê û bûyne malê edebiyat û ziman û çandê û her dîsa jî çand û kultur ya pê hatiye xemilandin. Di edebiyata Klasîka Kurdî de gelek berhemên bi vî awayî yê hatîne nivîsîn.

Ji ber ku mijara teza min û beşa herî girîng **"Bandor û te'sîra Mewlûd'a Melayê Bateyî li ser Çanda Kurdî"** ye, ez dê bi taybetî li ser naverok û armanc û terzê Mewlûda Bateyî sekinim û li ser çend numûneyên ber biçav sekinim kaca Bateyî bi berhema xwe ya navdar Mewlûdê ve bandorek çawan li ser Çand, Ziman û Edebiyata Kurdî kirîye.

Mewlûd'a Bateyî, Berhemek Dînî, Kurdî, Edebî û Çandî ye. Ji ber van taybetiyan, bandora dînî, kurdî, çand û edebî ya li ser jiyana civaka Kurd'an hatiye kirin.

Bateyî di Mewlûdê de bi gelek nav, cinavk, sifat, kirdar û terkîbên cuda ve ji Xweda behs diket û wî te'rîf diket û bi civata guhdêr re dide te hînkirin û bandorek dînî li ser çandê diketin: Bateyî di beşa mewlûdê ya yekemîn de, bi **"Hemda Xweda"** ve, Xweda bi gugdaran re di dete nasîn û gugdaran di derheqê Xweda de perwerde diket û bandoreke mazin bi riya dînî ve li ser çandê diketin. Em dê di vê mijarê de, behsa ku li ser danaskirina Xweda hatiye kirin û civak bi awayek edebî pêve tete perwerdekirin, dê bi diyarkirina beyta ve danîne holê û şîrove keyn.

¹¹³ Dilçin, b.n.b.r. 145.

¹¹⁴ Okic, b.n.b.r. 149.

3.3.1. Unsûra Danasîna Xweda

Bateyî, di mewlûdê de, nêzîkî sed beyt yên ji bona fesîhî û beyan kirin û danasîna Xuda vehonandîn û Xuda yê bi lewnekî şîrove kirî û bandorê li ser civak, jîyan, çand, ziman û edebiyatê kirî.

Me di nav 570 beytên Mewlûdê de, beytên ku bi awayekî ve behs û xeberê Xuda kirî, yekû yek tespît kirin:

1. Ew "Xwedayê 'Alemîn e." (b.n.i.b. Beyt: 1)
2. Ew "Xwedayê Dînê Mubîn e." (b.n.i.b. Beyt: 1)
3. Wî Xweda "Dînê Mubîn yê daye me." (b.n.i.b. Beyt: 1)
4. Wî Xweda "Em yêt kirîne ummeta xeyrul beşer." (b.n.i.b. Beyt: 2)
5. Wî Xweda "Em yêt kirîne tabi'ê Muqtedayê Namuwer." (b.n.i.b. Beyt: 2)
6. Ew Xweda, "Xwedayê Malikê Mulkê 'Ezîm e." (b.n.i.b. Beyt: 3)
7. Wî Xweda, "Mîrasa Qur'an'a Kerîm ya daye me." (b.n.i.b. Beyt: 3)
8. Wî Xweda, "Dînê me yê kamil kirî." (b.n.i.b. Beyt: 4)
9. Wî Xweda, "Nî'meta xwe ya li serme tamam kirî." (b.n.i.b. Beyt: 4)
10. Wî Xweda, yê "Daye me Ehmed û Darusselem." (b.n.i.b. Beyt: 4)
11. Ew Xweda, "Xwedayê bê nezîr e." (b.n.i.b. Beyt: 5)
12. Ew Xweda, "Xwedayê zulcelal e." (b.n.i.b. Beyt: 5)
13. Ew Xweda, "Xwedayê bê mîsal e." (b.n.i.b. Beyt: 5)
14. Ew Xweda, "Xwedayê bê heval e." (b.n.i.b. Beyt: 5)
15. Ew Xweda, "Xwedayê bê zewal e." (b.n.i.b. Beyt: 5)

16. Ew Xweda, "Xwedayê razîqê bê dest û payan e." (b.n.i.b. Beyt: 6)
17. Ew Xweda, "Xwedayê razîqê mar û moran e." (b.n.i.b. Beyt: 6)
18. Ew Xweda, "Xwedayê 'Alimê sirra negotî ye." (b.n.i.b. Beyt: 6)
19. Ew Xweda, "Xwedayê karîsazê benda ye." (b.n.i.b. Beyt: 7)
20. Ew Xweda, "Xwedayê karîsazê Sultanê Can e." (b.n.i.b. Beyt: 7)
21. Ew Xweda, "Xwedayê rehîm û rehman e." (b.n.i.b. Beyt: 7)
22. Ew Xweda, "Xwedayê letîf û mêhrîban e." (b.n.i.b. Beyt: 7)
23. Wî Xweda, "Asîmanê bê sutûn yê kir bedît." (b.n.i.b. Beyt: 8)
24. Wî Xweda, "Sûretê ba xal û xet yê aferîd." (b.n.i.b. Beyt: 8)
26. Ew "Xweda şahê kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 9)
28. Ew "Xwedayê kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 9)
29. Ew "Xwedayê hîdayetê ye." (b.n.i.b. Beyt: 9)
30. Ew "Xwedayê siratêl musteqîm e." (b.n.i.b. Beyt: 9)
31. Ew "Xwedayê îhdîna ye." (b.n.i.b. Beyt: 9)
32. Ew "Xwedayê hîvîya ye." (b.n.i.b. Beyt: 9)
33. Ew "Xwedayê xeffar e." (b.n.i.b. Beyt: 10)
34. Ew "Xwedayê Îhsanê ye." (b.n.i.b. Beyt: 10)
35. Ew "Xwedayê keremê ye." (b.n.i.b. Beyt: 10)
36. Ew "Xwedayê xufranê ye." (b.n.i.b. Beyt: 10)
37. Ew "Xwedayê menbe'ê Îmanê ye." (b.n.i.b. Beyt: 11)

38. Ew "Xwedayê Rebbê îmanê ye." (b.n.i.b. Beyt: 11)
39. Ew "Xwedayê alaya ye." (b.n.i.b. Beyt: 11)
40. Ew "Xwedayê alaya Muhemmed e." (b.n.i.b. Beyt: 11)
41. Ew "Xwedayê Rebbê alaya Muhemmed wesselam e." (b.n.i.b. Beyt: 11)
42. Ew "Xwedayê Rebbê jêrî alaya ye." (b.n.i.b. Beyt: 11)
43. Ew "Xwedayê nur e." (b.n.i.b. Beyt: 46)
44. Ew "Xwedayê layezal e." (b.n.i.b. Beyt: 52)
45. Ew "Xwedayê Îns û cin e." (b.n.i.b. Beyt: 54)
46. Ew "Xweda, padîşahê layezal e." (b.n.i.b. Beyt: 54)
47. Ew "Xwedayek malik e." (b.n.i.b. Beyt: 63)
48. Ew "Xwedayek celîl e." (b.n.i.b. Beyt: 63)
49. Ew "Xwedayek zulcelal e." (b.n.i.b. Beyt: 63)
50. Ew "Xwedayê celîlê zulcelal e." (b.n.i.b. Beyt: 63)
51. Ew "Xwedayek padîşah e." (b.n.i.b. Beyt: 63)
52. Ew "Xweda Îlah e." (b.n.i.b. Beyt: 64)
53. Ew "Xwedayek layezal e." (b.n.i.b. Beyt: 64)
54. Ew "Xweda Îlahî Seyîdî ye." (b.n.i.b. Beyt: 63)
55. Ew "Xwedayê Sultanê ba cûd û kerem e." (b.n.i.b. Beyt: 66)
56. Ew "Xweda Padîşahê Sermedê ye." (b.n.i.b. Beyt: 68)
57. Ew "Xweda, Rabbel 'Alemîn e." (b.n.i.b. Beyt: 69)

58. Ew "Xweda, Rabbê layenam e." (b.n.i.b. Beyt: 72)
59. Ew "Xweda, Rabbûn Xefûr e." (b.n.i.b. Beyt: 73)
60. Ew "Xweda, Sultanê refî'e" (b.n.i.b. Beyt: 77)
61. Ew "Xweda, Xaliqê her sûretê ye." (b.n.i.b. Beyt: 79)
62. Ew "Xweda, destê qudretê ye." (b.n.i.b. Beyt: 88)
63. Ew "Xweda, Rebbê 'Alemê ye." (b.n.i.b. Beyt: 88)
64. Ew "Xweda, Xwedawendê Felekê ye." (b.n.i.b. Beyt: 94)
65. Ew "Xuda, Xweda ye." (b.n.i.b. Beyt: 96)
66. Ew "Xuda, Xwedê ye." (b.n.i.b. Beyt: 97)
67. Ew "Xweda Rebbe." (b.n.i.b. Beyt: 98)
68. Ew "Xweda Îlah e." (b.n.i.b. Beyt: 100)
69. Ew "Xweda Îlah e." (b.n.i.b. Beyt: 101)
70. Ew "Xweda celîl e." (b.n.i.b. Beyt: 115)
71. Ew "Xweda cemîl e." (b.n.i.b. Beyt: 116)
72. Ew "Xweda sabîqe ye." (b.n.i.b. Beyt: 116)
73. Ew "Xweda Sultanê wedût e." (b.n.i.b. Beyt: 130)
74. Ew "Xweda Kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 141)
75. Ew "Xwedayê Malikûl-Milkê Mezin e." (b.n.i.b. Beyt: 256)
76. Ew "Xwedayê Xwedawendan e." (b.n.i.b. Beyt: 257)
77. Ew "Xwedayek Allah û Ekber e." (b.n.i.b. Beyt: 258)

78. Ew "Xweda 'Ellellahîl Kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 327)
79. Ew "Xweda Xwedê ye." (b.n.i.b. Beyt: 389)
80. Ew "Xweda Xudê ye." (b.n.i.b. Beyt: 395)
81. Ew "Xweda Îlah e." (b.n.i.b. Beyt: 403)
82. Ew "Xweda Rebbê 'Erş e." (b.n.i.b. Beyt: 403)
83. Ew "Xweda Rabb-ûl 'Alemîn e." (b.n.i.b. Beyt: 414)
84. Ew "Xweda Rebb e." (b.n.i.b. Beyt: 415)
85. Ew "Xweda Wellahîl 'Ezîm e." (b.n.i.b. Beyt: 425)
86. Ew "Xweda Allah û Ekber e." (b.n.i.b. Beyt: 434)
87. Ew "Xweda Xudê ye." (b.n.i.b. Beyt: 438)
88. Ew "Xweda Rehmet e." (b.n.i.b. Beyt: 443)
89. Ew "Xweda Xuda ye." (b.n.i.b. Beyt: 479)
90. Ew "Xweda Rabbanî ye." (b.n.i.b. Beyt: 512)
91. Ew "Xweda Lîllah e." (b.n.i.b. Beyt: 531)
92. Ew "Xweda Kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 532)
93. Ew "Xweda Celîl e." (b.n.i.b. Beyt: 536)
94. Ew "Xweda Kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 550)
95. Ew "Xweda Celîl e." (b.n.i.b. Beyt: 561)
96. Ew "Xweda Kerîm e." (b.n.i.b. Beyt: 561)
97. Ew "Xweda Îlah e." (b.n.i.b. Beyt: 562)

98. Ew "Xweda Rehîm e." (b.n.i.b. Beyt: 562)
99. Ew "Xweda 'Ezîm e." (b.n.i.b. Beyt: 562)
100. Ew "Xweda Metîn e." (b.n.i.b. Beyt: 563)
101. Ew "Xweda Rebb e." (b.n.i.b. Beyt: 564)
102. Ew "Xweda Xeffar e." (b.n.i.b. Beyt: 564)
103. Ew "Xweda Settar e." (b.n.i.b. Beyt: 564)

3.3.2. Unsûra Danasîna Pêxemberî

Di Tesewira Bateyî de, Hz. Muhemmed (sxl) û di Mewlûdê de, bi Tesewira Pêxemberî ve Bandora li ser Çand, Ziman û Edebiyata Kurdî, bi nêzikî dused beyt, yê ji bo vê mijarê vehonandîn û Eşq û Evîniya Xwe ya ji bû Hebîbê Xuda anîye ziman û bi vî awayî ve jî eşq û evîndariya xwe bi guhdarên Mewlûda Nebî ve parvediketin û divêtin ew jî wek wî bibine aşiq û evîndarên Pêxemberî. Bateyî di van dused beytan de, nêzikî penced caran behs û xweberê Pêxemberî diket û bala guhdaran dikêşînîte ser mazinahî û evîndariya Pêxemberî û bi vî awayî ve bandorek mazin li ser çand û ziman û edebiyata Kurdî diketin.

Me di nav 570 beytên Mewlûdê de, beytên ku bi awayekî ve behs û xeberê Hz. Pêxemberî kirî, yekû yek tespît kirin:

1. Em kirîne ummeta xeyr-ul beşer
Tabi'ê wî "**muqtedayê namuwer**" (b.n.i.b. Beyt: 1)
2. Dînê me kir kamîl û ni'met tamam
Ye'nî da me "**Ehmed û dar-ûs selam**" (b.n.i.b. Beyt: 4)
3. Karîsazê bende û "**Sultanê Can**"
Rahîm û rehman latîf û mîhrîban (b.n.i.b. Beyt: 7)

4. Ya rab îmanê dixwazîn em mudam
Jêrî alâya "**Muhemmed wes-selam**" (b.n.i.b. Beyt: 11)
5. Ber tû bada her zaman û an û hîn
Ey "**Muhemmed**" sed hezaran aferîn (b.n.i.b. Beyt: 12)
6. Ey "**şefî'ê darûyê her illetê**"
"**Dîde û bînahîya vê ûmmetê**" (b.n.i.b. Beyt: 13)
7. "**Destegîr û mustaxasê herdû kewn**"
"**Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn**" (b.n.i.b. Beyt: 14)
8. Sellî ya Rabbî ela "**xeyr-ûl beşer**"
Ta hebin teyr û bi xwînin ber secer (b.n.i.b. Beyt: 15)
9. "**Ew hebîbê ronîya heft asîman**"
"**Herdû 'alem qalib ew ruh û rewan**" (b.n.i.b. Beyt: 16)
10. "**Xakî payê Ehmed ew beyt-ûl heram**"
Lew şerîfin zemzem û rukn û meqam (b.n.i.b. Beyt: 17)
11. Sellî ya Rebbî 'êla "**xeyr-îl wara**"
Ma tesîrûşşems û fiseb'îl 'ula (b.n.i.b. Beyt: 18)
12. "**Fexrê îbrahîm û îsmâil û nûh**"
"**Mustafa yê ba wefa yê ba fitûh**" (b.n.i.b. Beyt: 19)
13. "**Sellî ya Rabbî 'ela xetm-îr rusûl**"
Ma yemûc-ûl aşîqûne fis-sibûl" (b.n.i.b. Beyt: 21)

14. **"Ew kelîmê xweş newayê çerxî tûr"**
Daxîdarim bo wî sîmayê bi nûr (b.n.i.b. Beyt: 22)
15. **"Ey şefî'ê sahîbê alâyê hemd"**
Min hene bê hed guneh nîsyan û 'emd (b.n.i.b. Beyt: 23)
16. Lê me hîvî wasîqe dê ez feqîr
"Jêrî alâyê" te bim roja 'esîr (b.n.i.b. Beyt: 24)
17. Her kesê guhdarê mewlûda **"Nebî"**
Dergehê mizgînîyan dê lê vebî (b.n.i.b. Beyt: 25)
18. Gote wî **"Peyxamberê 'alî sifet"**:
Mewlûda min her kesê mazin biket (b.n.i.b. Beyt: 26)
19. Dîrhemek bît serfê mewlûda **"Nebî"**
Xeyrekî mazin ji bo hasil dibî (b.n.i.b. Beyt: 31)
20. Tête heşrê ew digel **xelqê berê**
Ye'nî ba **peyxamberanê enwerê** (b.n.i.b. Beyt: 35)
21. Pir kesan dîtin keramat û eser
Ji xwendina mewlûda **sultanê beşer** (b.n.i.b. Beyt: 43)
22. Hêj ne erş û ferş û kûrsî û qelem
Hêj ne lewh û **enbîyayê muhteşem** (b.n.i.b. Beyt: 47)
23. Sed hezar û hem çihar û bîst û elf
Her yekî bû yek **Nebîyê dil şikerf** (b.n.i.b. Beyt: 57)
24. Paşî wî çêkir ji nûra **nâmûwer**
Cewherek lê kir nezer ew bû dû ker (b.n.i.b. Beyt: 58)

25. "Qale uktûb lâ îlah illâ ene"
Hem **Muhammed qasidê emrê mine** (b.n.i.b. Beyt: 65)
26. **Ger nebûya ew Muhammed** lewh û erş
Min ne tînane wucûdê ta bi ferş (b.n.i.b. Beyt: 69)
27. Gotî ewwel: ya **Muhammed** es-selam
Hem eleyke gotî Rebbê lâyenam (b.n.i.b. Beyt: 73)
28. Da cewaben an **hebîbêl 'îzzetê**
We 'eleyke es-selam û rehmetê (b.n.i.b. Beyt: 74)
29. Ummeta **Ehmed** nivîsî ehlê nûr
Ummet-ûn munzîbet-ûn Rabb-ûn xefûr (b.n.i.b. Beyt: 77)
30. Hatî cebraîl û ba emrê letîf
Çengekî axê ji wî **qebrê Şerîf** (b.n.i.b. Beyt: 82)
31. Nê hezaran salê çûne axirî
Ew **Nebî** bû Adem hêj av û herî (b.n.i.b. Beyt: 87)
32. Bû xezîne ew ji bo **dûrra yetîm**
Danîye pişta wî ew nûra azîm (b.n.i.b. Beyt: 90)
33. Saf bi saf westane pişta wî melek
Nazirê nûra **Muhammed** ew melek (b.n.i.b. Beyt: 92)
34. Rabbê alem gotî Adem ey mûlî
Tû ji bo nûra **Muhammed** hamilî (b.n.i.b. Beyt: 94)

35. Ew **Hebîbê** min di pišta te zûhûr
Lew melek têne temaşeyê ji dûr (b.n.i.b. Beyt: 95)
36. Hem bi fermana xweda wê sa'etê
Nûr ji piştê hate nîva cebhetê (b.n.i.b. Beyt: 97)
37. Gotî nûra yek **Nebîyê mezin** e
Seyîd û hem serwerî nesla min e (b.n.i.b. Beyt: 105)
38. Dît nivîsî lâ îlâhe îlellah
Ba **Muhemmed** ba resûlullahê şah (b.n.i.b. Beyt: 113)
39. Got bi heqqê an **Muhemmed** key te neqş
Wî kirî bâ îsmê xwe ber saqî erş (b.n.i.b. Beyt: 114)
40. Hurmeta navê **Muhemmed** an resûl
Tewbeya te bû qebûl û her qebûl (b.n.i.b. Beyt: 117)
41. Çûn ji Adem nûra **Ehmed** bû cûda
Hate pišta şîs û burhan-ûl huda (b.n.i.b. Beyt: 118)
42. Jê bû **'Ebdullah** bi hûkmê sabîqe
Nûra **Ehmed** der cebîneş barîqe (b.n.i.b. Beyt: 130)
43. Mezhera nûra **Muhemmed** hatî ew
Pâk û nûranî mueyyed hate ew (b.n.i.b. Beyt: 131)
44. Wextê rabit **Ehmedê** 'alê 'alem
Nasixê tewrat û incîl û senem (b.n.i.b. Beyt: 136)

45. Hat **xudanê seyf û Qur'an'a mubîn**
Xûnê Yehya bû nîşana wî yeqîn (b.n.i.b. Beyt:137)
46. Hem ji erdê tête sem'im ev kelam
Wî digelte nûra **Ehmed** wes-selam (b.n.i.b. Beyt: 156)
47. Çavê min mizgîn lite ey nazenîn
Dê ji te zahir bîtin **Şahê emîn** (b.n.i.b. Beyt: 160)
48. **'Eşrefê mexlûq û Siltanê cîhan**
Dê ji te zahir bîtin bê şik bi zan (b.n.i.b. Beyt: 162)
49. Mîn dît der xwab û mame mûntezer
Ehmed ez piştta teye **Canê peder** (b.n.i.b. Beyt: 163)
50. Ta neête kuştin ew **Zîba heram**
Yek ji me naête axa milkê şam (b.n.i.b. Beyt: 168)
51. Rojekî wan dî bi çolê de meşî
Talibê **nêçîr û ahûyê xweşî** (b.n.i.b. Beyt: 172)
52. Revde gurgek hate **Berxê Nûciwan**
Lê belê hişyare lê **Zîba şivan** (b.n.i.b. Beyt: 177)
53. Paşê wê **sirra 'ezîm û nûrî tab**
Nazilê qelbê weheb bû izdirab (b.n.i.b. Beyt: 184)
54. Bêje Evdulmuttalib: min Amîn e
Wê li nîk zîba 'efife mûqîn e (b.n.i.b. Beyt: 188)

55. Dê çî bêjim ez cemal û me'rîfet
Walida **Ehmed** bese her ew sifet (b.n.i.b. Beyt: 198)
56. Cebraîl hatiye **dewra Ehmedî**
Hat **şahê** mislê wî çavan nedî (b.n.i.b. Beyt: 216)
57. Xweş nîda hat ez yesar û meymene
Nûra Ehmed hat û çû nik Amîne (b.n.i.b. Beyt: 221)
58. Hate **nûranî şefî'ul-muznibîn**
Hate **Xeyr-ûn-Nasê Xetmûl-Murselîn** (b.n.i.b. Beyt: 222)
59. Lew li min çêbûye tirs û zelzele
Ba **Muhammed** Amîne bû hamîle (b.n.i.b. Beyt: 226)
60. Hate dewra **Ehmedî**, dewra me çû
Lat û 'Uzza dê biket bê ab-î rû (b.n.i.b. Beyt: 227)
61. Hate **xûnrêzê cîhangîr û sefak**
Em ji destê wî hemî dê bin helak (b.n.i.b. Beyt: 229)
62. **Rohniya her du cîhan û milletan**
Ummeta wî çêtirînê ummetan (b.n.i.b. Beyt: 230)
63. Wê digel te **xatemê pêxemberan**
Nasixê herfa kîtab û defteran (b.n.i.b. Beyt: 236)
64. Ewwela min dî ji min **nûrek** diçî
Qeşra Buşra min ji 'eksa wî didî (b.n.i.b. Beyt: 238)

65. Mahê sadis hate Îbrahîm Xelîl
Da me mizgînî ji wê **hemla cemîl** (b.n.i.b. Beyt: 243)
66. Mahê sabi‘ hate Îsma‘îl zebîh
Mujde bexşî min, ji wê **hemla melîh** (b.n.i.b. Beyt: 244)
67. Mahê samîn hate Mûsa ba wefa
Îbşîrî ya Amîne bîl Muştefa (b.n.i.b. Beyt: 245)
68. Mahê tasi‘ hat ‘Îsa ji asîman
Mujde da min: “Hatî **sulţanê cîhan**” (b.n.i.b. Beyt: 246)
69. Ew ku şeş meh çûn ji **hemla munqelîb**
Gote ‘Ebdullahî, ‘Ebdulmuţtelîb: (b.n.i.b. Beyt: 247)
70. Wê demê dê Amîne **kodek** bibî
Yek ziyafet lazim e de‘wet bibî (b.n.i.b. Beyt: 249)
71. ‘Ebdullah ew **mahê rûyê gûl‘izar**
Der Medîne şerbeta mergê vexwar (b.n.i.b. Beyt: 250)
72. Kan hebîbê min dilê min bû du nîm
Ah *û* hesret **kodekê** min ma yetîm” (b.n.i.b. Beyt: 254)
73. Diwazdehem hilbû **şemala dewletê**
Amîne mabû tenê der xelwetê (b.n.i.b. Beyt: 262)
74. Wê demê min bo **Muħemmed Mustefa**
Nûra can û me‘dena sidq û sefa (b.n.i.b. Beyt: 283)

75. Çûn ji min bû wî û **Sultanê** derîn
Xerqê nûr bû ew semewat û zemîn (b.n.i.b. Beyt: 284)
76. Herçî mexlûq pêkve bûne şadîman
Xem diçûn 'alem ji nûr ve dîte **can** (b.n.i.b. Beyt: 285)
77. Merheba ey **sirrî Furqan** merheba
Merheba **dermanê derdan** merheba (b.n.i.b. Beyt: 287)
78. Merheba ey **canê baqî** merheba
Merheba 'uşşaqê **saqî** merheba (b.n.i.b. Beyt: 288)
79. Merheba ey '**alî sultân** merheba
Merheba ey **kanê 'îrfan** merheba (b.n.i.b. Beyt: 289)
80. Merheba ey **şemsê taban** merheba
Merheba ey **canê canan** merheba (b.n.i.b. Beyt: 290)
81. Merheba ey **qurretûl 'eynê Xelîl**
Merheba ey **xasî mehbûbê Celîl** (b.n.i.b. Beyt: 291)
82. Merheba ey **rehmeten lîl 'alemîn**
Merheba **en te şefî'ûl muznibîn** (b.n.i.b. Beyt: 292)
83. Merheba ey **afîtabê bê zewal**
Merheba ey **mahî tabê layezal** (b.n.i.b. Beyt:293)
84. Merheba ey **bulbulê baxê wîsal**
Merheba ey **aşînayê zulcelal** (b.n.i.b. Beyt: 294)
85. Merheba ey **nûrî xurşîdê Xuda**
Merheba êy tu ji **Heq nabî cuda** (b.n.i.b. Beyt: 295)

86. Merheba ey **geşteyê behra heqîq**
Merheba ey **dîdeyê ehlê heqîq** (b.n.i.b. Beyt: 296)
87. Merheba ey **sahebê ceş û heşem**
Merheba ey **kasirê Lat û Senem** (b.n.i.b. Beyt: 297)
88. Merheba ey **sahibê seyf û xeza**
Merheba ey **mani'ê Lat û 'Uza** (b.n.i.b. Beyt: 298)
89. Merheba ey **metlûbê 'alem her tu yî**
Merheba **ewladê haşim her tu yî** (b.n.i.b. Beyt: 299)
90. Merheba ey **nûrî heqra mezher î**
Merheba ey **ewliyara serwer î** (b.n.i.b. Beyt: 300)
91. Merheba hatî **şivanê ummetê**
Merheba hat **bû me nûra dewletê** (b.n.i.b. Beyt: 301)
92. Merheba ey **bedrî 'alem ya munîr**
Merheba ey **xelqê ketîra destegîr** (b.n.i.b. Beyt: 302)
93. Merheba **sultanê cumle enbiya**
Merheba ey **nûrê çeşmê esfiya** (b.n.i.b. Beyt: 303)
94. Merheba ey **îxtîfarê enbiya**
Merheba ey **şem'ê cem'ê ewliya** (b.n.i.b. Beyt: 304)
95. Merheba ey **menbe'ê îzzû wefa**
Merheba ey **kanê eltafê 'eta** (b.n.i.b. Beyt: 305)

96. Merheba ey **nûrî çeşmê ummetê**
Merheba ey **sun'ê şahê qudretê** (b.n.i.b. Beyt: 306)
97. Sucde bir her wê demê an **nûrî can**
Dest hilînandin bi sûyê **asîman** (b.n.i.b. Beyt: 307)
98. Hate ve **medhûn û pêçayî, kehîl**
Pare 'ewrek dî gehîşte ew **cemîl** (b.n.i.b. Beyt: 309)
99. Dê çî bêjim ne'tê **zatê enwerî**
Ê ku 'alem cumle bo wî çêkirî (b.n.i.b. Beyt: 318)
100. Taze eywan xane ê **Nûşîrewan**
Rast **û çep** hejya **û lerzî** nagehan (b.n.i.b. Beyt: 320)
101. Der duşembê diwazdehê ewwel rebî'
Salê filê hatî ew **hemlê bedî'** (b.n.i.b. Beyt: 324)
102. Rukneha Allah **û Ekber** jê dihat
Hat mizgînîya **Muhemmed** es-selat (b.n.i.b. Beyt: 327)
103. Pakî bûm ez Lat **û 'Uzza** û senem
Hat **Ebûl Qasim şahê 'alî 'alem** (b.n.i.b. Beyt: 328)
104. Rast **û çep** xweş hate **zîba** erxenûn
Nê **Muhemmed** hat **û pût** bûn sernuxûn (b.n.i.b. Beyt: 329)
105. Belg **û dar** û ber ji feyza **Layemût:**
Ca ena Ehed Resûlullah digot (b.n.i.b. Beyt: 332)
106. Amîne hat **û ewî** jê kir *sual:*
Kanî ew **nûra** digel te ey şepal? (b.n.i.b. Beyt: 336)

107. Amînê bo gotê: **mewlûda mezin**
 Hatifi navê **Muḥemmed** gote min (b.n.i.b. Beyt: 337)
108. Wê di xewnê de diye **nûra mûbîn**
 Ger divêtin tu bibînê, dê bibîn (b.n.i.b. Beyt: 338)
109. Paşê çendî dît ew **nûra sebî**
Rohniya çavê di bapîrê xwe bî (b.n.i.b. Beyt: 343)
110. Ha niha biçne Mekke ey cumle jin
 Da mubarek bin ji **mewlûda mezin** (b.n.i.b. Beyt: 352)
111. Min ji bo wî got, ewî got: Ey ḥebîb
 Belkî ew **mewlûd** ji bo me bît nesîb (b.n.i.b. Beyt: 355)
112. Kariwan rabû bi qesda Mekkete
 Bûm suwar û hem li ber min zemrete (b.n.i.b. Beyt: 361)
113. Gote min: Da biçneve bê zehmetê
 Min di gotê: hat û **nûra dewletê** (b.n.i.b. Beyt: 363)
114. Ya Ḥelîme isri'î mizgîn li te
 Tu dayînî bo **Muḥemmed** xwezuya te (b.n.i.b. Beyt: 366)
115. Gote 'Ebdulmuṭṭelib: Xweş Amînê
 Nê divêtin bo **Muḥemmed** dayînê ? (b.n.i.b. Beyt: 370)
116. Yê xweşî **zîba yetîmê şîrvexwer**
 Her du 'alem jêrî ferman ser bi ser (b.n.i.b. Beyt: 374)

117. Yê xweş ew re‘na yetîmê şîrî cû
Nûra her du ‘alem ez **ruxsarî** tû (b.n.i.b. Beyt: 375)
118. Ey Hêlîme hilgire an **pakî zat**
Dewleta baqî û daîm bo te hat (b.n.i.b. Beyt: 376)
119. Hatime bo yek peser ez bim dayîn
Ger li nik te dê hebî **nî‘mel-emîn** (b.n.i.b. Beyt: 378)
120. Wê li nik min **nûra çeşm û qûtê can**
Mîslê wî nabin nebûne, der cîhan (b.n.i.b. Beyt: 381)
121. Lê yetîm e, durre bê mîslê me hey
Ez cihê babê me ger dê tu bibey (b.n.i.b. Beyt: 382)
122. Dê çi key tu ba yetîmê bêpeder
Ya Hêlîme damena sebrê biger (b.n.i.b. Beyt: 385)
123. Gotê: Her bîne ewî **tiplê yetîm**
Qet *tewekkelna ‘elallahî‘l-kerîm* (b.n.i.b. Beyt: 388)
124. Xweş vegerya pêşî ‘Ebdulmuṭṭelîb:
Hatime **durdaneyê** te ey muḥîb! (b.n.i.b. Beyt: 389)
125. Da biçîne pêşî dayê Aminîn
Min ku dî ew **ḥusn û dîdara şîrîn** (b.n.i.b. Beyt: 390)
126. Xweş de ma hilgirt kenî bê hed gelek
Nûrê xwende layiqê çerxa felek (b.n.i.b. Beyt: 392)

127. Bûse da min her du **çavê enwerîn**
Xweş mêjî ba her du **lêvên şekkerîn** (b.n.i.b. Beyt: 393)
128. Min bes e ew **kodekê nûrîn cemal**
Dewlemend im dê çi kem ba tişt *û* mal (b.n.i.b. Beyt: 396)
129. Xwestî xatîr min ji cedd *û* Amîn e
Amînê hilgirtî ew **nazik ten e** (b.n.i.b. Beyt: 397)
130. Dabû ber bêhna xwe rohnik bûne çem:
Ey **Muħemmed!** dê biçî ez dê çi kem (b.n.i.b. Beyt: 398)
131. Ey **hebîbê** min **Muħemmed** ey **delal!**
Bêje da rohnik nebarin bo te al (b.n.i.b. Beyt: 400)
132. Tu emanetê Xudê bî ey **ciger!**
Ey Hêlîme fî emanîllah biber (b.n.i.b. Beyt: 402)
133. Bir Hêlîma bo xwe ew **durra yetîm**
Xweş bi te dayîne ya Se'd *û* hêlîm (b.n.i.b. Beyt: 403)
134. Hêris anî *û* Hêlîme lê suwar
Paxila rastê **Muħemmed** tê veşar (b.n.i.b. Beyt: 405)
135. Dî kusan ew ker Nebî xweş çû çeleng
Wê li pişta wî **suwarê neh felek** (b.n.i.b. Beyt: 408)
136. Wê li pişta min **Resûlê Rebbê 'erş**
Jê re destê wî ji 'erşê ta bi fers (b.n.i.b. Beyt: 413)

137. **Seyyîdê mexlûqê Rebbîl ‘alemîn**
Çêtirînê ewwelîn û axirîn (b.n.i.b. Beyt: 414)
138. Wî digote rahiban wesfa hebîb:
Wexte rabîtin **Muḥemmed** ‘en qerîb (b.n.i.b. Beyt: 419)
139. Ez ji wan borîm *û* çendînê gelek
Şu‘leya nûra **Muḥemmed** çû felek (b.n.i.b. Beyt: 421)
140. Dê çi kem ya Rebb meded mîrê mezin
Wa **Muḥemmed** rohniya çavê di min (b.n.i.b. Beyt: 424)
141. Hate nêzîkî me koma rahiban
Min **Muḥemmed** dî nezer da asîman (b.n.i.b. Beyt: 425)
142. **Dewleta baqî** geha nav Se‘dîyan
Rizq *û* ni‘met hatin *û* bê tehlîyan (b.n.i.b. Beyt: 429)
143. Hem Hêlîme xerqî in‘am *û* kerem
Wê **Ebu’l-Qasim** li malê, bo çi xem (b.n.i.b. Beyt: 432)
144. Hem bi hukmê karê ummet perwerî
Bû şivan *û* laîqê **peyxemberî** (b.n.i.b. Beyt: 439)
145. Ey **şivanê kodekê zîba dilêr**
Xwezîya wî berxê ji dîdara te têr (b.n.i.b. Beyt: 446)
146. Wextê êvarê **şivan** dê bête mal
Ez diçûme pêşi **zîbayê delal** (b.n.i.b. Beyt: 447)

147. Wî **Muḥemmed** dît û dûvê xwe hejand
‘Aşiqane hate pêş û ser nihand (b.n.i.b. Beyt: 455)
148. Cote merdim bo **Muḥemmed** hat û bir
Ez nizanim bû **birayê** min çî kir (b.n.i.b. Beyt: 461)
149. Wa **Muḥemmed** got û rabun mêr û jin
Gote Ḥaris: Ey Ḥelîme wey li min! (b.n.i.b. Beyt: 462)
150. Hate kuştin der **xerîbê berkê** ‘eys
Ez çî bêjim, pêşî salarê Qureys (b.n.i.b. Beyt: 463)
151. Bûse da min, her du **çavên surmeyî**
Ew çî bû hate **hebîbê** min tu yî” (b.n.i.b. Beyt: 466)
152. Gote min: “Ev behreyê dêwê le‘în
Min ji te avêt, ey **şahê Emîn!** (b.n.i.b. Beyt: 471)
153. Min **Muḥemmed** anî û min gotê: Wer
Mû‘cize ger te hene, dê bîne der (b.n.i.b. Beyt: 489)
154. Ew ji avê hate der rabû qiyam
Gotî an dem: “*Ya Muḥemmed esselam*” (b.n.i.b. Beyt: 491)
155. An ker anî û Ḥelîme bû suwar
Hem li ber sîne **hebîbê namidar** (b.n.i.b. Beyt: 497)
156. Hate **sulṭanê felek jêrî ne‘al**
Hate **cananê du ‘alem ‘eksê hal** (b.n.i.b. Beyt: 501)

157. Hatî **meḥbûbê du sed Yûsif xulam**
 Hatî **muxtarê ku 'erş û ferşî ram** (b.n.i.b. Beyt: 502)
158. Hat û bo te ey Mekke weqtê surûr
 Sed hezaran **nûrê sîmayê binûr** (b.n.i.b. Beyt: 503)
159. Her peya pey hate awazê şîrîn
Muştefa wê daniyande ser zemîn (b.n.i.b. Beyt: 506)
160. Kes nedît û hateve ew haderî
Mustefa lê berze bû, ber da girî (b.n.i.b. Beyt: 508)
161. Deng hilîna wê li banê koçikan
 Ah *û* wah! **Durrdaneyê** min kê revan? (b.n.i.b. Beyt: 509)
162. Wî **Muḥemmed** gote 'Uzzayê senem
 Ser nişivî hate secdê gote hem: (b.n.i.b. Beyt: 517)
163. Tu here ey pîrê! Ew çi gotin e
 Ew **Muḥemmed** hat *û* nê 'ezla min e (b.n.i.b. Beyt: 518)
164. Gotina xeybê 'îcazet min nebû
 Lew dibêjim, **Eḥmedê** min berze bû (b.n.i.b. Beyt: 528)
165. Haşelîlah ew **Muḥemmed** berze bî
 Belkî 'alem dê di wî da berze bî (b.n.i.b. Beyt: 531)
166. Bo **Muḥemmed** her zeman û her mekan
 Sed hezaran nobedar û pasiban (b.n.i.b. Beyt: 532)

167. Tu biheqê feđl *û* îhsana ‘ezîm
Bêje min eđwalê wî **ñiflê yetîm** (b.n.i.b. Beyt: 537)
168. Gote: “Ey namêm ji min pirsî bi lez
Ez **Muħemmed îbnî ‘Ebdullah** me ez (b.n.i.b. Beyt: 542)
169. Gote: “Ez ceddê te me ey **rûħ û can**
Ey **ħebîbê min ‘ezîzê xanedan**” (b.n.i.b. Beyt: 543)
170. Dabû ber sîne, *sûwar* kir hate mal
Hate malê taze ew **nûra zelal** (b.n.i.b. Beyt: 544)
- 171. Eħmeda! çavê te ma zaxel-beser**
Yek îşareta te *înşeqqe’l-qemer* (b.n.i.b. Beyt: 546)
172. Ateşê Mûsa çi bû? **ruxsarî tu**
Wed-dûħa nûra dilê hişyarî tu (b.n.i.b. Beyt: 548)
173. Nê ji **ne’leyna** te ey **durra yetîm**
Fexr *û* teşrîf e ji bo ‘erşê ezîm (b.n.i.b. Beyt: 550)
174. Her du ‘alem çi? **siha îqbalî tu**
Sûndê Welleylî bi zulf *û* xalî tu (b.n.i.b. Beyt: 551)
- 175. Hem tu rûħ û hem rewanê can *û* dil**
Pêşi bejnaya siha te bû xecil (b.n.i.b. Beyt: 552)
- 176. Şehriyarê çetreyê ‘ewrayî tu**
Xetîê şeq bû ber felek, **tuxrayî tu** (b.n.i.b. Beyt: 554)
- 177. Şehsuwarê duldulê kewn *û* mekan**
Wasilê weđdet seraya lamekan (b.n.i.b. Beyt: 555)

178. Ya **Resûlellah! Resûlê îns û cin**
Ya şefî'ê sedrê dîwana mezin **(b.n.i.b. Beyt: 558)**
179. **Tabi'ê an şehsuwarê ummetê**
Pêk ve rabin da biçîne Cennetê **(b.n.i.b. Beyt: 565)**
180. Ewwela bo rewzeya **nûrîn nîqab**
Saniya bo al û ezvac û şehab **(b.n.i.b. Beyt: 566)**

2.3.3. Unsûra Selewatan û Bandora Wan Liser Çandê

Mijara selewatdanê di Mewlûdê de wek rûknekê dînî diête beyankirin û hînkirin. Bateyî ji bo vê yekê jî bi hemû lewn û awayên edebî meth û senayên hêja ji bona Cenabê Muhemmed (sxl.) diketin.

Gelê Kurd, di her dem û wextên me'newî de li ser vê esasê jiyana xwe ya me'newî di domînin û sazkirina fikr û ramanên xwe li ser vê felsefeya di Mewlûdê de saz diken û 'îbadetê xwe ji bo Xwedê di bin bandora hînkirina Bateyî de pêk tînin. Bi wesîleya vê hînkirina mijara dînî, civata Kurd di bin bandora hînkirina terzê Mewlûdê de di hêle û li gor vê perwerdehiyê jiyana wan jî li ser çandê te'sîr diketin. Ev bandor û te'sîra he jî, bi awayek ber biçav li ser çand û kultura civaka Kurdan bandorê diket û avahiyê Çanda Kurdî pê diête xemilandin.

Em dê nihe li jêr li ser beşa Mewlûdê, ya ku ji bona Hz.Muhemmed (sxl.)li ser pêwîstiya selewatdanê hatiye nivîsîn rawestîn û şîrove keyn. Em dê bi awayek berbiçav bînin kaca Mewlûd bi vê hînkirina xwe ve bi çî awayî bandorê li ser bîr, bawerî û çanda Kurdî diketin.

Wek rêbaz ez dê mijarê li ser beytan yek bi yek şîrove kem, kaca di kîşk beytê de bi çî awayî bi rêka hînkirina mijarê bandora dînî li ser çandê hatiye kirin.

MÎNAK:

Ey şefî'ê darûyê her 'îletê
Dîde û bînahiya vê ummetê **(b.n.i.b. Beyt: 13)**

Bateyî di vê beyta jorîn de, di misreya yekem de, Hz. Muhammed Pexember (sxl) yê wek şefa'etkar û dermanê hemû derdan daye naskirin. Ev yeke li ser guhdar û xendekarên Mewlûdê bandorê mezin diketin. 'Alim û hunermendekî wekî Bateyî, ku aşiq û evîndarê Hz. Muhammed(sxl) e, bi vê danasîna û hînkirina xwe ve civakê di bin te'sîra Mewlûdê de dihêlîtin.

Çimkî, yê ku çareseriyê li hemû derd û kulan biketin gelekê bi rûmet e. Ji ber vê yekê jî yê ku gudariya vê mijarê diketin gelek qedr û qîmetê Mewlûdê digire û li gor agahiyên Mewlûdê jiyana xwe ava diket û dîndariya xwe di jîtin. Bi vî awayî ve jî çand pê avadi be.

Li gor vê agahiya Mewlûdê Hz. Muhammed(sxl) Pêxember, di bîte dermanê hemû êşên maddî û manevî. Yanî hem ji bona vê cîhanê û hem jî ji bona cîhana axretî piştevanê herî mezin e.

Bateyî, weha di vehonîn e: Ew "**Dîde û bînahîya vê ummetê**" ye. Di vê beytê de jî Pêxemberî wek çav û ronahiya ummetê di dete naskirin. Ronahî bi me'na maddî û me'nevî ve di ête femkirin. Ew Pêxemberê ku di hemû tarîtiyan de li me bibe ronahî û me ji tarîtiyan derxîne û ber bi ronahiyê ve bibetin, mirovî hemî ji bo wî yekser dê li her dem û dewran hurmetkarbin û bine aşiq û evîndarên wî. Ji ber vê yekê jî Mewlûd, ji bona wan kesan gelek bi qedr û qîmet dikeve û tiştê ku Bateyî di vê Mewlûda xwe de di bêje bandorek pir hêja li ser vê civakê diket û ev yek jî di jiyana rojane de xwe dikete malê çandê û çand pê dewlemend û ava dibe.

"**Dîde**" û "**bînahî**" tiştên herî payebilindin. Bateyî, Hz. Muhammed(sxl) wekî çav û ronahiya ummetê hemyê nîşan di detin. Ma heke Hz. Muhammed(sxl) ronahiya me bît, bîbikên çavê me bît û em her du cîhanên xwe bi ronahiya çavên wî ve dibînin, wê demê hewceye ku bi hemû awayên jiyane ve em ji bo Wî xizmetkar û evîndarbîn. Ew çavên me yê me'newîye û ronahiya her du cîhanên me ye.

MÎNAK:

Destegîr û mistaxasê herdû kewn

Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn

(b.n.i.b. Beyt: 14)

Li gor ku Bateyî di vehonîtîn; Hz. Muhammed(sxl) "**destegîr**" û "**mistexas**" e û destê me digir e û me ji hemû bindestî û nexweşiyên dîr diêxîtin. Yê ku destegîr be li hemû dem û dewran

û li her dû kewnan, hemli dînyayê û hem li axîretê, li her du cîhanan pîştevan e. Ji ber vê yekê be jî mirovî ji bo Wî her dem bi kelecane da ku hurmetê jê re bigre û sipasiyan jê re biket.

Ew ji bona me gunehkaran penah e, yanî cihê ku em xwe lê veşêrîn da ku çi zerer û xirabî ne gehîte me. Ew bû me pişt e. Pîştevaniya herî mazin e.

MÎNAK:

Sellî ya Rebbî 'ela xeyrûl beşer

Ta hebin teyr û bi xwûnin ber secer

(b.n.i.b. Beyt: 14)

Bateyî, hîviya ji Rebbê xwe diketin ku hindî teyr û tûyên ku di xûnin hebin, ji bo Hz. Muhemmed(sxl) selewatan biden. Di bêje ji ber ku ew di nav hemî beşeriyetê de beşerê herî bi rûmet û qedirbilind e. Çimkî eve nas e û li gor nasê jî giringiya mijarê zêdetir dike. Belê ew civaka ku guhdariyê li vê mijarê diketin, dê di bin bandora vê Mewlûdê de mînît û li gor hindê dê jiyana xwe saz ketin û bi vî awayî ve jî bandorekê li ser çandê ketin.

MÎNAK:

Ew hebîbê rohaniya heft asîman

Her dû 'alem qalib ew rûh û rewan

(b.n.i.b. Beyt: 16)

Bateyî di Mewlûdê de, Hz. Muhemmed(sxl) wek hebîb û xweştiviyê heft asîmanan di dete hînkirin û her du cîhanan jî wekî qaliban didete zanîn û Hz. Muhemmed(sxl) jî wek ruh û giyanê qalibê wan cîhanan di dete hînkirin.

Yanî, Pêxember xweştiviyê ronahiyê bi xwe ye. Ronahî çi ye?

Ronahiya heft Asîmanan e. Ew roja heft asîmana ye. Ew wek rojê hemû cih û waran ronî diket û wan bi germahiya xwe ve hembêz diket û ji hemû dar û nebatan re dibe ruh û can. Ew ruh û canê her du qaliba ye. Heke ew ne hatiba xuliqandin, da her du cîhan cî di bê ruh bin wek qalibekî bê can.

Bateyî di înite wê wateyê ku heke Hz. Muhemmed(sxl) neba, her du cîhan jî ne dihatine xuliqandin. Ew şexsiyetê ku hindey bi wate, ji bona Wî, ji guhdarên Mewlûdê di ête xastin ku selewatan biden. Bi vê hînkirina he ve, Mewlûd bandorê li ser civatê diket û ev civat jî ji dil û can

ji bona her du cîhanên xwe selewatan diden û li gor vê bîr û baweriyê jiyana xwe saz diken û li ser çand û zimanê xwe te'sîrê çêdiken.

MÎNAK:

Xakî payê Ehmed ew beyt-ûl heram

Lew şerîfîn zemzem û rikn û meqam

(b.n.i.b. Beyt: 17)

Bateyî bi wesîleya Mewlûdê ve civakê di derheqê "**Axa Beyt-ul Heram**" de perwerde diket, sedemên mubarekbûna "**ava zim zim**" diket û qîmetbûna rukn û meqamên li wî cihê diket û di bêjîtin ew hemî ji ber xatira wî di mubarek in. Çûnkî pê Hz.Muhammed(sxl) yê bi ser wê axê ketî û wî jiyana xwe ya li ser wê axê domandî. Di dete zanîn heke pîyên mubarek li ser wê axê neketibana û Wî li wêrê jiyana nekiriba, çi qîmeta wê û rûmet û mubarekbûna wê nedibû.

Ev hînkirin bi vî awayî jî bandoreke hêja li ser guhdarên Mewlûdê diket û guhdar li gor hindê li şexsîyeta Pêxemberî dinêrin û jiyana xwe li gor hindê saz diken û avahiyê çandê pê avadiken.

MÎNAK:

Sellî ya Rebbî 'ela xeyr-il wera

Ma teşîr û şems û fîsseb'îl 'ula

(b.n.i.b. Beyt: 18)

Bateyî, guhdarên Mewlûdê dîsa bi awayek gelek qîmetdae agahdar diket û ji wan daxaz diketin ku selewatan bidene ser riha Hz. Muhammed (sxl.) Bateyî, di vê beytê de dibêjîtin hindî ku roj li heft asîmanan bi zivirîtin, hûn her û her selewatan bidene ser riha mubarek. Eve jî di ête wê wateyê ku hindî qiyamet nerabît û jiyana verdewam biketin, pêwîste ji bûna xweştivîyê Xuda û ronahiya her du cîhanan selewat bêne danê.

Eve jî bandoreke pir giranbiha û bi rûmete li ser guhdarên Mewlûdê di ête kirin. Civaka Kurd, bi vî awayî bîr û baweriyên xwe saz diken û li ser vî esasî û eqîdeyê dijîn, bandorê li ser çandê diken û çandê pê dewlemend û ava diken.

2.3.4. Unsûra Hedîsên Ku Bateyî Di Mewlûdê De Bikaranîn û Bandora Wan Ya

Liser Çanda Kurdî

Ji ber ku "**Hedîs**", li gor dînê îslamê çavkaniyek muhîm û duyemîn e.¹¹⁵ Wekî 'alim û helmestvanên Misilman, Bateyî jî di berhemên xwe de hedîsên bikaranîn û yê ji wan îstîfade kirî. Bateyî bi awayek edebî û şehrezayî yê bi rêka sen'etê Telmîhê ve ji hedîsan îstîfade kirî.¹¹⁶ Telmîh Sen'etek Edebî ye. Bateyî ev sen'etê edebî bi hostayî yê bikaranî.

Em dê di vê mijarê de li ser Hedîsên ku Bateyî bi rêka telmîhê ve behs jê kirî, rawestîn û bi kurtahî şîrovekeyn. **Wek mînak:** Bateyî, bala vê hedîsê diketin ewa ku dibêje: "*Hemû tiş ji ber xatira Hz. Muhemed yê hatiye xuluqandin. Heke ew neba Xuda ev 'aleme nedi xuliqand.*"¹¹⁷

Bi riya telmîhê ve di Mewlûdê de vê hedîsê diînîte bîra me û vê mijarê weha di vehonîtin:

MÎNAK:

Ger nebûya ew Muhemmed lewh û erş

Min ne tînane wucûdê ta bi fers

(b.n.i.b. Beyt: 69)

Ney tu yî ney cennet û narê mezin

Cumle eşya min ji bo wî çêkirin

(b.n.i.b. Beyt: 70)

Ev rîwayeta li jorî ku Bateyî bi telmîhê ve bi bîranî, rîwayeta:

"lewlake lewlake lema xeletu'l-eflake" ye.

Belê, Bateyî bi bîranîna vê hedîsê û bûyerê ve bi Mewlûda xwe ve guhdarên hêja û civakê perwerde diket û di dete zanîn ku cîhan, lewh û 'erş û hemû tişt yên li ser xatira Hz. Muhemmed(sxl) hatîne xuluqandin. Ev yeke bandorekî pir hêja li ser bîr û baweriyên bawermendan diket û li gor vê eqîdeya ku Bateyî didete hînkirin bi Mewlûdê ve; çanda civakê di bin bandora dînî de xwe ji nû ve avadiketin û li gor hindê jiyana xwe di xwemilînin. Çimkî wekî ku Bateyî bi vê beytê ve didete zanîn: "**Ger nebûya ew Muhemmed lewh û erş/Min ne tînane wucûdê ta bi fers**" Bateyî di dete zanîn ku Pêxember li ba Xuda xweştiviyekê pir hêjaye. Wextê

¹¹⁵ Salih, b.n.b.r.149.

¹¹⁶ Albayrak, b.n.b.r.249.

¹¹⁷ Subhi, b.n.b.r.254.

ku guhdarên Mewlûde bi dehan caran ve ev bûyere bi vî awayî guhdar kir, wê demê di bîr û baweriyên wan de jî ev xweştivî û mazinahiya Hz. Muhammed Pêxember, di qelbê wan û baweriya wan de bi cih dibît û jiyana wan di guherînê û avahiyê çandê; bi êsileyên nû ve, bi xîmên giran ve avadiken.

Bateyî di mewlûdê de bi çend beytan ve mijara ku Hz.Muhammed(sxl); berî Hz. Adem hatiye xuluqandin û hêj Hz. Adem di xulqiyetbûna heriyê de, Hz. Muhammed yê hatiye xuliqandin û behsê hindê jî diketin ku Hz. Muhammed yê ji nûrhê hatiye xuliqandin.

MÎNAK:

**Girte yek qebze ji nura xwe Xweda
Gotî wê “Kûnî hebîbî Ehmeda (b.n.i.b. Beyt: 46)**

**Hêj ne erş û ferş û kursî û qelem
Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem (b.n.i.b. Beyt: 47)**

Nê hezaran sali çûne axerî
Ew **Nebî** bû **Âdem** hêj **av û herî (b.n.i.b. Beyt: 87)**

Belê, Bateyî bi vê mijarê ve û van hedîsan ve jî guhdarên Mewlûdê bi berhema xwe ve perwerde diket û di dete zanînê ku xulquyeta nûra Pêxemberî berî xuluqandina Hz. Adem jî ya hatiye çêkirin. Bi vî awayî ve dîsa mazinahî û giranahiya Hz. Muhammed(sxl), di danîte holê û bi civakê ve ditete zanîn û hînkirin. Ji ber vê bîr û baweriyê, di nav bawermendan de, eşq û evîndarî, viyan û hûrmeta Hz. Muhammed(sxl) di qelb û baweriya wan de bi cî diketin. Ev yeke jî bi vî awayî ve bi rêka dînî ve bandorê li ser avahiyê çandê diketin û çand pê dixwemile.

Bateyî, bi sen'etê biranînê-telmîhê ve; dîsa behsê şivantiya Hz.Muhammed(sxl) û ummetê diket û weha divehonîne:

MÎNAK:

Merheba hati **şivânê ummetê**
Merheba hat bo me nûra dewletê **(b.n.i.b. Beyt: 301)**

Ev hedîse di nav çavkaniyên hedîsên sehîh de, wek çavkaniyên Buharî, Muslim û Cacî'us

Sehîh ê de derbazdibît.¹¹⁸

Bateyî bi beytek dî ve dîsa hedîsa ku di derheqê şefa'eta Pêxemberî de bi bîrtîne û weha telmîh diketin:

MÎNAK:

Destegîr û mustexasî herdu kewn

Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn (b.n.i.b. Beyt: 14)

Ez şefî'ê wî me roja mehşerê

Dê vexût ew tasek ava kewserê (b.n.i.b. Beyt: 27)

Bateyî, mijara ku ummeta Hz. Muhemmed(sxl) ji ummetên dî bi xêr û bêrtîrîne jî ya bi beytekê ve bi bîranî û sen'etê telmîhê yê bi karanî.

MÎNAK:

Ummeta Ehmed nivîsi ehlê nûr

Ummetun muznibetun Rebbun xefûr (b.n.i.b. Beyt: 77)

Hz. Muhemmed(sxl) di hedîseke xwe de weha gotiye:

*" Mirovên bi xêr û bêrtîrîn ewin yên hevçaxiya min kirîn."*¹¹⁹

Bateyî bi vê beyta xwe ya jêrîn ve jî hedîsa li ser bûyera " **înşeqqel qemer**", şeq û dukerbûna heyvê bibîrtînîtin:

MÎNAK:

Ehmeda çavê te ma zaxel beser

Yek îşareta te **înşeqqel qemer (b.n.i.b. Beyt: 246)**

Ev mijara li jor, "**înşeqqel qemer**" ya ku di vê beytê de hatiye bibîranînê, hem di ayetan de, hem jî di hedîsên sehîh de jî derbas dibîtin.¹²⁰ "Di wextê Hz.Muhemmed(sxl) de, heyv bû di şeq û însan jî bûne şahidên vê."¹²¹ Ev mijare jî ya di nav berhemên hedîsê de yên ku sehîh, Buharî û Muslim ê de hatiye qeyd kirin.

¹¹⁸ Subhi, b.n.b.r.254.

¹¹⁹ Subhi, b.n.b.r.259.

¹²⁰ Subhi, b.n.b.r.277.

¹²¹ Akdoğan, b.n.b.r.279.

Belê, di êtedîtin ku Melayê Bateyî Mewlûda xwe ya bi çavkaniyên hêja ayet û hedîsan ve jî xwemilandî. Em dibînîn ku Bateyî bi awayek ûstayî û bisporî Sen'etê Telmîhê yê edebî yê bikaranî û bala kêşaye ser çend hedîs û bûyerûn siyerê. Bateyî hem di warê edebîde hem jî di warê îlmî de ûsta û bisporekê hêja û birêmet e.

Bateyî, di helbest û Mewlû da xwe de hedîs û bûyerên siyerê yên bi awayê Sen'etê edebî yê telmîhê-bîranînê ve vehonandîn. Di ête dîtin ku Bateyî di gelek berhemên xwe de hedîsên sehîh yên bi karanîn. Alimên ku di ilmê hedîsê de ne bisporin, carna hedîsên mewzû-nesehîh jî bi kartînin. Ev yeke di nav helbestvan û hunermendan de ya hey. Çimkî hunermend û şa'îr di warê hedîsê de bispor nînin. Ji ber hindê ev yeke tiştek normal diête dîtin.

2.3.5. Di Mewlûdê De Unsûra Qur'an'a Pîroz û Bandora Wê Ya Liser Çanda Kurdî

Çavkanî û berhemên ku di medrese û xwendegehên Kurdistanê de di warê dînî û zimên de hatine xandin, referansa wan ya herî sereke û bingehîn, bêguman Qur'an'a Pîroz bû. ¹²²

Di Edebiyata Klasîk a Kurdî de, çawa Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî berhemên hêja û bingehîn dayne û ji bû vê yekê jî mijar û çavkaniyên wan yên bingehîn Qur'an û Sunnet bûye, Melayê Bateyî jî yê ji vê taybetmendiye îstîfade kirî û di vî warî de ewî jî berhemên hêja yên dayn û ev taybetmendî ya di berhemên wî jî de bi awayek eşkere dîyarde bûy. Bateyî ev yeke bi lewnên cuda cuda ve, ya bikaranî, carna bi awayek raste rast, carna jî bi awayek nepenî ve ev mijere yên nivîsîn.

Bi kurtahî Bateyî, hem di berhema xwe ya bi navdar Mewlûdê de hem jî di berhemên xwe yên din de Qur'an'a Kerîm, wek referansa yekemîn û bingehîn ya bikaranî û bi vî awayî ve bandora dînî, ya bi ayetên Qur'an'a Pîroz ve bi rêya Mewlûdê ve bi awayek serkeftî, ya li ser Çanda Kurdî kirî. ¹²³

Wextê ku mirovî berhemên bateyî bi awayek hûrgulî xandin û vekolîn û lêkolînek bi diqqat li ser kir, mirovî bi awayek zelal fam diketin ku ji bona îstîfadekirina xandin û nivîsînên berhemên xwe, yekemîn çavkanîya bingehîn Qur'an'a Pîroz ya bikaranî. Wextê ku mirovî bi

¹²² M.Halil Çiçek (2009), *Şark Medreselerinin Serencâmi*, İstanbul: Beyan Yayınları, s.74.

¹²³ Mehmet Tıraşçı (2013), "Güneydoğu Ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler Ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları" C.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi, Cilt: XVII, Sayı: 2 Sayfa: 209-236

awayek akademîk jî lêkolînekê li ser diketin; em dikarîn bêjîn ku fikr, raman û dîtinên Bateyî yê li ser vê¹²⁴ bingehê û em dişêyn li ser vê bingehê jî rexne û şîrove bikeyin.

Bateyî, bi berhema xwe ya giran biha Mewlûdê ve bandorek çawan li ser çand û edebiyata Kurdî kirîye? Melayê Bateyî bi 'Alimiya xwe ve, bi 'Arifiya xwe ve, bi Hûnermendî û Şa'iriya xwe ve bandorek mezin ya li ser çand û edebiyata Kurdî kirî. Em dê di bin vî sernavî de hînbîn kaca Bateyî di derheqê Qur'an û Dînê Îslamê de çi qeder xwedî 'ilme û ev zanyariyên xwe bi berhemên xwe ve bi çi awayî bi civaka Kurd re parvekirîne û bi vê parvekirîne ve jî bandorek çawan li ser civak û çanda Kurdî û ziman û edebiyata Kurdî kirîye.

Mela Huseynê Bateyî, zanîn û zanyariyên di derheqê çavkaniyên bingehîn de, ji bo 'ilmên Îslamî û zanînen di derheqê Qur'an'a Pîroz de, di serî de yên di Mewlûda xwe de û helbestên xwe de diyarde kirîn û danîne holê.¹²⁵ Em dê di bin vî sernavî de agahiyên di derheqê navên Qur'an'ê, sûreyên wê, hejmarên cuzyên wê û di derheqê berhevkirina wê de agahiyên bingehîn danîne holê.

3.3.5.1. Navên Qur'an'ê

Ji bilî navê "Qur'an"ê hin navên di jî yên navdar û meşhûr yê heyn; wek Kîtap, Furqan, Zikir, Tenzîl û hwd.¹²⁶

Bateyî, di mijara "merheba"ya Mewlûda xwe de, behsê navên Qur'an'ê, Furqan'ê diket û di bêje ku Hz. Muhemmed di derheqê sîrrên Furqan'ê de agahdar e û bi vê beytê ve weha di vohonîtin:

MÎNAK:

Merhaba ey "**sirrî Furqan**" merhaba

Merhaba ey derdê derman merhaba

(b.n.i.b. Beyt: 287)

Ev peyva "furqan"ê ya di vê beytê de hatî bikaranîn, wek peyvên; şûkran, buhtan û kûfran ê, masdarin û di êne wateya "ji hevcudakirina heqîqet û înkâr û kufriyê".¹²⁷

Melayê Bateyî, çi di Melûda xwe de û çi ji di helbestên xwe yên di de, mijarên ku li ser rawestîya û şîrove kirîn, yek ji vanmijaran jî mijara Pêxember û Wehyê ye. Di bin vî sernavî de

¹²⁴ Tıraşçı, b.n.b.r. 166.

¹²⁵ Tıraşçı, b.n.b.r. 166.

¹²⁶ Mehmet Yanmış, "*Diyarbakır'da Mevlid Geleneği ve Bazı İller ile Karşılaştırmalı Bir Analiz*", Uludağ İlahiyat Fakültesi Dergisi, cilt:21 sayı:1

¹²⁷ İbn 'Aşur, Muhammed et-Tahrîr, *et-Tahrîr ve't-Tenvîr*, Tunus, Dar Suhnun, trs, s. 141

em dê li ser vukûfiyeta¹²⁸ Bateyî ya ku di derheqê Cibraîl, Wehî û Hz. Muhemmed de rawestîn û mahiriya wî ya di vî warî de derxînine holê.

3.3.5.2. Hz. Pêyxember û Cibraîl

Qur'an'a Pîroz, xwe bi bingeş û çavkaniya wehyê ve di de nasîn û girêdan.¹²⁹ Hz. Peyxember jî di riya rast û durist de naderkevît û bi qahîmiya li ser rêya rast de¹³⁰ ev yeke ya beyan û fesîh kirî. Qur'an, di dete zanîn ku melekê wehyê Cibrîl, çend carekan bi şikl û lewnê xwe yê 'eslî ve yê ji Hz. Peyxember re xuykirî û li gel wî têkilî yên danayn. Evmijare di Qur'an'ê de weha ye: "**Çavên wî şaş ne bûn û sînûrê xwe jî ne bûrî.**"¹³¹

Bateyî, vê ayeta ku di Sûreyê Necm'ê de derbaz dibe, îqtîbas dike û bi vê awayî di dawiya Mewlûdname'ya xwe de ji Hz. Peyxember re weha xîtab dike:

MÎNAK:

Ehmeda cavê te ma zaxel beser

Yek îşareta te îneşqel qemer

(b.n.i.b. Beyt: 546)

3.3.5.3. Hz. Pêyxember û Wehî

Qur'an'a Pîroz, ya bi rêya Cibraîl ve ji Hz. Peyxember ve hatiye wehî kirin û dema ku hatiye nazil kirin jî demildes ya hatiye hifz kirin û hatiye nivîsîn. Di demên serî de, wextê ku wehî nazil di bû, Hz. Peyxember, izin neda ye ku ji bilî Qur'an'ê çi tiştên dî bêne nivîsîn û yên ku hatîne nivîsîn jî ji bona winda kirina wan ya ferman kirî.¹³²

Ji bilî vê jî wextê ku Bateyî, di Mewlûdname'ya xwe de, piştî ku hemd, şukr û sipasiyên xwe ji Xweda re pêşkêş dike, dibêje ku Xweda Qur'an'a Pîroz ji bona musulmanan wek mîras û mîrate ya kiriye diyarî û ev mijare jî weha ya vehonandî:

MÎNAK:

Ew Xwedayê malikê mulkê 'ezim

Daye me mîrasa Qur'an'a kerîm

(b.n.i.b. Beyt: 3)

¹²⁸ Tıraşçı, b.n.b.r. 179.

¹²⁹ Ahmet Özel, İslam Ansiklopedisi, Diyanet Vakfı, cilt29, Ankara, 2004, r. 475.

¹³⁰ Qur'an, 53/3-4.

¹³¹ Qur'an, 53/17.

¹³² *Mebâhis* Subhi, *Mebâhis fi 'ulûmi'l-Kur'ân*, Beyrut, Daru'l-ilm li'l-melayin, 1988, s. 20.

3.3.5.4. Hz. Pêxember û Sirrên Qur'an'ê

Qur'an'a ku ji bûy Hz. Muhemmed nazil bûy, wî ev wehye ya ji heval û hogirên xwe re parverkirî û bi qest û murada Xweda ve ji wan re bi awayek fesîh û timam teblîx dikir.

Bateyî, di Mewlûdneme'ya xwe de, di mijara "Merheba"yê de, di bêje ku Hz. Muhemmed di derheqê sirrên Qur'an'ê de xwedî wuqûfîyyet, îlm û zanîne ye. Û bi vê zanîna xwe ve di derbareyê sirra Qur'an'ê de jî, hem mifêsîr e, hem jî şîrovekerê wê ye û wê bi awayek fesîh beyan diket û weha di înte ziman:¹³³

MÎNAK:

Merhaba ey **sirrî Furqan** merhaba

Merhaba ey derdê derman merhaba

(b.n.i.b. Beyt: 287)

3.3.5.5. Nesîh û Mensûh

Meseleya "**nesh**"ê, ji layê Usula Tefsîr û Fiqhê ve meseleyek girîng e û liser vê meseleyê nîqaşên girîng jî yên hatîne kirin û çend berhemên musteqîl jî yê li ser vê mijarê hatîne nivîsîn.

Nesh, weha ya hatiye te'rîf kirin:

" Hûkmekî şer'î di demek paş de bi nazilbûna hûkmekî dî ê şer'î ve hatiye betalkirin û rakirin."¹³⁴

Bateyî, her dîsa bi vî rengî, di Mewlûdname'ya xwe de jî di bêje: Bi hatina Hz. Muhemmed ve, ew şer'îetên ku berî niha hatîn, yê hatîne rakirin û betal kirin. Di derbareyê vê xalê de weha dinivîse:

MÎNAK:

Wextê rabît Ehmedê 'alî 'elem

Nasixê Tewrat û Încîl û Senem

(b.n.i.b. Beyt: 136)

3.3.5.6. Ummeta Xêrtirînê Ummeta

Peyama Îlahî ya herî dawî Qur'an'a Pîroz, Misilmanan di nav hemû beşeriyetê de ummeta

¹³³ Tıraşçı, b.n.b.r. 176.

¹³⁴ Abdulkerim Zeydan (2002), *el-Medhal li dirâseti 'ş-Şerîati'l-İslâmiyye*, Beyrut: Muessesetu'r-Risale, 1423/ s. 95.

herî bi xêr di dete nasîn:

*"Hûn, ummeta herî bi xêrin ku ji bona qencîtiya mirovahiyê yê hafîne derêxistinê ; hûn qenciyê emr diken, ji nebaşîtyê men' diken û baweriyê bi Xweda dînin."*¹³⁵

*" Ew dê wê rojê ji qebrên xwe derkevîne meydanê. Qet çi tiştê wan ji Xweda naête veşartin. Îro hukimdarî ya kê ye? Bi tenê ya Xweda'yê Qehhar e."*¹³⁶

Bateyî, di beşa destpêka Mewlûdname'ya xwe de, piştî ku şukr û sipasiya ji Xweda diketin, behsê hindê dike kaca Xweda Misilman çawa kirîne ummeta xêrtirînê ummeta, weha divehonîtin:

MÎNAK:

Em kirîne **ummeta xeyru'l- beşer**

Tabî'ê Wî muqtedayê namiwer

(b.n.i.b. Beyt: 2)

3.3.5.7. Kamilbûyîna Dînê Îslamê

"Bixwîne! Bi navê Rebbê Xwe bixwîne!"¹³⁷ bi fermana Xweda ve ew wehya ku hêdî hêdî, dest bi nazilbûnê kirî, bi vê ayeta **" Min îroke ji bo we dînê we tamam kir û Min ni'meta Xwe li ser we tamam kir."**¹³⁸ ve jî, wehî ya bi dawî bûy û Xuda dînê Îslamê yê kamil kirî. Heqq, nîmetê Xweda'yî li ser batiliyê xalîp hat û Mekke jî ji Muşrîkan hate temîz kirin.¹³⁹

Bateyî, vê mijarê di berhema xwe da weha di nivîse û dide beyan kirinê:

MÎNAK:

Dînê me kir kamîl û ni'met tamam

Ye'nî da me Ehmed û dar-ûs selam

(b.n.i.b. Beyt: 4)

¹³⁵ Qur'an, 3/110.

¹³⁶ Nureddin Abdullah Beydavi, b. Omer, *Envâru't-Tenzîl ve Esrâru't-Te'vîl*, (Beyrut: Daru'l-Ma'rife, 1434/2013), s.54.

¹³⁷ Qur'an, 96/1.

¹³⁸ Qur'an, 5/3.

¹³⁹ Taberi, b.n.b. IV, 6/103.

3.3.5.8. Sirat-el Musteqîm (Rêya Rast û Durist)

Ev gotina "Sirat-el Musteqîm", tê wateya "Rêya Rastirîn û Duristtirîn." Li gor 'Elî b. Ebî Talib eve tê wateya Qur'an'ê, li gor Cabîr jî bi wateya Îslamîyet'ê ye.¹⁴⁰ Terkîba "Sirat-el Mustaqîm", di Qur'an'a Pîroz de, sî û sê (33)¹⁴¹ caran derbaz dibe.

Bateyî, hevoka إِهْدِنَا الصِّرَاطَ الْمُسْتَقِيمَ ya ku di Sûreyê Fatîhe'yê de derbaz dibît, îqtîbas diket û weha di vehonîtin:

MÎNAK:

Hîvîdar in em ji te Şahê Kerîm

Îhdîna ya Rebb **sirat-el-musteqîm**

(b.n.i.b. Beyt: 9)

Bateyî, di beyta jorî de ji Xweda yê xudan Kerem hîvî û du'a ya dike da ku me bikete di "Rêya Rast û Durist." de û her dem di wê rê de bigre û me ji wê dernexîne.

3.3.5.9. Alîkariya Xweda

Şerê Bedîr'ê, di Qur'an'ê de wek **Roja Furqanê**,¹⁴² yanî wek roja ku heq û batilî ji hev hatiye cudakirinê tê beyan kirin. Di Qur'an'ê de, alîkarî û qenciya ku Xweda Te'ala ji Misilmanan re kirî, bi çend wesîleyan ve ya danîye holê û fesîh kirî. Xweda di ayetekê de wehaferman dike:

*Ne weye ku ewên hewe kuşîn (di şerî de) ew, hewe nekuşîne, Xweda ewên kuşîn; wextê te havêtî jî, te nehavêt, Xweda (ew) havêt.*¹⁴³

Bateyî, ji ayeta jorîn îqtîbasekê dike û di Mewlûdname'ya xwe de mijarê weha divehonîtin:

MÎNAK:

Ma remeyte îzremeyte gûşîdar

Destê wî destê Xweda der kar û bar

(b.n.i.b. Beyt: 20)

¹⁴⁰ İbn, Ebu Muhammed Atiyye, Abdulhak b. Ğalîb el-Endulusî, *el-Muharreru'l-Vecîz*, (Beyrut: Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, 2. Baskî, 1428/2007), s. 74.

¹⁴¹ Atiyye, b.n.b.r. 79.

¹⁴² Qur'an, 8/41.

¹⁴³ Qur'an, 8/9-12, 26, 30, 42-44.

3.3.5.10. Hz. Adem û Hewwa

Meseleyên ku behsê wan di Qur'an'a Pîroz de derbaz bûyîn, yek jî meseleya Hz. Adem û Hewa yê ye, wextê ku ji cennetê hatîne derxistinê.

Bateyî, vê fermana ha ya ku di Sûreyê Beqereyê de derbasdibîtîn: *"Me got ku: Hûn hemî ji Beheştê werne xarê!"*¹⁴⁴ îqtîbas dike û vê mijarê di Mewlûdnameya xwe de weha di vehonîtîn:

MÎNAK:

İhbîtû mînha cemî'en hate emr

Adema dî bête ve lakîn bi sabr

(b.n.i.b. Beyt: 287)

Di Qur'an'a Pîroz de; Xweda di derheqê Hz. Adem û Hewwa'yê de weha kerem dike: *"Adem û Hevjîna wîgotin: Ey Rabbê me! Me zulim li xwe kir. Heker ku Tu me ne bexşînî û bi rehma xwe li gelme nekey, em dê di nava yên xwedî xusaret de cî girîn."*

Melayê Bateyî, vê mijara Adem û Hevjîna wî ya bêçaretî û belengaziya wan, di Mewlûdnameya xwe de weha di vehonîtîn:

MÎNAK:

Pir giri û xweş girî bê hed gelek

Newheyê îna zelemna çû felek

(b.n.i.b. Beyt: 111)

3.3.5.11. Şandina Rehmetê, Hz. Muhammed, Ji Bona Hemû 'Aleman

Qur'an, meseleya pêxembertiyê, wek mijarek cîhanşumûlî şîrove dike û wî bi cîhanşimûlî di de naskirn.¹⁴⁵ Xweda, weha kerem dike: *"Me Tu (Resûlê min), ji bona 'aleman, rehmet şandî."*¹⁴⁶

Ev ayeta di Sûreyê Enbîya yê de, derbaz dibe vê peyamê dide: Hz. Mehemmed ji tevahiya mirov û mirovahiyê, yê ji bo reşandina rehmetê hatiye şandin.¹⁴⁷

Bateyî, di dawiya Mewlûdname'ya xwe de, di derheqê mijara ku Hz. Muhammed ji hemû

¹⁴⁴ Qur'an, 8/17

¹⁴⁵ Fazlurrahman (1996), Ana Konularıyla Kur'an, Ankara: Ankara Okulu Yayınları, s. 147.

¹⁴⁶ Qur'an, 21/107.

¹⁴⁷ M.Sait Şimşek (2012), *Hayat Kaynağı Kur'an Tefsiri*, İstanbul: Beyan Yayınları, s.399.

'aleman re bi rehmet hatiye şandinê weha îqtîbasê diket û bi elbestkî di vehonîtin:

MÎNAK:

Merheba ey **rehmeten lîl 'alemîn**

Merheba ente şefî'ul muznibîn

(b.n.i.b. Beyt: 292)

3.3.5.12. Şeqqûl Qemer

Qur'an'a Pîroz mijara mu'cîze ya "**Şeqqû'l-Qemer**"ê weha tînîte ziman: "**Qiyamet nêzîk bû û heyv ker bû.**"¹⁴⁸

Bateyî, ji ayeta jorî îqtîbasê diket û di dawiya Mewlûdnameya xwe de vê mijarê weha divehonîtin:

MÎNAK:

Ehmeda çavê te ma zaxel beser

Yek îşareta te înceqqel qamer

(b.n.i.b. Beyt: 546)

3.4. Unsûrên Ziman

3.4.1. Girîngiya Ziman

Xweda bi erd û 'esman ve behsa ziman û rengan diketin.¹⁴⁹ Ev jî tê wê wateyê ku, cudabûna ziman û rengan jî bi qasî erd û 'esman bi qedr û qîmet in. Di hebûn û jiyana her miletekê de, ziman roleke sereke dilîze û tu tiştêkî bi qasî ziman ji bo miletekî girîng nîne. Man û nemana miletekî girêdayî zimanê wî ye, eger ziman wendabû, millet jî namîne. Ziman di navbera dîrok û nihe û pêşerojê de, wek pirekê ye û wan dem û dewranên ji hev cihê û dûr bihev dide girêdan.

Ji destpêka afirandina mirovan de, ku mirovê yekemîn Hz. Adem e, hetanî niha, du tiştan hebûna milletan ya parastî. Ew jî "**dîn û ziman**" e. Lewra çu millet bê ziman û dîn nikarin bijîn. Parastina dîn, ziman û millet ya bihev re girêdayî ye û yek bê yê din kêr di mîn e. Ew milletê ku li dîn û zimanê xwe xwedî dernekevît, di demeka kurt de, ji nirx û hêjayên xwe yê netewî dûr dikevît û dikevin bin bandora ziman û çanda milletên desthilatdar û xwe wenda dikin. Tiştê ku miletekî ji yê din cuda dike, çanda wî ye. Xîmê ku çand û wêje li ser tê avakirin, ziman û dîn e.

¹⁴⁸ Necdet Şengün(2008), "Hz. Fatîma Mevlîdî ve Vesîletü'n-Necat İle Mukayesesi"; *Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, s. 234

¹⁴⁹ Emîn Mutabçî (2009), "Quran di Helbestên Cizîrî de" *K.Roşinbîrî Newê*, J. Melsa Yayınları, s. 49.

Her miletek bi ziman û dînê xwe dilşad dibe û pê serbilind dibe. Çimkî di afirandina mirovan de, ev pêjn û hizir yê heyn û eve dayîneka Xwedayî ye. Li ser mijara ziman gelek pirtûk û nivîs yê hatîne nivîsîn û lêkolîn û vekolîn, her kesî çawa xwestibe wusa li mijarê yê nêhêrî.

Xweda Te'ala, erd û 'esman ji bona mirovan yê çêkirîn. Çawa erd û 'esman nîşanên qudreta Rebil Alemîn in, her wuha cudabûna reng û zimanê me jî ayetên Xweda ne.¹⁵⁰ Xweda Te'ala di Qur'ana pîroz de, di sûreyê Rom, ayeta 22an de waha ferman dike.

"Ji ayetên Xweda ye, afirandina erd û 'esman e, cudahiya ziman û rengê we. Bi rasî di van ayetan de ji bona kesên zana û aqilmend ders û 'îbret tejjîne."

Sunet û qanûna Xudaye ku gava behsa tiştê bike û bixwaze bal û dêna mexloqên xwe bikişîne ser, bi tiştên li ba mexloqan biqedir û qîmet ve behsa wî tiştî diket. Wek mînak, gava Xuda bi **"sitêrkan"** anji bi **"demê û wextî"** ve sond di xwe, bi sondê re dixweza mexloqên, li ser wî tiştî lêkolîn û vekolînan biken û da ku aqlê xwe bikarbîn û qedr û qîmeta wî tiştî bi heqî bizaninûbidenê.¹⁵¹

Îro di dunê de tiştê herî giranbuha, jîyan e û jîyaneka serfiraz û serkeftî ye ku bi serfirazî û azad bijîn û desthiladarîya ser erdê bi dest bêxin. Şer û cengên hetanî niha çêbûne, gişt ji bona mal û milkê ser erd û bin erd yê çêbûyn. Ji wê jî zêdetir, li ser erd û bin erdî de, bi milyonan nîmetên Rebbil 'Alîmîn yê heyn. Li gora rêbazên Îlahî, nîmet ew tişt e ku Rebbil 'Alemîn qencî û xêr û xweşî bi mexloqên xwe re kirîye. Li hemberî van qenciyên Rebbil 'Alemîn, wezîfa me mexloqan ew e ku em ji Xweda re hemd bikin û pesn û sipasîyan layîqê Rebbil 'Alemîn bibînin. Her wiha mirov dikare xêr û bereketa 'esman jî li gora erdî qîyas biketin. Xweda bi erd û 'esman ve behsa ziman û rengê me ya kirî û ev jî tê wê wateyê ku, cudabûna ziman û rengên me jî bi qasî erd û 'esmanan bi qedr û qîmet e. Hemû zimanan sifetên Xweda yê axaftinê ne û yek ji yê din zêdetir û muhtebertir nîne. Divê her bawermendek li hemberî xêr û xweşîya ku Rebbê wî pê re kirîye şukurdar be û hemda Xwedayê xwe biketin.

3.4.2. Bandora Mewlûdê Liser Ziman

Hemû ziman di bin bandora dînî de ava dibin û bi pêşve diçin. Bi taybetî, çanda îslamê,

¹⁵⁰ Qur'an, 3/85

¹⁵¹ Bilgin, b.n.b. r. 89.

ya dibin bandora gotina Xuda, Qur'na Pîroz de may û li gor hindê ya pêkhatî û xwe parastî. Qur'an tenê ne ku li ser çandê bandorê diketin, bandora "**Çanda Îslam**"ê ya li ser hemî nîrx û unsûrên çandê hatiye kirin. Bi taybetî jî bandorek giran ya li ser ziman kirî û ziman yê li gora tesewir û bîr û baweriya xwe li gor eqîde û felsefeya xwe bi awayek bingehîn ve saz kirî û li ser gramer û rêzimana ziman xîmên bingehîn yên havêtî.¹⁵²

Dînê Îslamê bi eqîde û tesewira Îlahî ve, bandoreke bê hempa ya li ser hemû zimanên netewên musulman kirî. Ji ber ku netewê Kurd jî xwedî baweriyek sîstemek Îlahî ye, zimanê Kurdî jî para xwe ya ji saz kirina "**Çanda Dînê Îslam**"ê wergirtî. Ji ber vê bandora dînî, di bingehê tesewura jiyanê de bandorek hêja ya li ser çanda nivîskî û devkî jî hatiye kirin û bi vî awayî ve jî; ji çanda civakî heta çanda zanyarî, kirinên bingehîn yên li ser îlmê jiyanê kirîn.¹⁵³

Ji ber taybetiya "**Çanda Dînê Îslam**"ê, kar û xebatên li ser ziman, bandorek û giranahiyek bingehîn ya li ser çandê kirî û ferqîyek bi taybet ya li ser pêşveçûna ziman kirî. Ji ber ku dînê Îlahî **Îslam**, tam bête fam kirin û têgeheştinê; Îlm û zanyariyên li ser tefsîrê, fiqhê, hedîs û kelimê ê bi awayek îlmî û zanyarî yên hatîne mutalekirin. Ji bûna ku îlmê nehyê û geramer û rêzimanî tam bête fam kirin û esasên dînê îslamê bêne zanînê; bisporî û pêşveçûna di van îlman de wek şertekê bingehîn yê hatiye dîtin û qebûl kirin. Çimkî, gelek peyvên Qur'an'ê, di êne gele wateyan. Ev peyvên gelek wate, ku bêne fam kirinê, li bona vê yekê gele kar û xebatên bingehîn yê li ser ziman hatîne kirin. Ji ber van sedeman Îlmê gramer û rêzimanê yê di bin bandora "**Çanda Dînê Îslam**"ê de pêkhatî û bi pêşveçûyê. Pêşveçûna di warê ziman de, te'sîr û bandorek mezin ya li ser çand û edebiyata milletên misilman jî kirî.

3.4.3. Di Kurmancî De Cotepeyv

Di zimanan de hin bêje hene ku ji bo vegotinê bihêztir bikin û wateya îfadeyê xurt bikin bi bêjeyên wekî xwe, nêzî xwe yan jî dijberî xwe re tînin bikaranîn.¹⁵⁴ Bêjeyên ku gava bi hev re hatin bikaranîn destekê didin hev û wateya îfadeyê xurt dîkin.

¹⁵² Ahmet Yıldırım (2009), Tasavvufun Temel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, s. 277.

¹⁵³ M. Zahir Ertekin (2015), AÇAR, Zafer, "Di Kurmancî De Cotepeyv û Cureyên Wan," Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak, s. 82

¹⁵⁴ Ertekin, b.n.b. r. 79.

MÎNAK:

"Mal û milk", "dar û ber", "kul û derd", "cil û berg", "rast-best"...

Dîsa bêjeyên hevedudanî jî yê heyn.

MÎNAK:

"serobino", "nanoziko", "kelogirî", "helhehok", "kelekel" û hwd.

Di kurmancî de ji van bêjeyan re cotepeyv tê gotin. Zimanê Kurdî, zevyeke beyar e zahf kêr xebat ya li ser hatiye kirin. Ev yeke xezîneyeke gelek dewlemende ji bo lêkolîneran. Di Kurdî de eve mijareke girîng e, ku di gotin û nivîsê de ji bo xurtkirina wateyê tê bikaranîn.

Ev mijare, di nivîsê de bêtir û bi baldarî ya hatiye bikaranîn. "Cotepeyv"; di Kurmancî de, hem di axaftinê de hem jî di nivîsandinê de bi berfirehî tên bikaranîn.¹⁵⁵

Pêkhatina Cotepeyvan:

Cotepeyv, dikarin ji bêjeyên hemwate, diwate, nêzwate ve lî pêk werin, herwiha dikarin bi alîkariya gihanek û navbendan bikevin şiklên nû an jî carna di navbera herdu bêjeyan de bi xêzekî jî ev bêje bîn bikaranîn û vegotinê bitesîr bikin.

Di kurmancî de cureyên cotepeyvan ji aliyê wateyê û ji aliyê şiklê ve dibin du bir û her bîrek di nav xwe de dibe çend cure.

3.4.5. Di Mewlûdê De Cotepeyv û Bandora Wan Liser Zimanê Kurdî

Di Mewlûdê de Melayê Bateyî di gelek ciyan de cotepeyv yê bikaranîn û bandorek girîng ya liser zimanê Kurdî kirî.

MÎNAK:

'Erş û kursî, rast û çep, eqd û best, tirs û lez, kul û derd, lez û bez, erd û ezman, dê û bab, 'ezman û dev, pêş û paş, dest û pê, mar û mor, dem bi dem, xal û xet, sûc û xeta, îhsan û xufran, bert û bad, an û hîn, bdîde û bînahî, pişt û 'ewn, penah û pişt, ruh û rewan, rîkn û meqam, kêr û

¹⁵⁵ Ertekin, b.n.b. r. 89.

bâr, nîsyan û 'emd, keramet û eser, cerge bez, erş û ferş, elf û çihar, bîst û elf, xas û cudâ, ins û cin, sed hezar, dû ker, çarî çîz, 'erş û kursî, zûl-celal, ba cud û kerem, ta bi ferş, ney tû ney, dem bi dem, redd û ferd, cennetî û asîyan, pêş û kem, hûsn û beha, zemîn û asîman, berr û behr, şerq û xerb, av û herî, saf bi saf, seyîd û serwer, dar û nebat, dest û pa, may û mat, bê hed gelek, qebûl û her qebûl, xerab û facîre, bîst û yek, rast û dûrîst, taze 'eyş, pâk û saf, da û bab, ay û way, tewrat û încil, hem sûal, hem cewab, way û weyl, zûr û îftira, nâz û delal, mah û sal, şikl û sîma, nazik û ranâ, mehbûb û şîrîn, roz û şeb, in û an, dû şeq , sî û seywan, çespân û çapûk, belg û xûsan, best û ehd, sund û best, ax û milk, şev û rûz, refde gurg, nû cîwan, tar û mar, sir û hal, pak û masûm, nûr û tab, çapûk û çespan, nazik û sîma, qad û qamet, nazik nîhal, kar û bar, zâd û te'am, zend û baz, 'eqd û best, bûk û zava, hesret û kerb, hûr û xîlman, hemd û sena, semawat û zemîn, asîman û erdê, behr û ber, Lat û 'Uzza, av û rû, cîhan û millat, tedbîr û ray, ay û way, şah û hakim, kîtab û defter, nîşan û sened, hud û hem, temr û te'am, bîst û pênc, ruh û rewan, ax û hesret, dar û ber, av û ronîk, dê û bab, şeb rûşen, awaz û hem, mêr û jin, tirs û lerz, bejn û bal, ser û sîma, rast û çep, pişt û pêş, husn û melahat, tesbîh û deng, reng û reng, rast û çep, meşriq û mexrib, semawat û zemîn, hur û wîldan, kar û bar, fewce fewc, mewce mewc, sidq û sefa, cûmle zeret, derdê derman, işşaqî saqî, alî siltan, şemsê taban, canî canan, qurret-ûl aynî, mahê tab, nurî xurş, behr û ber, reng û reng, misîn û teşt, ne't û sifat, rast û çep, xewf û tirs, tirs û xewf, ban û beyt, ibriq û legen, misk û gulav, sefa û merwe, dar û ber, tirs û lerz, çeng û bal, mêr û jin, şêrîn û şekir, sê çar, têr û tijî, leng û lûk, tîz û xweş, tişt û mal, sebr û sukûn, can û dil, koh û deşt, rizq û ni'met, dextl û dan, ga û pez, dest û pê, sû bi sû, mah û meh, rûh û can, aş û zad, can û dil, dar û ber, bêkar û bar, mêr û jin, wey li min!, xas û 'am, der dest, nerm û nazik, qelb û ceger , ker kerî, girîn û şîn, şîn û ah, can û pak, 'enber û misk, misk û gulav, pak û temîz, bejn û bal, 'erş û ferş, peya pey.

3.4.6. Bandora Zimanên 'Erebî û Farisî Liser Zimanê Kurdî

Bateyi, Şa'ir û Hunermendekî pir zimanî ye. Bateyî, çar zimanan di zanîn; Zimanê Kurdî, Zimanê 'Erebî, Zimanê Farisî û Zimanê Tirkî. Bateyî, bi van her çar zimanan ve yê peyîvî, nivîsî û berhema xwe Mewlûd ya bi zimanê Kurdî nivîsî lê belê gelek peyv, hevok, qalib û terkîbêt 'Erebî û Farisî yê têda nivîsîn û li gor rêzimana Kurdî bi cî kirîn û kirîne malê zimanê Kurdî û Kurdî ya pê dewlemend kirî.. Bateyî, çu berhem bi zimanê Tirkî ne nivîsîne, lê belê di nav helbestên xwe de peyvên zimanê Tirkî jî yê bi karanîn û ew peyv jî bi ostayî li gor rêzimana Kurdî yê kirîne malê Kurdî.

Her zimanek milletek e û her milletek jî çandek e. Bateyî xwedan çar zimanan e, û xudan çar çandên bingehîn e. Di warê dewlemendiya ziman û edebî de, her ziman û çand, bandoreke mazin li ser şexsîyeta hunermend û şa'îran dikan. Hunermendê hêja Bateyî jî yê di bin vê bandora edebî de may. Bateyî, hunermendek Kurd e. Ziman û çanda wî Kurdî ye. Lê Bateyî yê di bin bandor û te'sîra ziman û çanda 'Erebî û Farisî de may û hişmendî û tesewira wî ya edebî û çandî ya bi van ziman û çandan ve xwemilî û dewlemend bûy. Çumkî her lîsanek, însanek e. Ji ver vê taybetiya lîsanî, her lîsanek jî amûrekî ragihandinq çandekê ye û bî vê rêkeve jî, ziman bandora çandê jî li ser hunermendî diket.

Çan û ziman her du pêkve di girêdayîne. Çand bûy ziman naête ragihandin û millet û şexs jê îstîfade naken. Lê ziman jî bêy çand na xwemilîtin û bi pêş ve naçîtin. Hke çandek nebît, ziman jî naête xwemlîn û di demek kîn de ew ziman ji holê radibîtin. Çumkî jîngêhê ziman, çand bi xwe ye. Ji ver vê taybetiya ziman û çandê; yê ku di bin bandora çandê de bimînît, di bin bandora zimanê wê çandê de jî dimînît û yê di bin bandora zimanekê de jî dimînîtin di bin bandora çanda wî zimanê de jî dimînîtin. Ev yeke esasek e bingehîn e. Hextê ku bandora ziman û çandên cuda li ser şexsîyeta helbestvan-hunermendî çêbê, wê gavê ev bandore li ser ziman, çand û edebiyata hunermendî jî çêdibîtin. Bateyî yê di bin bandora çand û zimanê 'Erebî û Farisî de may û yê jî çand, ziman û edebiyata Farisî û 'Erebî îstîfade kirî. Çumkî yê di bin te'sîra van zimanan de may. Ji ber ku zimanê 'Erebî wê demê zimanê zanyarî û dînî bû gelekî bi qedr û qîmet bû. Bateyî jî, 'Alimek Îslamê û mirovek dîndar bû. Ji ber van xusûsiyetan jî Bateyî, ziman û edebiyata 'Erebî ya xwandî û di wî zimanê de mahir û melevan bûy. Zimanê Farisî jî di dema Bateyî de zimanek Edebiyatê bê. Hemu şa'îr û hunermandan helbestên xwe yên hêja yên bi zimanê Farisî jî vehonandîn. Ji ber ku Bateyî jî hunermend û şa'îr bû, wî jî zimanê Farisî hîn bû û helbestên xwe, yê bi Farisî jî vehonandîn û ji dewlemendiya Zimanê Farisî jî îstîfade kirî û di bin bandora wî de jî Helbest û berhemên pe yêt nivîsîn..

Wextê ku Bateyî bi awayê edebî ve, di bin bandora zimanê 'Erebî û Farisî de mayî û helbestê û nivîsên xwe bi zimanê Kurdî nivîsîn, dewlemendiya zimanê 'Erebî û Farisî bandorek hêja ya li ser zimanê wî hatiye kirin.. Bateyî Mewlûd ya bi zimanê Kurdî nivîsî. Ji ber ku Mewlûd mijarek dînî ye û zimanê dînî jî 'Erebî ye. Bi vê taybetmendiye ve, ziman û çanda 'Erebî bi rêya dînî ve bandorê li ser ziman û edebiyata Kurdî diketin û bi vî awayî ve jî bandorê li ser ziman û edebiyata hunermendî jî diketin. Wextê ku bandor li ser zimanê Şa'îr hate kirin; wê demê Şa'îr di

helbestên xwe de peyv, hevok, terkîp û qalibên wan zimanan jî di helbestên xwe de bi kartînî û bi vî awayî ve ji dewlemendiya wan zimanan jî îstîfade diket û bi vî awayî ve jî bandorek erênî li ser Ziman û Edebiyata Kurdî çêdibe û ziman û Edebiyata Kurdî pê dewlemendtir dibe. Naverok û mijara Mewlûda Bateyî, Pêxemberê herî dawî Hz. Muhemmed e. Ji ber vê yekê jî mijara Mewlûdê hemû dibête mijara Dînê Îslamê. Dînê Îslamê yê bi rêka Qur'an'a Pîroz ve hatî û li hemû cîhanê yê belave bûy. Ji ber ku Qur'an jî ya bi zimanê 'Erebî hatiye nivîsîn û zimanê dînî jî 'Erebî ye, berhema Bateyî Mewlûd jî bi hemû lewn û şeklên xwe ve ya di bin bandora ziman û çand û edebiyata 'Erebî da may.

Di cîhana edebiyata Klasîk de, zimanê Farisî zimanê edebiyatê bû. Ji ber ku zimanê Farisî jî zimanê wê demê yê edebî bû, Mewlûd bi taybetiya xwe ya edebî ve ya di bin bandora Zimanê Farisî de may. Bateyî bi rêka vê Mewlûdê ve, gelek peyv û hevokên zimanê Farisî jî yê di nav Mewlûdê de bikar anîn û ev peyv û hevok li gor rêziman û çanda edebiyata Kurdî, yê kirîne malê Zimanê û Edebiyata Kurdî.

3.4.6.1. Bandora Zimanê 'Erebî

Di Mewlûda Mela Huseynê Bateyî de bandora 'Erebî zehf e.¹⁵⁶ Helbestvanî; peyv, terkîb û hevokên erebî zehf yê bi karanîn. Carinan riste bitevahî, bi 'Erebî ne û carna jî piraniya beytan bi 'Erebî ne. Em dê li jêr çend mînak li ser vê babetê deyn.

3.4.6.1.1. Beytên Xwerû 'Erebî

MÎNAK:

Sellî ya Rebbî 'ela xeyr-ul wera

Ma tesîr-ul Şems û fîsseb'îl 'ula

(b.n.i.b. Beyt:18)

Bi van beytan ve diyareye ku Bateyî gelek yê di bin bandor û te'sîra zimanê 'Erebî de may. Ev her du beyte bi xwerû, yê bi zimanê 'Erebî ve hatîne vehonandin û di berhema wî ya ku bi zimanê Kurdî ve hatiye vehonandin.

¹⁵⁶ Jiyan, b.n.b.r. 123.

3.4.6.1.2. Peyvên 'Erebî

Bateyî di Mewlûdê de gelek peyvên 'Erebî yên bikaranîn û ji ziman û edebiyata 'Erebî îstîfade kirî û bi vî awayî ve jî bandora 'Erebî ya li ser ziman û edebiyat û çanda Kurdî kirî û zimanê Kurdî yê ji vê bandorê jî îstîfade kirî û pê dewlemendtir lê hatî.

MÎNAK:

Adem, 'alîneseb, bedî, beqer, beyza, bînt, cebhe, cedd, cema, cemîl, damîe, 'edawet, enwer, erbe'ûn, 'esel, e'lab, eswed, 'eta, fuzûn, xufuran, xeza, îna, îrtîha, îstebreq, îxwan, kebîr, kewakib, le'în, lîqa, lu'b, luxet, mexrîb, mehd, melîh, menbe', muncelî, mun'ekîs, mûn qelîb, munqesîm, muntezîr, mûqîn, murîd'e, murte'îb, muştemîl, muxalîf, muxtefî, muxteser, muzalel, muznîb, nasix, tewekkelna, tewîl, teyyîb, tîfl, 'uşşaq, 'uyûb, waşîl, waşîq, wedûd, wehdet, weheb, weqiye, xamis, ezel, seqf, sema, hukm, erş, kursî, alem, lutf, hey, ferd, hemd, sena, yed, refîq, şerîk, dehr, wekîl, delîl, lewn, ferz, rûh, dewa, cins, missal, ehmeq, tîn, defter, cesed, zat, qedîm, sebî, rizq, xerîb, hebîb, tebîb, qewm, sir, nedîm, şewq, zenb, şems, meden, sidq, cûd, behr, kerem, nesîb, reb, newm, yed, yesar, yexsîr, yûmn, zail, zamîne, zebîh, zed, zeheb û zîba.

3.4.6.1.3. Terkîb û Hevokên 'Erebî

Terkîb û Hevok:

Wate:

'En Ḥabîbîl-'Îzzetî	: Ji rumeta yê hezkirî, ji rumeta dost û yar.a
Burhanul-Huda	: Delîlê Xwedê
Haşelîllah	: Xwedê neke, çu caran
Fî sebîlîllah	: Di rêya Xwedê de.
Înşeqel-qemer	: Heyva ku bûye du şeq
Ma zaxe l-beser	: Nerîna ku şaş nebûy
Tehte-ssera	: Di bin 'erdî, bin'erd
Turfet'ul 'eynê Xelîl	: Tiştên ku mirov bi çavan pê şaş dibe.
Temmel kalam	: Gotin temam bû. Gotina timam
Wesselam	: Evqas, ji vir û pê de xweşî, silav û aşitî.
Wellahîl 'Ezîm	: Bi navê Xwedayê mezin kem

Ca'ena Eħmed Resûllullah : Ehmed Resullullah, ji me re hat.

Ey Muħemmed sellemallahû 'eleyk : Ey Muhemmed silava Xwedê li ser te.

Îbşîrî ya Amîne bi'l-Muħsefa : Ya Amîne tu bi Mustefa bimizgin be.

Kûnî Ĥebîbî Eħmeda : Hezkiriyê min Ehmed, ji min re çêbû

We 'eleyke es-selam û reħmetî : Ê reħmet û silav li ser te bin.

Tewekkelna : Me tewekkul kir, me xwe siparte Xwedê

Ummetun muznîbetun, Rabbun Xefûr: Umet gunehkar e, Rebbê te xwedî efûkirinê ye.

Ma yemûcul-'aşiqûne fi's-subul: Ya Rebbî hindî ku ew aşiq di rêya wî de bimeşin, tu alîkariya mohra Resûlan, Resûlê dawî Hz. Muhemmed (sxl.) bike.

Ma tesîrûş-şemsu fi's-seb'il-'ula: Ya Rebbî alîkariya xêrtirînê muteqiyân, zarokê buçûk, Hz. Muhemmed (sxl.) bike, da ku zerera tavê nede tê.

Sellî ya Rebbî 'ela Xeyrîl Beşer: Ya Rebbî alîkariya xêrtirînê beşeran, Hz. Muhemmed (sxl.) bike.

3.4.6.2. Bandora Zimanê Farisî

Bi qasî bandora Zimanê 'Erebî nebe jî bandora Zimanê Farisî jî ya li ser ziman û pênuşê Bateyî û berhema wî Mewlûdê ya çêbûy. Ev bandor bitir ya di sernivîs û peyv û daçekan de xuya dike. Ji xeynî nusxeya Diyarbekirê sernivîsên hemû nusxeyan bi Zimanê Farisî ne. Ew qas peyv û terkîbên 'Erebî di Mewlûdê de heyn, lê sernivîsên babetên Mewlûdê exleb bi Zimanê Farisî yê hatîne nivîsîn. Sernivîs ne bi Zimanê Kurdî û ne jî bi Zimanê 'Erebî ne. Evejî xusûsiyeteke û xalek girîn û balkêş e.¹⁵⁷

Bateyi, ji xeynî sernivîsên Mewlûdê, hem di Mewlûd'ê de hem jî di berhemên xwe yê di de, gelek peyvên Farisî yê bikar anîn û ew feyv jî bi ostayî li gor rêzimanê Kurdî yê yê nivîsîn û kirîne malê zimanê Kurdî û Kurdî ya pê dewlemedtir kirî.

3.4.6.2.1. Peyvên Farisî

MÎNAK:

Afîtab, aşîna, awaz, bîş, came, damen, dehen, dîde, dîger, fem, hemnişîn, koh, laxer,

¹⁵⁷ Ziver, b.n.b.r. 123.

mader, mahîtab, merg, nagehan, nam, nehed, nîm, peder, pedîd, roz, şîr, tîzî, xend, xer, zûd, xab, nîgarende, nimanende, bexşinde, xûb, siyah, noşmende, çirax, perwane, ustad, baxban, merd, darinde, sazende, lewleb, keywan, enguşter, derkûş, dîger, merg, Xwedawend, spihr, gazinde, şermende, ateşgûdaz, nemaz, pertew, şikuft, bax, firyad, zeban, rehber, mehderçe, niqabpoş, mehder, lebxemûş, xah, xedeng, rehnima, şermende, berguzar, şah, şahebax, xemkuser, ateş, şehriyar, subh, dîwane, badenoş, mîxwahî, fixan, goş, guhar, bîmar, yelda, deycûr, çeşm, xûbrû, ayîne, hemçû, duxan, xwedeng, şebistan, çengil, mest, afitab, perwaz, ejdîha, cilwe, tûle, firyadres.

3.4.6.2.2. Daçeka "ez" a Farsî

Bateyî, jî xeynî peyvên Farisî, daçekên "ez" û "der" a Farisî jî gelek caran ya bi karanî. Daçeka "ez" a Farisî, ya bi wateya "ji" ya Kurdî bikaranî. Daçeka "der" a Farisî jî ya bi wateya daçeka "li" ya Kurdî bi karanî.¹⁵⁸

MÎNAK:

Her çi dara hişk e, ez biçme binî

Bû heşîn û kat e, "ez" pelgan xenî

(b.n.i.b. *Bejt: 156*)

3.4.6.2.3. Daçeka "der" a Farsî

MÎNAK

"Der" di nûra te, ziyayê mihr û mah

Lê me'elhi'l-Celîlê barigah

(b.n.i.b. *Be*)

¹⁵⁸ Othman, b.n.b. r.79.

BEŞA SÊYEM

1. METNÊ MEWLÛDA MELA HUSEYNÊ BATEYÎ

BEŞA YEKEMÎN:

HEMD Û SENA JI BO XWEDA

Bîsmîllahîrehmanîrrehîm

1. Hemdê bê hed bo Xwedayê 'alemîn
Ew Xwedayê daye me dînê mubîn
2. Em kirine ummeta xeyr-ûl beşer
Tabî'ê wî muqtedayê namuwer
3. Ew xwedayê malikê mûlkê azîm
Daye me mîrasa Qur'anâ kerîm
4. Dînê me kir kamîl û ni'met tamam
Ye'nî da me Ehmed û dar-ûs selam
5. Ew Xwedayê bê nezîr û zûlcelal
Bê mîsal û bê heval û bê zewal
6. Raziqê bê dest û pa û mar û mûr
'Alîmê sirra ne gotî der sudûr

7. Karîsazê bende û sultannî can
Rahîm û rehman latîf û mîhrîban

8. Asîmanê bê sitûn Wî kir bedîd
Sûretê bê xal û xet wî aferîd

9. Hîwîdarin em ji te şahê kerîm
Îhdîna ya Reb sîrat-el mûsteqîm

10. Nê ji me sûc û xeta tên û sîtem
Nê ji te îhsan û xufran û kerem

11. Ya Rebb îmanê di xwazin em mûdam
Jêrî alâya Muhemmed wes-selam

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat

BEŞA DUYEMÎN:

METH, SELAT Ê SELAM JI BO PÊXEMBERÎ

12. Bert û bada her zaman û an û hîn
Ey Muhemmed sed hezaran aferîn

13. Ey şefî'ê darûyê her 'illetê
Dîde û bînahîya vê ummetê

14. Deste gîr û mistaxasê herdû kewn
Bû gunehkaran penah û pişt û 'ewn

15. Sellî ya Rebbî ela xeyr-ûl beşer
Ta hebin teyr û bi xwûnin ber secer
16. Ew hebîbê rohaniya heft asîman
Her dû 'alem qalib ew rûh û rewan
17. Xakî payê Ehmed ew beyt-ûl heram
Lew şerîfîn zem zem û rikn û meqam
18. Sellî ya Rebbî 'ela xeyr-ûl wara
Ma teşîr-ûş-şems û fis-seb'il -'ula
19. Fexrê Îbrahîm û Îsmâil û Nûh
Mustefa yê ba wefa yê ba fitûh
20. Ma remeyte îzremeyte gûşîdâr
Destê wî destê Xweda der kâr û bâr
21. Sellî ya Rebbî 'ela xetm-ir rusûl
Ma yemûc-ûl aşîqûne fis-sibûl
22. Ew kelîmê xweş newayê çerxî tûr
Daxîdarîn bo wî sîmayê bi nûr
23. Ey şefî'ê sahibê alayê hemd
Min hene bê hed guneh nîsyan û 'emd
24. Lê me hîvî wasîqe dê ez feqîr
Jêrî alâya te bim roja êsîr

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA SÊYEMÎN:

XÊRA XWENDINA MEWLÛDÊ

25. Her kesê gûhdarê Mewlûd'a Nebî
Dergehê mîzgîniyan dê lê vebî
26. Gotî wî Peyxamber'ê 'alî sifet:
Mewlûd'a min her kesê mazin biket
27. Ez şefî'ê wî me roja mehşerê
Dê vexwût ew tasek ava kewserê
28. Serfî Mewlûd'a me yek dîrhem fere
Hemberê yek kohê zêrê ehmere
29. Fî sebilîllah bi bexşê ber feqîr
Qedrê Mewlûd'ê bizanin hûn kebîr
30. Hem ji bo Bekr û Omer hat ev xeber
Hem ji Osman û 'Elî çêbûn eser
31. Dîrhemek bît serfê Mewlûd'a Nebî
Xeyrekî mazin ji bo hasil dibî
32. Hem ji şêxan bû rîwayet ev xeber
Şêxê Kerxî Fexrê Razî bâ dîger
33. Her kesê hadir biket ew yek te'am
Bâ bixûr û şerbet û qedrek tamam

34. Gazî ket îxwan û hîlbîtin çira
Bête xwendin Mewlûd'a Xeyr-il Wera
35. Tête heşrê ew digel xelqê berê
Ye'nî ba Peyxamberanê Enwerê
36. Her çî bînît hindî tiştê xwarinê
Dê mubarek bît li ber vê xwandinê
37. Bête xwendin ger li yek sikke dirav
Dê mubarek bit dirahîm bêne **zav**
38. Bête xwendin ger li avê ê vexût
Rehmî nazil cûmle yê îllet dibit
39. Her cihê lê bête xwendin rehme lê
Dê melek bêne tijî wê menzelê
40. Xanîyê lê bête xwendin ev selâ
Dê bibîte ba'isê def'a belâ
41. Bo xwûdanê zadî û bo hem nişîn
Her selatan dê bidin kerrûbiyîn
42. Dafî'ê cûmle hesûdê çav xerab
Der mezarê sehle lê redda cewab
43. Pir kesan dîtin keramat û eser
J' xwendina **Mewlûda Sultanê Beşer**
44. Her wekî hatiye gotin bê hîsab
Lê neşîm bêjim ji tetwîla Kîtab

45. Qedrê **Mewlûd'**ê nizanîm bêjim ez
Lök hişyarbin da nebîte cerge bez

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat

BEŞA ÇAREMÎN:

XULIQANDINA NÛRHA PÊXEMBER

46. Girtî yek qebze ji nûra xwe Xweda
Gotî wê: "kûnî hebîbê Ehmeda"

47. Hêj ne erş û fers û kûrsî yû qelem
Hêj ne lewh û **Enbîyayê Muhteşem**

48. Saliha tesbîhî kir nûra şikerf
Şeş mîet elf û çihar û bîst û elf

49. Paşî bo wî çêkirin duwazdeh hîcab
Her yekî xweştir ji yadî der hîsap

50. Qudret û te'zîm û mînnet merhemet
Hem se'âdet hem keramet menzîlet

51. Hem hîdayet hem nûbuwet rif'ete
Ta'ete yazdeh şefa'et temmete

52. Her yekî westabû tê de çendî Sal
Lê 'edet me spare ilmê lâyezal

53. Her yekî tesbîhekî xas û cudâ
Daîmâ tesbîhî xwendin bo xwedâ
54. Paşî avête çihar behrê mezin
Wî xwedayê lâyezalê îns û cin
55. Behrê nûsret sanî behrê merhemet
Behrê qûdret behrê 'irfan îns hemet
56. Çûn ji behrê me'rîfet ew hate der
Qetre jê werya bi îlham ev qeder
57. Sed hezar û hem çihar û bîst û elf
Her yekî bû yek **Nebî'**yê dil şikerf
58. Paşî wî çêkir ji nûra **Nâmûwer**
Cewherek lê kir nezer ew bû du ker
59. Nîsfê ewwel dayî çavê heybetê
Nîsfê sanî dayî çavê şefqetê
60. Nîsfê ewwel bûye behr û her livî
Nê ji tirs û heybetê qet na nivî
61. Hem kelî ew behr û kef da û dûxan
Kef buye erd û hem dûxan bû asîman
62. Nîveka dî çêkirin jê çarî çîz
'Erş û kursî û qelem lewhê temîz
63. Hate emrê padîşahê lâyezal
Malîk-ûl mulkê celîlê zul-celal

64. Ya qelem binvîs bi emrê padîşah

Ez çi binvîsim bi ferman ya îlah

65. Qale uktûb lâ îlah illâ ene

Hem Muhemmed qasidê emrê mine

66. Sacîd û bêheş girî sed salî dî

Ser hilîna got: Îlahî seyyîdî

67. Ez dizanim lâ îlâh illâ tu yî

Ew Muhemmed hemberî îsmek bûyî

68. Kîjke ya sultanê ba cûd û kerem

Padîşahê sermedê got: "Ya qelem!

69. Ger nebûya ew Muhemmed lewh û erş

Min ne tînane wucûdê ta bi ferş"

70. Ney tû yî ney cennet û narê mezin

Cûmle eşya min ji bo wî çêkirin

71. Mûhbetê hingavt û şeq bû ew qelem

Ma li ser lewhê nivîsî dem bi dem

72. Serxwoş û sekranê wî navê şîrîn

Paşî ba îlhama Rebb-îl 'alemîn

73. Gotî ewwel: Ya Muhemmed es-selam

Hem eleyke gotî Rebbê lâyenam

74. Da cewaben an hebîbê 'izzetê
We eleyke es-selam û rehmetê
75. Bûye sûnnet lew selam û redd û ferz
Cûmle ehwal paşî hingî kirne erz
76. Wî nivîsî pêkve ummet qencîkâr
Cennetî û 'asiyan dê biçne nâr
77. Ummeta Ehmed nivîsî ehlê nûr
Ummet-ûn mûnzîbet-ûn Rebb-un xefûr
78. Cûmleyê ehwalê alem pîş û kem
Wî nivîsî bûrî û hişk bû qelem
- Ger divêtin hûn ji narê bin necat**
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat

BEŞA PÊNCÊMÎN:

XULQIYETA HZ. ADEM PÊXEMBER

79. Çûn îradet hate sultanê refî'
Çêketin Adem bi vî şeklê bedî'
80. Emrî hate goşê Cibrîl'ê emîn
Qebze yê bîne ji beyda yê zemîn
81. Ew dilê erdî û hem hûsn û beha
Zîneta meknûn û dûrra bê **beha**

82. Hatî Cebraîl û ba emrê letîf
Çengekî axê ji wê qebrê şerîf
83. Girt û ba tesnîm û safî kir hevîr
Têkveda heta ku ew qenc bû xemîr
84. Bu wekî dûrra sipî wê sa'etê
Xewte da der cûyîbarê cennetê
85. Emrê Cebraîl'î kir paşê çûnan
Wî bi gêre der zemîn û asîman
86. Berr û behr û şerq û xerbê 'alem ê
Hate gêran hêj ne behsa Adem ê
87. Nê hezaran salê çûne axerî
Ew Nebî bû Adem hêj av û herî
88. Paşî hingî xaliqê her sûretê
Çêkirî Adem bi destê qudretê
89. Pif kirî rûha xwe ew bû nazenîn
Lew melek hatin ji bo wî sacidîn
90. Bû xezîne ew ji bo durra yetîm
Daniye pişta wî ew nûra 'ezîm
91. Paşî bir avête baxê cennetê
Xeyrî darê jê bixwe her nî'metê
92. Saf bi saf westane pişta wî melek
Nazirê nûra Muhammed ew melek

93. Gotî Adem: "Ew melaîk bo çî her
Wî li pişta min dîkin daîm nezer?"
94. Rabbê alem gote Adem: "Ey mulî
Tu ji bo nûra Muhemmed hamilî
95. Ew hebîbê min di pişta te zûhûr
Lew melek têne temaşeyê ji dûr"
96. Gotî Adem: "Ey Xwedawendê felek
Min divêtin bêne pêş min ew melek"
97. Hem bi fermanâ Xweda wê sa'etê
Nûr ji piştê hate nîva cebhetê
98. Hin di bêjin hate tilya şahidê
Lê heqîqet her di zanîtin Xwedê
99. Mislê rojê hatîye ew câ felek
Hem teheyîr Adem û hindî melek
100. Gotî Adem: "Ya Rebb ew nûra qebul
Maye tiştek gotî eshabê Resûl?"
101. Gotî adem: "Ya îlahî qencebêt
Bête tilyan her çî maye min divêt"
102. Nûra Bûbekri diwastayê Emer
Binsar û Osman di xinser misteqer
103. Hate îbhamê dibên nûra 'Elî
Şu'le da tilyan û cennet mûncelî

104. Hate Hewa û nezer da nûrâ saf
Gotî ya Adem çî nûre pir şefaf
105. Gotî: "Nûra yek nebîyê mezin e
Seyîd û serwerê nesla min e
106. Çûnkî bê emrê ji Adem bû zîhar
Nûr ji enyê hate piştê bû sitar
107. Nê ji darê xwarin herdukân şêrîn
Hulle ê cennet ji bejnê da firîn
108. Îhbîtû mînha cemî'en hate emr
Adema dê bêteve lâkîn bi sebr
109. Der Serendîbê bi erdê ket girî
Çendî salan rohnîkê wî bûn herî
110. Rohnikê wî şîn kirin dar û nebat
Çûn di erdê da û pa û mayî mat
111. Pir girî û xweş girî bê hed gelek
Newhe ê îna zelema çû felek
112. Rojekî ew der sucudê bê mefer
Pir girî û hem li 'erşê kir nezer
113. Dît nivîsî lâ îlâhe îlâllah
Ba Muhammed ba Resûlelahî Şah
114. Got bi heqqê an Muhammed key te neqş
Wî kirî ba îsmê xwe ber saqî erş

115. Tû bi xufranî min ê bêçare bê âh
Hate Cebraîl û bâ emre Îlâh
116. Ser hilîna Adema 'efwâ celîl
Bo te hat û rabe ey zîba cemîl
117. Hurmeta navê Muhemmed an resûl
Tewbeya te bû qebûl û her qebûl

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA ŞEŞEMÎN:

NESL Û NESEBA HZ. MUHEMMED(SXL) PÊXEMBER

118. Çûn ji Adem nûra Ehmed bû cuda
Hate pişta şîs û burhan-ul huda
119. Hate aslabê bîtûnê tahirê
Qet nebû yek jê xerab û facirê
120. Fewqê 'Ednan tâ ji Adem îxtîlaf
Tê heya lew bê tifâqe ev mesaf
121. Jêrê 'Ednan ta bi Abdullah guhist
Bîst û yek babin hemî rast û durist
122. Hin yekî 'Ednan û Ma'd û hem Nezar
Mudr û Îlyas in bizan ey goşîdâr
123. Mudrîke paşî Xûzeyme taze eys
Hem Kenân e paşî Nedr e bû qureys

124. Malik û hem Fexr û Xalib hem Luwey
Ke'b û Murre hem Kîlab û hem Qusey
125. Hem ji pišta wî Quseyî pâk û saf
Ew emanet hate nik 'Ebdulmenaf
126. Hem ji nik 'Ebdulmenaf ew muxtefî
Hate pišta Haşim ew nûra safî
127. Hem ji Haşim bû emanet munqelîb
Hate bû mêhvanê 'Ebdulmuttalîb
128. Silsilâ wî tâ bi Adem dâ û bâb
Pêkve dê biçne beheştê bê hîsab

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA HEFTEMÎN:

JI DAYIKBÛNA 'EBDULLAH Û ÇÛNA NÛRHÊ BÛ WÎ

129. Hem ji Abdulmuttelîb bû hamîle
Fatîme hem mûddeteş bû kamîle
130. Ji bo Abdullah bi hukmê sabîqe
Nûra Ehmed der cebîneş barîqe
131. Mezhera nûrâ Muhemmed hatî ew
Pak û nûranî mueyyed hate ew
132. Cubbeyê Yehya di Şamê de numûn
Sûfekî sipî hemî têkda bû xwîn

133. Girtî xwinê cubbeyê Yehya çûnar
Wê demê bû yek şehîdê bê şûwar
134. Hişk bû ew xwûn û bûrin rûzîgâr
Tâ wucûdê 'Ebdullahê namîdar
135. Taze bû ew xwûn û mercân bûne rêz
Rahiban got: Ay û way exbarê nêz
136. Wextê rabît 'Ehmedê 'alî 'alem
Nasixê tewrat û încil û sanem
137. Hat xudanê seyf û Qur'an'a mubîn
Xwûnê Yehya bû nîşana wî yeqîn
138. Lêk vegeryan hem sûal û hem cewab
Way û weylê kefte nav ehlê kîtab
139. Wan yeqîn kir 'Ebdullah hate wucûd
Ba 'edawet qast kirin qetla wî zûd
140. Ehlê kizb û ehlê zûr û îftira
Çendî caran hatine Um-mûl qura
141. 'Ebdullah der hivzê sultanê wedûd
Nûra Ehmed dafi'ê şerrê yehûd
142. 'Ebdullah mAzin bu ba nâz û delal
Canê 'Ebdulmuttalib ew mah û sal

143. Xweş divê babê 'ezîzê maderê
Rohniya malê û zîba esmerê
144. Şikl û sîma mislî bedra asîman
Nazik û rana û nûra xanedan
145. Dilber û mehbûb û şîrîn wek şeker
Herkesê ew dît û dil lê bû du ker
146. Dohtê çakanî Qureyş û hem 'Ereb
Muntezir bun pêkwe bo wî roz û şeb
147. Her yekî hîvî dikir ew bît qebûl
Ba yekî wî qet neda meyla wusûl
148. Bûd û azad ew ji fikra înan û an
Yumnê nûra Ehmedî bû pasîban
149. Rojekî wî gote babê: Ey emîr
Sa'eta ez biçme betha yê beşîr
150. Min ji piştê tête der nûrek mezin
Radibitê ser serê min ew ji min
151. Ez di bînim minqesîm bûye duker
Yek di şerqê yek di xerbê çuye der
152. Têteve çespan û çapûk bê dereng
Tête ser yek mislê ewrê taze reng
153. Ez dibînim asîman buye dû şeq
Radibit ew nûr û ta heftim tebeq

154. Têteve fil-hal zan 'alî meqam
Ez dibînim tête piştamin tamam
155. Saete rûnim li ser mehda zemîn
Min 'ecaîp tête pêşim aferîn
156. Hem ji erdê tête sem'im ev kelam
Wî di gelte nûra Ehmed wes-selam
157. Her çi darê hişk û ez çûme binî
Bû hişîn û kesk ji belgan pir xenî
158. Bû sih û seywan li ser min nagîhan
Ez ku çûm bû hişk û bê belg û xûsan
159. Ev çi remz û hale babo bêje min
Gotî babê: Rohniya çavê di min
160. Şabe mizgîn im lite ey nazenîn
Dê ji te zahir bîtin Şahê Emîn
161. Hêviya min wasîqe dê rabîtin
Ehmedê mursel ji te peyda bîtin
162. 'Eşrefê mexlûq û siltanê cîhan
Dê ji te zahir bîtin bê şik bi zan
163. Min dîye der xab û mame mûntezer
Ehmed ez pišta teye canê peder

Ger divêtin hûn ji narê bin necat

B' eşq û şewqek hûn bi bêjin

BEŞA HEŞTEMÎN:

BERGERHAN CUHIYAN DA KU 'EBDULLAH BIKUJIN

164. Çûnkî Ebdullahî rabû pâkî zat
Nê li qetla wî cûhûdan kir xebat
165. Rahib û ehbar û hem ehlê kîtab
Ji agirê kerbê hemî bûne kebab
166. Hatine heftê cuhûd ez milkê şam
Taze bey'at best û 'ehdana tamam
167. Cengî û merdê dilawer şûreger
Pêkve xwarin sûnd û bestên tîr û şîr
168. Ta neyête kuştin ew zîba heram
Yek ji me nayête ax û milkê şam
169. Rahê sehra girt ewanê kîne dûz
Mislê kundê her bi şev çûne birûz
170. Zû gihîştin çûne dorâ Mekkeh'ê
Ketne posan mislê ava bin kehê
171. Da bibîn kengî dê bêtin firsetê
Newbedar ketne kenarê hêsetê
172. Rojekî wan dî bi çolê da meşî
Talibê nêçîr û ahûyê xweşî
173. Wan ku dî rabûrî Ebdullah çûnan
Ba tenê تنها bi çolê da rewan

174. Firseta xwe dîn û rabûn şûr hesîn
Çûn payda mislê gurgê dev bi xwîn
175. Hem di wê rojê li seydê bû weheb
Yanî babê Amîne 'alî neseb
176. Çûn seda hat û weheb lê kir nezer
Hate Evdullahî qewmê xwînceger
177. Revde gurgê hate berxê nû cîwan
Lê belê hişyare lê zîba şivan
178. Nagîhan fikrî weheb dî ji asîman
Hate xwarê leşkerê rûhanîyan
179. Xeybeyanê keske pûşê gul'îzar
Hatin û jêk rakirin ew tar û mar
180. Terfetûl 'eynê cuhûd berbat kirin
Wan ji iqlîmê cîhan winda kirin
181. Sa'eta sirrê ji xeybê dî weheb
Maye heyran û vemay, der 'eceb
182. Çun ji 'Ebdullahî dît ew sirr û hal
Xweş li lewhê dil nivîsî ew xeyal
183. Ger qebûl ket dayî min Amîn e
Pak û me'sûm e hebîbê mûqîn e

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA NEHEMÎN:

ZEWACA 'EBDULLAH Û AMÎNÊ

184. Paşî wê sirra 'ezîmê û nûrî tab
Nazilê qelbê weheb bû ittîrab
185. Çapûk û çespan vegerya hate mal
Wî hîkayet kir ji bo mala xwe hal
186. Hem hîkayet kir ji bo zewcê weheb
Hem keramet hem ji cenga bil 'eceb
187. Gote zewce: Qence qasit bêle min
Rabe biçne xanedana dil mezin
188. Bêje Evdulmittalib: Min Amîne
Wê li nik zîba 'efife mûqîne
189. Ger ji 'Evdullahî bîtin ew qebûl
Temşiyet dê bêt û çêbît ew usûl
190. Nazik û sîma xweş dilber ew e
Layîqa wî babeta wî her ew e
191. Hate 'Evdîmuttalib kir ba xeber
Hem di 'Evdullahî hubbê kir eser
192. Gote dayê: Rabe ey zîba xîsal
Zewceyê bo min bi xwaze bes delal
193. Ba cemal û ba kemal û ba edeb
Xweş eda şîrîn lîqa 'alî neseb

194. Zû di rabû Fatîme dil şadiman
Mazire ber sûretê gulçehrekan
195. Pir şepal û gul rixan û taze 'eyş
Sakînanê perdeyê 'alê Qureyş
196. Dil newa û pêkve naz û qendî leb
Kes nedî şirîntir ez binta weheb
197. Amîne gul bû di gulzarê cemal
Husnê û bê hed qed û qamet 'îtidal
198. Dê çi bêjim ez cemal û me'rîfet
Walida Ehmed bes e her ew sifet
199. Fatîme dît û vegerya da mina
Gote 'Evdullahî behsa Amîna
200. Mislê wê nabin şepal û nazenîn
Ne di dinya ne di firdewsa berîn
201. Carîdî çû dît û ew nazik nîhal
Lê vegera babetin herdû heval
202. Hate 'Evdulmuttalib rakir ji mal
Çûn ji babê xwestin ew re'na deal
203. Weqîyek zîv weqîyek hem zeheb
Sed şitûr sed pez ewî dane weheb
204. Sed beqer cûmle ciwan û samîne
Bu hinarin pêkve nextê Amîne

205. Hatî 'Evdulmuttalib wê sa'etê
Kir tedarîk kar û barê dawetê
206. Çêkirin zâd û te'amên bol-'eceb
Hem Qureyşî xwendin û hindî 'Ereb
207. Amîne xemlî ji rengê gulşenê
Zend û bazin reştine ji rengê henê
208. Xweş newa û xweş eda hatin 'Ereb
Cum'e bû ew şeb nehê mahê receb
209. Wê şevê anîn nîkah û eqd û best
Bûk û zava mane şerbet daye dest
210. Der Mekke meşhûrî bû ev gotine:
'Evdullah zavaye bûke Amîne
211. Hesret û kerbê hemî berbat kirin
Wê şevê sed jin tamamî jê mirin
212. Bûk û zava herdu çûne xelwetê
Şahîyanek kefte baxê cennetê
213. Zû di Ridwanî vekir babê cinan
Daketin dergehê nîran nagehan
214. Hûr û xilman û çem û teyr û nebat
Hatine hemd û senayê xweş lûxat
215. Ez demê can bexşî Cibrîlê emîn
Mujde da ehlê semawat û zemîn

216. Cebraîl hate dewra Ehmedî
Hat şahê mislê wî çavan nedî
217. Rabe mizgînê bibe j' mexlûqî ra
J' asîman û erd û ta tehte's-sera
218. Xulxule peyda bû der heft asîman
Sewtê tesbîhê melek çû lamekan
219. Hate xwarê Cebraîl û mujde da
Keskî ala yek li banê Ke'be da
220. Mujde da mexlûqîhayê behr û berr
Cumle heywanatî zanî ev xeber
221. Xweş nîda hat ez yesar û meymene
Nûra Ehmed hat û çû nik Amîne
222. Hatî nûranî şefî'ul-muznibîn
Hatî Xeyru'n-Nasî Xetmu'l-Murselîn
223. Wê şevê hindî şenem bûn sernigûn
Textê Iblîsê le'în bû wajigûn
224. Lew li ser şûret revî teşbîhî mar
Hate Kohê Bû Qûbeysî kir hewar
225. Zuryeta wî cumle hatin bê newa:
“Ev çi hale bêje me?” Wî gote wa:
226. “Lew li min çêbûye tirs û zelzele
Ba Muhemmed Amîne bû hamîle

227. Hate dewra Eħmedî, dewra me çû
Lat û 'Uzza dê biket bê ab û rû
228. Yek ji me êdî neşêtin bit 'eyan
Wî li me rê girt ji çûna asîman
229. Hate xûnrêzê cîhangîrê sefak
Em ji destê wî hemî dê bin helak
230. Rohniya herdu cîhan û milletan
Ummeta wî çêtirînê ummetan
231. Dê çî bit halê me û tedbîr û ray?
Ay û way û ay û way û ay û way!"
232. Hem di subħa wê şeva dewlet fuzûn
Textê şahanê cîhan bû sernixûn
233. Bê tekellum ma devê hindî mulûk
Şah eger ħakim eger mîrê mulûk

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA DEHEMÎN:

HEMLA AMÎNÊ JI BO HZ. MUHEMMED(SXL) PÊXEMBER

234. Amînê go: "Ta kî şeş meh çûne ser
Min ji ħemla xwe nedî qeş yek eser
235. Paşî şeş meh hate min awazê xeyb:
"Min li te mizgînî ey pakîze ceyb!

- Wî digel te xatemê peyxemberan
 236. Nasixê herfa kîtab û defteran”
- Lê di xewnê da me dîtin bê‘eded
 237. Enbiya’û remz û nîşan û sened
- Ewwela min dî ji min nûrek diçî
 238. Qeşra Buşra min ji ‘eksa wê didî
- Mahê ewwel hate Adem t̄eyyîba
 239. Kir selam û gote hemlê: “Merhaba!”
- Mahê sanî hate Şîs ez meymene
 240. Gote min mizgîn li te ya Amîne
- Mahê salis hate Îdrîsê nebî
 241. Kir selam û mujde ber hemlê te bî
- Mahê rabi‘ Nûh û xamis Hûd û hem
 242. Hatî û mizgînî da min ez kerem
- Mahê sadis hate Îbrahîm Xelîl
 243. Da mi mizgînî ji wî hemlê cemîl
- Mahê sabi‘ hate Îsma‘îl zebîh
 244. Mujde bexşî min ji wî hemla melîh
- Mahê sAmin hate Mûsa ba wefa
 245. *Îbşîrî ya Amîne bil-Muştefa*
- Mahê tasi‘ hate ‘Îsa j’ asîman
 246. Mujde da min: “Hate sultânê cîhan”

247. Ew ku şeş meh çûn ji hemlê munqelîb
Gote ‘Ebdullahî ‘Ebdulmuţţelib:
248. “Ba tîcaret dê biçî ba semtê Şam
Ez Medîne bar bikî temr û te‘am
249. Wê demê dê Amîne kodek bibî
Yek ziyafet lazim e de‘wet hebî”
250. ‘Ebdullah an mahê rûyê gul‘îzar
Der Medîne şerbeta mergê vexwar
251. ‘Umrê ‘Ebdullah(i) bîst û pênc û sal
Borî û wî kir ji dunya îrtîhal
252. Çûn ji ‘Ebdulmuţţelib ew waqî‘e
Herdû çavên Amîne bûn damî‘e:
253. “Esmerê min ma *ji* xelqê karîwan
Hatine peyda ne ew rûh û rewan
254. Kan hebîbê min dilê min bû du nîm
Ah *û* hesret kodekê min ma yetîm”
255. Dar *û* ber bo wê girîn wê sa‘etê
Av *û* rohnik nadenê qet muhletê
256. Hem melek rabûn *û* gotin: “Ya Kerîm!
Nê hebîbê te Muħemmed ma yetîm”
257. Malîku‘l-mulkê mezin da ev cewab:
“Çêtirim bo wî ji xêyra da *û* bab”

- Ey xudawendanê eqlê musteqîm
258. Kes nizanit qiymeta durra yetîm

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA YAZDEMÎN:

JI DAYIKBÛN Û TEŞRÎFA HZ. MUHEMMED(SXL)

259. Ez rebî' u' l-ewwela şev rewşen e
Heşti şev borîn li hemla Amîne
260. Ya nehê zaîl bû jê tirs û 'îna
Ya dehê bû mujde, der Xîf û Mîna
261. Yazde hem bû xulxul û awaz û hem
Zemzema tesbîhî der hindî Herem
262. Diwazdehem helbû şemala dewletê
Amîne mabû tenê der xelwetê
263. Wê şevê der Ke' bê 'Ebdulmuţţelîb
Mabû, ber te' mîra erdê munqelib
264. Amîne got: "Mam tenê bêmêr û jin
Ez demek tirsam û lerzî hate min
265. Min dî xanî rohnî bû xayet belê
Çarî jin hatin ji ruknê menzelê
266. Ba cemal û husn û nûranî Qemer
Hulleyê îstebreq û sundus dî ber

267. Le 'lîha, têr ev ji ava Kewserê
Zulfeha, sed ټe 'ne dane 'enbere
268. Bejn *û* bala ser *û* sîmayê şefaf
Min şibhandin tuxmeyê 'Ebdulmenaf
269. Yek li destê rastê hat *û* yek li çep
Yek li pişt *û* yek li pêşem ba edeb
270. Ew *kî* bûn? Hewwa *û* Sara, Asiye
Ya li pêşim Meryema 'Îmranî ye
271. Meryemê husn *û* melaħet zêde bû
Pal veda bû ew ji bo min tekye bû
272. Nagehan bû zemzem *û* tesbîh *û* deng
Ba luxethayê muxalîf reng *û* reng
273. Rast *û* çep min dî kewakib têk firîn
Qafî ta qafî cîhan bû enwerîn
274. Pêk ve dunya min di dî bû qursê nûr
Meşriq *û* mexrîb didîtin min ji dûr
275. Keski aleyek di mexrîb da mi dî
Yek li şerqê yek li banê Ke 'be dî
276. Emrê Cebraîlî kir mîrê mezin
Mujde da ehlê semawat *û* zemîn
277. Daketin dergahê nîran nagehan
Şahiyane hûr *û* Riđwanê cinan
278. Xulxulîn hûrî di qeşrên Cennetê
Kî dizanit kar *û* barê qudretê
279. Hatî Cibrîl *û* melaîk fewc *û* fewc
Çar kenarê Mekkehê bûn mewc *û* mewc
280. Nagehan ez têhnî bûm wê sa 'ete
Min dî da destê min camek şerbetê

281. Sipî wekî şîr û şêrîn wek 'esel
Nê ji wî şîr û 'esel bûne mesel
282. Min vexwar û têhnî çû fi'l-hal ji min
Teyrekî sipî hat û per malî di min
283. Wê demê min bû Muḥemmed Muştefa
Nûrê can û me' dena sidq û sefa
284. Çûn ji min bû wî û sultanê derîn
Xerqê nûr bû ew semewat û zemîn
285. Herçî mexlûq pêkve bûne şadîman
Xem diçûn 'alem ji nûr ve dîte can
286. Cumle zerratê cihan da ev nîda
Kirne gazi pêk ve gotin: "Merḥeba
287. Merḥeba ey sirra Furqan merḥeba
Merheba dermanê derdan merheba
288. Merḥeba ey canê baqî merheba
Merḥeba 'uşşaqê saqî merḥeba
289. Merḥeba ey 'alî sulṭan merheba
Merḥeba ey kanê 'îrfan merheba
290. Merḥeba ey şemsê taban merḥeba
Merḥeba ey canê canan merḥeba
291. Merḥeba ey qurret-ul-'eynê Xelîl
Merḥeba ey xasê meḥbûbê Celîl
292. Merḥeba ey rehmeten lîl-'alemîn
Merḥeba en te şefî'ul-muznîbîn
293. Merḥeba ey afîtabê bê zewal
Merḥeba ey mahî tabê layezal
294. Merḥeba ey bulbulê baxê wîsal
Merḥeba ey aşînayê zulcelal

295. Merheba ey nûrî xurşîdê Xuda
Merheba ey tu ji Heq nabî cuda
296. Merheba ey geşteyê behra heqîq
Merheba ey dîdeyê ehlê terîq
297. Merheba ey şahîbê ceşş û heşem
Merheba ey kasîrê Lat û Senem
298. Merheba ey sahibê seyf û xeza
Merheba ey mani'ê Lat û 'Uza
299. Merheba ey metlûbê 'alem her tu yî
Merheba ewladê haşîm her tu yî
300. Merheba ey nûrî heqra mezher î
Merheba ey ewlîyara serwer î
301. Merheba hatî şivanê ummetê
Merheba hat bûme nûra dewletê
302. Merheba ey bedrî 'alem ey munîr
Merheba xelqê ketîra destegîr
303. Merheba sultanê cumle enbiya
Merheba ey nûrê çeşmê esfîya
304. Merheba ey îftîxarê enbiya
Merheba ey şem'ê cem'ê ewliya
305. Merheba ey menbe'ê 'izzû wefa
Merheba ey kanê eltafê 'eta
306. Merheba ey nûrî çeşmê ummetê
Merheba ey sun'î şahê qudretê

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA DAZDEMÎN:

TIŞTÊN KU DI ŞEVA TEŞRÎFBÛNA HZ. MUHEMMED(SXL) DE QEWIMÎNÊN

307. Secde bir her wî demê an nûrî can
Dest hilnandin bi sûyê asîman
308. Pareyek 'ewrê sipî ez asîman
Hat û hilgirt û ji min xaîb bû an
309. Hateve medhûn û pêçayî, kehîl
Pare 'ewrek di gehîştê bo delîl
310. Girt û bir, lê hate guh min ev xeber:
“Girti wî dunya seraser behr û ber”
311. Hateve spî pare ermîşek digel
Wî mijî ba le'1 û wek şehd û 'esel
312. Lê belê xwoş hate gûşem ev nîda:
“Pêk ve zanî xelqehayê enbîya”
313. Min dî xanî bû ji teyran reng û reng
Dim ji zumrûdan û hem yaqût û çeng
314. Paşê hatin sê nefer lê her yekî
Husnê sûret mîslê qursa rojekî
315. Yek di destê wî mesîn e yekî teşt
Yekî anî came sipî ez beheşt
316. Hefî caran şûşt û pêçan pir huner
Gotî û her sê rabûn û çûne der
317. Naêne hedd û hesabê mu'cîzat
Muxteser min gotine ne't û sîfat
318. Dê çi bêjim ne'tê zatê enwerî
Ê ku 'alem cumle bo wî çêkirî

319. Mun 'ekes bûn wê şevê hindî senem
Agirê Faris vemirya bû 'edem
320. Taze eywan xaneyê Nûşîrewan
Rast û çep hejya û lerzî nagehan
321. Şeq bû kungir çarde rê jê çûneder
Xewf û tirsek hate Kîsra bêmefer
322. Behra Sawe çik bû û hişk bû nihan
Wadiya nav lê Semawe bû rewan
323. Ez serê hindî mulûkan tacî ket
Zêde bû lê tirs û xewf û zelzelet
324. Der duşenbê dazdehê ewwel rebî'
Sala filî hatî ew hemlê bedî'

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA SÊZDEMÎN:

NÎŞANÊN KU 'EBDULMUTTELÎB DI ROJA JI DAYIKBÛNA HZ. MUHEMMED(SXL) DE DÎTÎN

325. Rabû 'Ebdulmuttelib têkel seher
Got: "Me dî zemzem kete ruknê Hecer
326. Ke'be çû secdê mubarek bû meqam
Rukn û ban û beytê lêk dikir selam
327. Rukneha, Allahû 'ekber jê dihat
Hat mizgîniya Muhemmed es-selat
328. Paki bûm ez Lat û 'Uzza û senem
Hat Ebul-Qasim şahê 'alî 'alem
329. Rast û çep xwoş hatî zîba erxenûn
Nê Muhemmed hat û put bûn sernuxûn

330. Hatin ibrîq û legen misk û gulaf
Ke‘be şuştin mame heyran ez tewaf
331. Ez bi der keftim ji Babê Şeybe zûd
Min Sefa û Merwe dîtin der sucûd
332. Pelg û dar û ber ji feyza Layemût:
“Ca`ena Eħmed Resûllullah” digot
333. Hat awazek: “Eya mezinê Qureyş!
Ev çi tirs û lertzî ye? Ey teybe ‘eys!”
334. Rabû ‘Ebdulmuţtelip xwoş hate mal
Teşrekî mazin li banî çeng û bal
335. Bêhna Firdewsê ji hucra Amîne
Hat û der hingaft û got: “Ya sakîne!”
336. Amîne hat û ewî jê kir *su* al:
“Kanê ew nûra digel te ey şepal?”
337. Amîne bû gotê mewlûda mezin
Hatifê navê Muħemmed gote min
338. Wê di xewnê de diye nûra *mubîn*
Ger divêtin tu bibînê, dê bibîn
339. Revte ‘Ebdulmuţtelib bo dîtinê
Şîr di destî nagehan yek rehzenê
340. Ne‘reyî zed hate ‘Ebdulmuţtelib
Heybetê girt û dilê wî murte‘îb
341. Nayête dîtin heta sê roj tamam
Da melek bêne tewafê xas û ‘am
342. Hate ‘Ebdulmuţtelib pê xoşbîtin
Bê tekellum maye ezman û dehin
343. Paşê çendî dîtî ew nûra sebî
Rohniya çavê di bapîrê xwe bî

344. Amîne şîr da dehanê şekkerîn
Ta gehîştî weqtê teslîma deyîn

345. Amîne got: "Min di xewnê da diye
Murîdî'e dê bit Helîma Se'diye"

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA ÇARDEMÎN:

HATINA HELÎA SE'DÎ JI MEKKEHÊ Û BIRINA HZ. MUHEMMED Û DAYÎNIYA HELÎMÊ

346. Mekkiyan kodek didane şîrdar
Da di germê da nebin kodek nezar

347. Hem qebîla Se'diyan dîger bilûk
Her dihatin ta Mekkeh telbê biçûk

348. Wê qebîla Se'diyan lê bû xela
Mêr û jin pêk ve ji birsan mubtela

349. Got Helîmê: "Rojekê em çend heval
Bo giyayî çûne nava yek newal

350. Hem giya jî tê hebû hem ava sar
Min giya xwar û ji avê hem vexwar

351. Hem hevalan jî giya û av vexwar
Hate awazek xwudanî nadiyar:

352. "Ha niha biçne Mekke ey cumle jin
Da mebarek bin ji mewlûda mezin

353. Xurrem ey zîba deyîn bo xwe bibet
Xweziya ew pûstanê ku şîr jê bixwet

354. Tirs xalib bû li me, em hatîne mal
Gote min Hâris: "Çi hal e ey heval ?

355. Min ji bo wî got, ewî got: “Ey hebîb
Belkî ew mewlûd ji bo me bit nesîb”
356. Nagihan min dî di xewnê da yekî
Ez birim avêtime rûbarekî
357. Sipî wek şîr û şîrîn û şehdîwar
Jê vexwo! Wî gote min sê çarî car
358. Ez ji xew rabûme ve têr û tijî
Her du pustanê di min şîr jê rijî
359. Sahîban ez dîtîm û pîrsîn dirêj
Lêk tenebuh bû li min bo kes mebêj
360. Yek kerê laxer hebû lê pir kesad
Haris anî taze kurtan lê nehad
361. Kariwan rabû bi qesda Mekkete
Bûm suwar û hem li ber min zemrete
362. Dûre dûra kariwanî leng û lûk
Ker ji çûnê bû û Haris ma xudûk
363. Gote min: “Da biçneve bêzeħmetê”
Min gotê: “Nê hate nûra reħmetê
364. Da biçine pêşî ocaxa Qureyş
Belkî halê me bibîtin taze ‘eyş”
365. Min dî yek merdê tewîlê enwerî
Ba serê rim wî îşaret da kerî:
366. “Ya Hêlîme ’isrî’î mizgîn li te
Tu dayînî bo Muħemmed xwezîya te
367. Tîz û xweş çûn bo kerê laxer meyan
Wî berahê bir ji hindî kariwan
368. Ewwela min kir li Beħayê nezer
Çar teref pêk ve giya û lale ter

369. Kariwan danî li cayê tîbi 'eys
Jin hemî geryan li eşrafê Qureys”
370. Gote 'Ebdulmuṭṭelib: “Xweş Amîne
Nê divêtin bo Muḥemmed dayîne ?”
371. Qale: “*Haze 'l-emrû minhû qed beda*”
Hate goşê min ji hatif ev nîda:
372. “*Şafwetu 'r-Reḥman û Xeyru 'l-murselîn*
Nîne ez xeyrî Ḥelîme kes dayîn”
373. Hatine nik Amîne jin ba surûr
Her çî zanî ew yetîm e çûye dûr
374. Ey xweş! ew zîba yetîmê şîrixwer
Her du 'alem jêri ferman ser bi ser
375. Ey xweş! ew re'na yetîmê şîricû
Nûra her du 'alem ez ruxsarê tû
376. Ey Ḥelîme hilgire an pakizat
Dewleta baqî û daîm bo te hat
377. Hat Ḥelîme gote 'Ebdulmuṭṭelib
Ḥalê salê û halê qaḥṭa muzṭerîb:
378. “Hatime bo yek puser ez bim dayîn
Ger li nik te dê hebî nî'me 'l-emîn”
379. Gotê 'Ebdulmuṭṭelib: “Namêt çi ye?”
Gotê: “Navê min Ḥelîma Se'dî ye”
380. Gotê 'Ebdulmuṭṭelib: “Xweş mehd î, tu
Hem bi ḥusn û hem bi ḥilm û se'dî, tu
381. Wê li nik min nûra çeşm û qûtê can
Mîslê wî nabin nebûne, der cîhan
382. Lê yetîm e, durre bêmîslê me hey
Ez li cih babê me ger dê tu bi bêy”

383. Gote 'Ebdulmuṭṭelib: "Da ez biçim
Bêjime mêrê xwe pirsê jê bikim"
384. Hat *û* gote H̄aris, ew zîba xîtab
Ya H̄elîme weyhekê! wî da cewab:
385. "Dê çi ke tu ba yetîmê bêpeder"
Ya H̄elîme damena sebrê biger
386. Hate çûnê kariwanî kir cihêz
Dîtî H̄aris rohnîkên wî bûne rêz
387. Gotê H̄aris "Ez dibînim tu xudûk"
Gotê: "Heqq e! Dê biçim ez bêbuçûk"
388. Gotê: "Her bîne ewî ti flê yetîm
Qet *tewekkelna 'elallahî'l-kerîm*"
389. Xweş vegerya pêşî 'Ebdulmuṭṭelib:
"Hatime durdaneyê te ey muḥîb!"
390. Da biçîne pêşê danaya Emîn
Min ku dî ew ḥusn *û* dîdara şêrîn
391. Yek regem xalî nema ez muḥbetê
Bûme yexsîra wî ez wê sa'etê
392. Xweş me hilgirt *û* kenî ew nê gelek
Nûra xendê, lahiqa çerxa felek
393. Bûse da min herdu çavên enwerîn
Xweş mijî ba her du lêvên şekkerîn
394. Rast vexwar *û* dev neda sedya çepê
Hişt ji bo zemrey ba îlhama Xwedê
395. Wextê çûnê hate 'Ebdulmuṭṭelib
Da me zad *û* tişt *û* min got: "*Ya muḥîb!*"
396. Min bes e ev kodekê nûrîn cemal
Dewlemend im dê çi kim ba tişt *û* mal

397. Xwesti xaîir min, ji ceddê Amîne
Amîne hilgirt û ew nazik ten e
398. Dabû ber bêhna xwe rohnik bûne çem:
Ey Muħemmed! Tu biçî ez dê çikem
399. Dûriya te sohti qelbê Amine
Lê çikim ev şûle ne b' destê min e
400. Ey ħebîbê min Muħemmed ey delal!
Bêje da rohnik nebarin bo te al
401. Tu bike ferwar û da sebr û sukûn
Bo me bêtin werne, can û dil me çûn
402. Tu emanetê Xudê bî ey ciger!
Ey Ĥelîme fî emanîllah biber
403. Bir Ĥelîmê bo xwe ew durra yetîm
Xweş bi te dayîne ya Se'd û Helîm
- Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA PAZDEMÎN:

ZIVIRÎNA KARAWANÊ SE'DÎYAN Û BIRINA HZ. MUHEMMED JI BÛNA ŞÎRDANÊ

404. Subĥê rabû kariwanê Se'dîyan
Ew kerê laxer ji bo wan her siyan
405. Ĥaris anî û Ĥelîme bû suwar
Paxila rastê Muħemmed tê veşar
406. Ya çepê danîbû tê da dumrete
Ker sivik çû çapik û bêzeħmete
407. Ewwela çû Ke'bê sê car secde ber
Saniyen ew hate çûnê pir huner

408. Dî kusan ew ker Nebî xweş çû gelek
Wê li pişta wî suwarê neh felek
409. Ew kerê laxer di pêşî kariwan
Wek siha țeyrê li deştê bû rewan
410. Se' diyan gote: "Helîme ey heval!
Ew kerê laxer me go naçîte mal
411. Vê demê sê lê suwar in, mîslê țeyr
Wê diçîtin nagehê wî kes bi seyr"
412. Ker bi 'ezman hat *û* gote Se' diyan:
"Qeț 'ecêb nîne ji çûna min 'eyan
413. Wê li pişta min Resûlê Rebbê 'erş
Jê re destê wî ji 'erşê ta bi fers
414. Seyyîdê mexlûqê Rebbil 'alemîn
Çêtirînê ewwelîn û axirîn"
415. Qewmê Se' dî pêk ve gotin ev meqal
Nîne ev qewl û seda îlla xeyal
416. Mislê bayê kefte rê û her bixar
Dane ser yek koh *û* deşt û kohisar
417. Gote ezmanê Helîme ev beyan:
"Em bi dîr keftin ji xelqê kariwan
418. Min dî sakin erbe' ûne rahiban
Tabi'ê esqûfekî eswed qeban
419. Wî digote rahiban wesfa hebîb:
"Wexte rabîtin Muħemmed 'en qerîb
420. Kasirê esnam *û* qettalê Cuhûd
Bê'eded nîşanê wî hatne wucûd"
421. Ez ji wan borîm *û* çendî, nê gelek
Şu'leya nûra Muħemmed çû felek

422. Wey heware! “Gote usqûfê kebîr”
Hey ev e, wernê û jêk rakin bi şîr
423. Destî da şîran û hatin şubhê şan
Xweş li pey me mulhîdanê bê eman
424. Dê çi kem ya Rebb meded mîrê mezin
Wah! Muhemmed rohnîya çavê di min
425. Hate nêzîkî me koma rahiban
Min Muhemmed dî nezer da asîman
426. Hate xwarê agirê mîslê şîhab
Tê werhat û sotin ew ehlê ‘ezab
427. Hatifê gote ji yumna şehsuwar:
“Uhlîkel-kuffarû mîn naril Cebbar”
428. Kariwan hat û hemî em çûne mal
Pêkve pê xweş bû nîsa û hem rîcal
- Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA ŞAZDEMÎN:

HZ. MUHEMMED LI NAV OCAXA SE'DÎYAN

429. Dewleta baqî geha nav Se'diyan
Rizq û ni'met hat û nabin tehlîyan
430. Dexl û dan û ga û pez lê zêde bûn
Hen cefa û mişnet û alamî çûn
431. Pêk ve hatin dest û pê lê bûse dan
Muşbeta wî kefte qelbê cumlekan

432. Hem Hêlîme xerqî î n' am û kerem
Wê Ebu'l-Qasim li malê, bo çi xem
433. Gote: “Wellahî'l-'ezîm ev nazîdar
Hat *û* min came ne şûştin qeş tu car
434. Tahîr û pakîze paqîj her me dî
Bewl *û* xa'it min ji 'ewret qet nedî
435. Bû du salî û xiraman sû bi sû
Têkilî lê'ba biçûkan qeş nebû
436. Rojeka wî, heftiya yek kodekî
Heftiya wî mah *û* meh ba salekî
437. Ewwelê lefza wî maye min li bîr
Gote wî: “*Allahû ekber min kebîr*”
438. Sala sê, nazik nihâlê rûh û can
Arezû kir wî şivanî nagehan
439. Hem bi hukmê karê ummet perwerî
Bû şivanê laîqê Peyxemberî
440. Rojekê wî gote: “Ey mader! Bira
Kanê ?” û min gotê: “Pez birye çera”
441. Gote: “Qeş inşaf e dayê! ez li mal
Ew li germê, ez vexûm ava zelal”
442. Gote min Wî: “Dayê! me bispêre Xwedê
Min tewekkul daye wî, tu min bidê

443. Subhê min dayê ‘eşa û zad û hem
Bûn şivan û her du çûne ber xenem
444. Ey şivanê berre ê birca ber e
Jêrî gopalê te ‘alem yekser e
445. Ba terehşum pez çerînî can û dil
Rehmê tu ber cumle ‘alem muştemîl
446. Ey şivanê kodekê zîba dilêr
Xwezuya wî berxî ji dîdara te têr
447. Wextê êvarê şivan dê bête mal
Ez diçûme pêşi zîbayê delal
- 448. Gote min: dayê, me got: “Hatim *ûleyk*
Ey Muhammed sellemellahû ‘eleyk”**
449. Zemre hat û gote min ev xweş cewab:
“Min ji wî dîne ‘eca’îb bêhîsab
450. Pa nehîd ber xuşk û keskî bûn tamam
Her çî ew dît, dar û ber lêkir selam
451. Bêjîte pez dê here, ew dê biçî
Wer neçe, naçît û sakî multecî
452. Rojekê pez bû belavî wadiyê
Min vegêrandin ji tîrsa ‘adiyê
453. Gote min: “Bo çî tu nahêlî dilêr!
Pez biçî? min got: “Cihê qeyxane şêr”
454. *La texef wî*, gote min pez çû çere
Nagehanî hate me ew qeswere

455. Wê Muḥemmed dit *û* dûvê xwe hejand
Aşiqane hate pêş *û* ser nihand
456. Girtî goş *û* gotinê yek du mesel
Min ne fehmî wî çî gotê, ger digel
457. Şêr rabû çû *û* êdî qet kes nedî
Pez çerî xweş rehet *û* kefte qedî
458. Anî yek pez min şikêna destîhêj
Hate pêş *û* destê xwe wî kir dirêj
459. Destê an pez girt *û* malî ba delal
Wê demê rabû bezî mîslî xezal
460. Weqtê zuhrê rojekê bêkar *û* bar
Zumre çapik hat *û* gazî kir: Hewar!
461. Cohte merdûm bo Muḥemmed hat *û* bir
Ez nizanim bo birayê min çî kir
462. “Wa Muḥemmed” got *û* rabun mêr *û* jin
Gote Ҳaris: “Wa Ҳelîme wey li min!
463. Hate kuştin der xerîbê berkê ‘eyş
Dê çî bêjim, pêşî salarê Qureyş
464. Pêk ve rabûn xas *û* ‘amê Se‘ diyan
Lê Ҳelîme zû gehîştê an zeman
465. Gote: “Min dî der tebessum le‘lê şûr
Jê diçû çerxa felek ustûne nûr
466. Bûse da min, her du çavên surmeyî
Ew çî bû hate hebîbê min tu yî”

467. Gote min: “Hatin dî merdê ba cemal
Şeklê nûranî, ji nûra layezal
468. Destê min girt û revand anîme hêr
Daniyame erdê û der deste, kêr
469. Sîneya min wî du ker kir ta bi nav
Jê derîna qelb *û* ehşayim tewav
470. Wî bi destê xwe dilêm teqlîbi kir
Nuqteya eswed derîna jê vekir”
471. Gote min: “Ev beħreyê dêwê le ‘în
Min ji te avête der, ey şahê Emîn!”
472. Êdî, anî yek misîn *û* yek legen
Şûşt *û* pak *û* nerm *û* nazik bêmihen
473. Wê demê danîne cî qelb *û* ceger
Mohreke mezin ji nûrê hate der
474. Mohrî kir hem qelb *û* cayê bûye şeq
Hate ser yek ew, ba emrê mîrê Heq
475. Rakirim danîme cih bêzeħmetê
Got: “Bikêşe ba dehan ez ummetê”
476. Ba dehan kêşam *û* ez bûme giran
Got: “Bikêşe ba hezaran her wesan”
477. Hate kêşan *û* me rakir ew hîzar
Gote wî nûrîn cebahê gul ‘îzar:

478. “Ger bikêşî ba cemî‘ê ummetê
Dê girantir bêt ji nûra rehmetê”
479. Herdukan ez dame ber bêhna xwe saf
Her du çeşman û serê min kir tewaf
480. Mîslê berqa xaşîfe, rabûn *û* çûn
Min didîtin ta di çerxê berze bûn
481. Got Hêlîmê, ev beyan û ev meqal
Min ji wê hilgirt *û* em hatine mal
482. Qewmê Se‘dî gote min: “Çi sakîn î?
Rabe hilgir wî bibe nik kahînî
483. Min bire nik kahînî ew qîsse got
Kahînî hilgirt *û* da ber sîne got:
484. “*Uqtulû haze`l xulame* min digel
Wer nê, dê başîl biket dînê Hubel”
485. Nagîhan min dî yekî merdê mezin
Rim li kahîn da, libasê wî kevin
486. Qewmê kahîn bû helak ew *ji* herê
Min Muhemmed anî *û* hatim li rê
487. Min dî yek jin ba girîn *û* şîn *û* ah
Ber kenarê bîrê, bir ser xakê rah:
488. Wey li min, min yek puser bû can *û* pak
Çû di bîran da *û* axir bû helak

489. Min Muḥemmed anî û min gote: “Wer
Mû‘cize ger te hene, dê bîne der”
490. Wî îşaret kir bi tilya nûrîn av
Av bi serkeft û puser ber rûyê av
491. Ew ji avê hate der rabû qiyam
Gote an dem: “*Ya Muḥemmed es-selam*”
492. Hate awazek: “Te‘eccub nîne ger
Ew ji bîra kodekan ku bîne der”
493. Ew te‘eccub bo çawan ew suwar
Dê xelasket van gunehkaran ji nar”
494. Paşê ez çûme serî û her du çav
Lê reşandin ‘enber û misk û gulav
495. Hate dengê hatifi: “Ya Mekketê
Ê ji te hate belê wê hate te”
496. Ketme karê, wê demê ez dem bi dem
Amîne pir jê xerîb e da bibem

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA HEVDEMÎN:

**ZIVIRÎNA HZ. MUHEMMED JI BO MEKKEHÊ VE Û
TESLÎMKIRINA WÎ JI BO DAYKA WÎ**

497. An ker anî û Helîme bû suwar
Hem li ber sîne hebîbê namîdar
498. Rû bi Ke'be hat û ew bêtirs û bîm
Ew kerê çûn xweş me dî hate heftîm
499. Hate goşê an Helîme ev newa
Xweş newayê can fedayê ez hewa:
500. “Ey haţîm û ey harem pak û temîz
Hate bo te bejn û balayê ‘ezîz
501. Hate sulţanê felek jêrî ne'al
Hate cananê du ‘alem ‘eksê xal
502. Hate mehbûbê du sed Yûsif xulam
Hate muxtarê ku ‘erş û ferşî ram
503. Hate bo te ey Mekke weqtê surûr
Sed hezaran nûrê sîmayê binûr
504. Nê tu bûyî menzîla rûhaniyan
Ta qiyamet rukbedarê hâciyan
505. Rast û çep fikrî Helîme kes nedî
Wê di girdaba teheyyur da xwe dî
506. Her peya pey hate awazê şerîn
Muştefa wê daniyan de ser zemîn
507. Da biçîtin telbe ket kanê kî ye?
Xweş dibêjin vê newaya ‘aliye

508. Kes nedît û hateve ew hate rê
Muştefa lê berze bû, ber da girî
509. Deng hilîna wê li banê kûçika
Ah û wah! Durrdaneyê min kê reva?
510. Mekkiyan gotin: “Me hay jê nîne qet
Wê verêhtên av û rohnik bûne şet
511. Pîremêrek hate pêş û ba ‘esa
“Ey Hêlîme! Ev çi hal e bo Xweda!”
512. Min ji bo wî gote halê renc û ah
Gote min: “Wer da biçîne pêşi şah”
513. Ez birim ta pêşî ‘Uzzayê senem
Gote min: “Ev xeybzane, pir kerem
514. Nê hezaran berze wî peyda kirin
Mîslê te bêçare wî pir şa kirin”
515. Secde bir wî pîremêr got: “Ey senem
Ev Hêlîme hatiye bêje te hem
516. Kodekê wê der Mekke winda bû lê
Îsmê an kodek Muḥemmed bû belê”
517. Wî, Muḥemmed gote ‘Uzzayê şenem
Ser nişîvî hate secdê gote hem:

518. “Tu here ey pîro! Ew çi gotin e
Ew Muḥemmed hat û nê ‘ezla min e
519. Sernixûn û şermizar in, em ji wî
Hem kesad û bê ‘eyar in, em ji wî
520. Ew zeman borî, ku em tê xweş bibîn
Baregaha wî gehişt û em revîn
521. Rabe ey pîrê hewayî hate roj
Bes bi navê wî dilê min tu bisoj
522. Nê ji navê wî dilerzin asîman
Hem ji hubba wî kelîne beḥr û kan”
523. Heybetê xweş girte pîrê rihsipî
Wî ‘esa avêt û lerzî mîslê bî
524. Lê Hêlîme gote pîrê hêşetê
Ger çi ez keftime beḥra heyretê
525. Yek demê ba wî li min we‘zê diket
Yek demê seknî bi min reḥmê diket
526. Kodekê min wê revandin xeybiyan
xeybiyanê keskepoşê asîman
527. Ez ji kê nale3m ji kê gazin bikem
Her çi ew bêjîtin, ez dê wî bikem
528. Gotina xeybê îcazet min nebû
Lew dibêjim, Eḥmedê min berze bû

529. Ger bibêjim hal *û* esrarê derûn
Dê bibêjin dîn e, sewda ye, cunûn
530. Gote pîrê: “Ey Hêlîme vê bike
Hemdê Rebbanî *û* hem şukrê bike
531. Haşelîlah ew Muhemmed berze bî
Belkî ‘alem dê di wî da berze bî
532. Bo Muhemmed her zeman *û* her mekan
Şed hezaran nobedar *û* pasîban”
533. Zanî ‘Ebdulmuţţelib ew waqî ‘e
Av *û* rohnik çûn ji çavan damî ‘e
534. Hate ber dergahê Ke‘be ew bi soz
Gote: “Ey ‘alimê sirra şev *û* roz
535. Tu muyeserke wî yetîm
Dîtina asar *û* îhsana kerîm
536. Naşibîte me eger çi ku j’ me ye
Kîmyaya feđl *û* îhsana te ye
537. Tu biheqqê feđl *û* îhsana ‘ezîm
Bêje min eđwalê wî tîflê yetîm”
538. Nagehanî hatî awazek leţîf
Ha *nîha* biçne Tuhameyê şerîf

539. Wê li bin dara Yemamê û xemam
Bûye sîwan û dikeve wî mudam
540. Pir dikin tesbîh *û* der kef munqelîb
Rabû zû çû telbê ‘Ebdulmuṭṭelîb
541. Çû ku rûniştî li bin dara Yemam
Qale: “Men ente eya şîrîn xulam?”
542. Gote: “Ey namêm ji min pirsî bi lez
Ez Muḥemmed îbnî ‘Ebdullah me ez”
543. Gote: “Ez ceddê te me ey rûhê can
Ey ḥebîbê min ‘ezîzê xanedan”
544. Dabû ber sîne, sûwar kir hate mal
Hate malê taze nûra layezal
545. Amînê çav bûne rewşen wes-selam
Hem ji Mewlûda Nebî temmel-kelam

**Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B' eşq û şewqek hûn bi bêjin es-selat**

BEŞA HEJDEMÎN:

PAŞGOTIN

546. Ehmeda! çavê te ma *zaxel beser*
Yek îşareta te *înşeqqel qemer*
547. Hukmê tu carî ji ‘erşî ta bi fers
Ey ji nûra te munewwer ta bi ‘erş

548. Ateşê Mûsa çi bû? ruxsarê tu
"Weddûha" nûra dilê hişyarê tu
549. Der di nûra te, ziyayê mihr *û* mah
Lê me'ellahl-Celîlê barîgah
550. Nê ji ne'leyna te ey durra yetîm
Fexr *û* teşrîf e ji bo 'erşê ezîm
551. Her du 'alem çi siha îqbalê tu
Sonda "*Welleylî*" bi zulf *û* xalê tu
552. Hem tu rûh *û* hem rewanê can *û* dil
Pêşî bejna te siha te bû xecil
553. Canfidayê bejn *û* balayê te bim
Mest *û* sergerdanê sîmayê te bim
554. Şehriyarê çetreyê 'ewrayî tu
Xetîê şeq bû ber felek, tuxrayî tu
555. Şehsuwarê duldulê kewn *û* mekan
Wasîlê wehdet seraya lamekan
556. Min hebin sêsed hezar 'ezman *û* dev
Yek demê xafil nemînin roj *û* şev
557. Wesfê husna te bibêjim subh *û* şam
Sed qiyamet dê biçin hêj natemam
558. Ya Resûlellah! Resûlê îns *û* cin
Ya şefî'ê sedrê dîwana mezin

559. Tu şefa'et ke ji bo me 'asîyan
Werne, nefsa şûme naket qenciyan
560. Ya Kerîm û ya *Îlahel-'alemîn*
Ya Rehîm û ya 'Ezîm û ya Metîn
561. Hêvîdarê rehm *û* îhsana te yîn
Talibê ikram *û* xufrana te yîn
562. Hazirê guhdarê Mewlûda Resûl
Hêviya me tu bikî ya Reb qebûl
563. Nê tuyî Xeffar *û* Settarê 'Uyûb
Me bibexşî *û* bixufrane zunûb
564. Hem li da *û* babê hindî mu' *minîn*
Hem li hindî mu' *mînat*an ecme' *în*
565. Tabi'ê an şehsuwarê ummetê
Pêk ve rabin dê biçîne Cennetê
566. Ewwela bo rewzeya nûrîn *nîqab*
Saniya bo al *û* ezvac *û* şehab
567. Salîsa bo enbiya *û* murselîn
Rabî'a bo ewliya *û* mu' *minîn*
568. Hem ji bo huccac *û* xuzzatan *temam*
Hem ji bo vê meclisa sahib *te'am*
569. Hem ji bo her çar *îmamê* caddeyê
Hem ji bona katibê *vê* nusxeyê
570. Bo cemî'ê Mu' *minînê* salîhe
Bo **Feqîrê Bateyî** el-fatîhe

2. ENCAM

1. Edebiyata Klasîk, wekî derya û behran ya ber fireh, kûr û dirêj e. Di nav de tijî dur, yeqût û mercanê edebîne. Derya û behrek ji wan jî Edebiyata Klasîka Kurdî ye. Edebyata Klasîka Kurdî di hemî waran de ya beyar e û pêwîstî bi xebat û lêkolînên zanyarî û 'ilmî ya hey; da ku ew nirxên edebî û çandî bêne zanîn û ji hunera wan hunermendan bête îstîfade kirin. Lê me dît ku durr û yeqûtên wek Bateyî di vê deryayê de, heta nihe bi awayekî hurgulî û berfireh nehatîne tespît kirin û qîmeta wan ne hatiye zanîn û diyarkirin.

2. Melayê Bateyî wekî dur û yeqûtekî di nav vê deryaya edebî de bi awayek zindî diteyîstîtin. Me bi vê mijarê ve tespît kir ku Bateyî li ser Çand û Edebiyata Kurdî bandorek hêja ya kirî û di warê edebî de wek durr û yeqûtan di nav Cîhana Edebiyata Kurdî de di birisqe û pêşiya şa'îr û hunermendên dîv xwe jî ya rohn û geş kirî.

3. Em bi taybetî li ser "Mewlûda Nebî" sekinîn û me ev berhem ji layê çandî ve vekoland û şîrove kir kaca bi çî awayî bandor li ser çand, ziman û edebiyatê kiriye. Heta nihe çî lêkolîn û vekolînên akademîk bi vî rengî, di derbarê şîrovekirin û hilsengîna Mewlûda Bateyî de nehatîne kirin. Ya ku me tespît kirî, li ser Bateyî û berhemên wî heta nihe tenê du xebatên akademîk yê hatîne kirin. Lê ew jî ne di vî warî de ne.

4. Li ser dîroka jidayikbûna Mela Huseynê Bateyî, lêkolîneran agahiyên ji hev cûda yê dayn. Heta nihe gele lêkolîneran li ser serdema jiyana Bateyî gele agahî yê dayn, lê belê ev agahî ji nivîyê zêdetirîn, di xeletin û di bê belge ne. Li gorî wan Bateyî yê di sala 1414 an di 1417an de hatiye dinyayê û di 1491-1495an de jî wefat kirî. Lê me di vê xebatê de bi çend delîlan ve îspat kir ku Bateyî, yê di sedsala XVIIan de hatiye dinyayê û di sedsala XVIIIan de çûye ber dilovaniya Xwedê.

5. Di derheqê serdema jiyana Bateyî de çawan gotinên bê dedîl û belge hene û lêkolîner di hemfikir nînin, di derheqê navê wî de jî lêkolîneran gotinên bê dedîl û belge di hemfikir nînin. Hin ji wan dibêjin navê Wî "Ehmed" e, hind dibêjin navê Wî

“Huseyn” e û hind jî di bêjin navê Wî "Hesen" e. Lê ji ber çar delîlan diyare ku navê Bateyî yê rast "Huseyn"e û di nav xelkê de wek Mela Huseynê Bateyî tê zanîn.

6. Melayê Bateyî, di helbestên xwe de mexlesa "Feqîrê Bateyî", "Melayê Bateyî", "Bateyî", "Batê" û "Batey" ya bi kar anî. Mexlesa wî ya edebî "Melayê Bateyî" ye.

7. Me tespît kir ku di nav 'alama Îslamêde hemû şa'îrên bawermendên dînê Îslamê û bi taybet jî Şa'îrên Kurdnivîs; di hemû berhemên xwe yên edebî de, bi "besmele", "hemdele", û "selwele"yê ve yên dest bi nivîsa berhema xwe kirîn. Mebeyan kir ku dînê Îslamê bandorek pir girîng ya li ser fikr û ramangerîya van hunermendan kirî. Ji ber vê yekê jî her hunermendekê tesewira zîhna xwe ya bi baweriya xwe ve girêday û berhemên xwe yên bi gotina herî edebî û xweşik Qur'an'a Pîroz ve xwemilandîn û di bin bandora gotin û nivîsa Xweda de mayn û li gor hindê xizmeta zimanê xwe, edebiyata xwe û çanda xwe kirîn. Ji ber vê yekê Quran û kesayetiya Pêxemberî bandoreka mezin û berfireh ya li ser hizr û ramanên Bateyî kirî. Qur'an'a Pîroz di nav helbestên Bateyî de bi gelek şêwaz û cureyên cuda cuda de reng yê veday. Kesayetiya Hz. Muhammed (s.x.l) bandorek mezin ya li ser zimanê Bateyî kirî.

8. Bateyî tesewif naskiriye û bi xwe sofî bûye û têkeliya wî digel sofiyan hebûye. Lêbelê Bateyî wekî rêber û şêx xwe nedaye naskirin. Wî tenê Pêxemberê Xwedê bi dilber û rêberê xwe dizane.

9. Helbestên wî ji aliyê ziman ve jî bihêz in. Zimanê helbestên wî sivik, zelal û asan e. Di helbestên wî de peyvên Erebi, Farisî û Tirkî yê hatine bikaranîn. Lê bêtir bandora Erebi ya li ser helbestên wî hey. Çiqasî peyv û terkîbên Farisî bikar anîbe jî, ev ne qasî bandora 'Erebi ye. Lewra terkîb, hevok û peyvên 'Erebi zehf in. Ji bilî çend peyvên Tirkî pêve çu bandora Tirkî li ser nîne.

10. Mijara teza me berhema giranbiha Mewlûd e. Mewlûd jî berhemek dînî ye. Mewlûdê bandorek dînî ya li ser çand, ziman û edebiyata Kurdî kirî. Bi vê taybetiya xwe ve ziman û edebiyatê jî di hemû qadan de eleqeder dike û bandorê li ser çandê jî diketin. Ji ber vê yekê em bi taybetî li ser mijara têkilî û eleqederiya dîn

û çand, dîn û ziman, dîn û edebiyatê sekinîn.

11. Di mewlûdê de Têkiliya Dîn û Ziman yabhey û me ev yeke bi mînak dana holê. Cih, qad û warê ku dîn bandorê lê diket û xwe dinav de saz diketin, yek ji wan jî ziman e. Bandora ku dîn li ser ziman diket, di jiyana rojane de zimanê ku diête bikaranîn, li gor nirxên binge hîn ên dînî şêkîl digirin û bi dînî ve dixwemilin, ispata vê yekê ye ku ziman li gor dînî şêkîldigire û xwe saz diketin.

12. Bi çend unsûrên edebî, hunerî û dînî ve me bandora mewlûdê ya li ser çand, ziman û edebiyata Kurdî dana holê. Şaîr û hunermendên ku di bin bandora dînê îslamêde mayîn û li gor hindê fikr û ramanên xwe avakirîn; bi vî awayî li ser civakê bandorê diken û bi perwerdekirina civakê ve jî çandê saz diken.

13. Şaîr û hunermendê ku fikr û ramanên wî bi tesewir û felsefe û eqîdeya Dînê Îslamê ve avabûyîn, her çi gotin û nivîsa ji pê nûsê wî derdikeve di bîte peyvek zêrîn û êsîleyekê dîwarê çanda kurdî. Li gor baweriya hunermendî, her peyvek xweşik li beranberî zêrekê ye. Her peyvek xîmekê edebiyatê ye, her hevokê edebî jî xîmê ziman e û her xîmekê ziman jî amûrekê ragihandin û dewlemendkirina çandê ye. Me ev mijare di şexsîyeta Bateyî û berhema wî ya bi nav û deng Mewlûd'ê ve bi mînakên berbiçav danîne holê.

14. Mewlûd'a Bateyî, Berhemek Dînî, Kurdî, Edebî û Çandî ye. Ji ber van taybetiyan, bandora dînî, kurdî, çand û edebî ya li ser jiyana civaka Kurd'an hatiye kirin. Bateyî di Mewlûdê de bi gelek nav, cinavk, sîfat, kirdar û terkîbên cuda ve ya ji Xweda behs kirî û ewî te'rîf kirî û bi civata guhdêr re daye hînkirin û bandorek dînî ya li ser çandê kirî.

15. Bateyî, bi danasîna xweda ve bi unsûrên dînî ve di mewlûdê de, nêzîkî sed beyt yê ji bona fesîhî û beyan kirin û danasîna Xuda vehonandîn û Xuda yê bi lewnekî edebî ve şîrove kirî û daye hînkirin û bi vê rêkê ve jî bandorê li ser civak, jiyana, çand, ziman û edebiyatê diketin.

16. Bateyî, ji bo danasîna Hz. Muhammed (sxl), nêzîkî dused beyt, yêt vehonandîn û Eşq û Evîniya Xwe ya ji bû Hebîbê Xuda anîye ziman. Bi vî awayî ve jî eşq û evîndariya xwe bi guhdarên Mewlûda Nebî ve yêt parvekirîn û divêtin ew jî wek wî bibine aşiq û evîndarên Pêxemberî. Bateyî di van dused beytan de, nêzîkî pencede caran behs û xweberê Pêxemberî diket û bala guhdaran dikêşînîte ser mazinahî û evîndariya Pêxemberî û bi vî awayî ve bandorek mazin li ser çand, ziman û edebiyata Kurdî diketin.

17. Mijara selewatdanê di Mewlûdê de wek rûknekê dînî diête beyankirin û hînkirin. Bateyî ji bo vê yekê jî bi hemû lewn û awayên edebî meth û senayên hêja ji bona Cenabê Muhammed (sxl.) diketin. Bateyî bi wesîleya vê hînkirina mijara selewatdanê, civata Kurd di bin bandora hînkirina terzê Mewlûdê de di hêla û li gor vê perwerdehiyê jiyana wan jî li ser çandê te'sîr diketin. Ev bandor û te'sîra he jî, bi awayek ber biçav li ser çand û kultura civaka Kurdan bandorê diket û avahiyê Çanda Kurdî pê diête xemilandin.

18. Ji ber ku "Hedîs", li gor dînê îslamê çavkaniyek muhîm û duyemîn e. Wekî 'alim û helmestvanên Misilman, Bateyî jî di berhemên xwe de hedîsên bikaranîn û yê ji wan îstîfade kirî. Bateyî bi awayek edebî û şehrezayî yê bi rêka sen'etê Telmîhê ve ji hedîsan îstîfade kirî. Bateyî ev sen'etê Telmîhê, bi hostayî yê bikaranî. Em li ser Hedîsên ku Bateyî bi rêka telmîhê ve behs jê kirî, rawestiyân.

19. Me tespît kir ku çavkanî û referansa Bateyî ya herî sereke û bingehîn, bêguman Qur'an'a Pîroz e. Di Edebiyata Klasîk a Kurdî de, çawa Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî berhemên hêja û bingehîn dayne û ji bû vê yekê jî mijar û çavkaniyên wan yên bingehîn Qur'an û Sunnet bûye, Melayê Bateyî jî yê ji vê taybetmendiye îstîfade kirî û bi vê rêkê ve bandora dînî, ya bi ayetên Qur'an'a Pîroz ve bi rêya Mewlûdê ve bi awayek serkeftî, ya li ser Çanda Kurdî kirî.

20. Me diyar kir ku Bateyî di derheqê Qur'an û Dînê Îslamê de çi qeder xwedî 'ilme û ev zanyariyên xwe bi berhemên xwe ve bi çi awayî bi civaka Kurd re parvekirîn û bi vê parvekirinê ve jî bandorek çawan li ser civak û çanda Kurdî, ziman

û edebiyata Kurdî kirî ye.

21. Hemû ziman di bin bandora dînî de ava dibin û bi pêşve diçin. Bi taybetî, çanda îslamê, ya dibin bandora gotina Xuda, Qur'na Pîroz de may û li gor hindê ya pêkhatî û xwe parastî. Bandora "Çanda Îslam"ê ya li ser hemî nirx û unsûrên çandê hatiye kirin. Bi taybetî jî bandorek giran ya li ser ziman kirî û ziman yê li gora tesewir û bîr û baweriya xwe li gor eqîde û felsefeya xwe bi awayek bingehîn ve saz kirî û li ser gramer û rêzimana ziman xîmên bingehîn yên havêtîn.

22. Dînê Îslamê bi eqîde û tesewira Îlahî ve, bandoreke bê hempa ya li ser hemû zimanên netewên musulman kirî. Ji ber ku netewê Kurd jî xwedî baweriyek sîstemek Îlahî ye, zimanê Kurdî jî para xwe ya ji saz kirina "Çanda Dînê Îslam"ê wergirtî. Ji ber vê bandora dînî, di bingehê tesewura jiyanê de bandorek hêja ya li ser çanda nivîskî û devkî jî kirî û bi vî awayî ve jî; ji çanda civakî heta çanda zanyariya bingehê ku kirinên bingehîn yên li ser îlmê jiyanê jî kirî.

23. Li gor lêkolîna me Bateyî sê berhem yêt nivîsîn: Mewlûd, Dîwan(Helbest) û Hemaîl. Lêbelê ji van her sê berhemên wî, heta nihe tenê Mewlûd û Hemaîl yêt hatîne dîtîn û ketîne destê me. Berhema wî Dîwan heta nihe nehatiye dîtîn. Lê belê ji Dîwana Bateyî, heta nihe 30 Helbest yêt ketîne destê me. Babê Zêrevanî, behsa "Tecwîda Qur'ana Pîroz" û "Eqîdeya Îmanê" diket, dibêjîtin Bateyî xwediyê 5 berheman e, lê ev kitêb windayîne û çu delîl li ser wan di destê me de nînin. Zembîlfiroşa ku Qenatê Kurdo dibêje ya Melayê Bateyî ye, ya ji aliyê A.Sosin ve hatiye weşandin. Lê delîlek weke mexlesê, me peyde nekir ku em bibêjin ev berhem ji aliyê Bateyî ve ya hatiye nivîsîn

24. Bateyî, kîtêba xwe ya bi navê "Hemaîl" di serdema Îbrahîmxanê Mîrê Hekkarî (1700-1742) de nivîsiye. Ev berhem, bêtir ji dua, ayetên Qurana pîroz û peyvên parastina sihrê pêk tê. Ev berhem bi erebî û farisî ye, ayet bi erebî ne û daxuyandin bi farisî ne. Di derkenarên wê de bi kurdî daxuyanî hene.

25. Pîrozbahiyên mewlûdê cara pêşî, bi awayekî fermî di serdema Fatimiyên de, li ser wextê Mu'iz Lîllah (972-975) de yêt hatîne dest pêkirîn. Paşê di serdema

bûrayê Selahaddînê Eyûbî, Atabegê Hewlêrê Muzaferuddîn Gokborû de (1190-1233), di nav gel de yê belave bûyn. Piştî hingê jî ev kevneşopiye ya di nav gelên Misiman de belav bûy û rûniştî. Ev kevneşopiye, hêj jî di nav gelek cîvakên Misilman de, tê pîrozkirin û berdewamkirin.

25. Mewlûd, heta niha bi gelek zimanan ve yê hatîne nivîsîn. Mewlûd pêşî bi Zimanê 'Erebî yê hatîne nivîsîn. Hêj di sedsala XVan de, nêzikî 500 mewlûdên 'Erebî yê hatîne tespîtkirin. Navên mewlûdên 'Erebî bi tevayî “Mewlûdu'n-Nebî” an jî “Mewlûd'u Resûlillah” in.

27. Di Edebiyata Kurdî de nivîsandina Mewlûdê ya bi Melayê Bateyî ve dest pêkirî, di bin bandora wî de ya bi pêş ketî û li gor wê bandorê jî Ekola Bateyî ya derketiye holê. Kevneşopiya Mewlûdê di hemû zaravayên Kurdî de hêj jî berdewam diket, gelek mewlûd piştî Bateyî yê hatîne nivîsîn.

3. ÇAVKANÎ

- M.Xalid Sadinî (2009), *Mela Huseynê Bateyî Jiyan, Berhem Û Helbestên Wî*, Nûbihar Yay, İstanbul, r. 33
- İlhan Ziver (2013), *Mewlûda Melayê Bateyî*, (Teza Lîsansa Bilind, a ne weşandî.) *Enst. zimanên Zindî Zanîngeha Artukliyê, Mêrdîn* r.19
- Hayder Mohammed Othman (2016), *Di Helbestên Melayê Bateyî de Hizr û Rûxsarê*, (Teza Lîsansa Bilind, a ne weşandî.) *Enst. zimanên Zindî Zanîngeha, Van YüzüncüYilê Wan*, r. 45
- M. Zahir Ertekin (2015), “Yekem Mewlûda Kurdî û Bandora Wê ya Li Mewlûdên Dû Xwe”, *Beytüşşebap ve Molla Hüseyin Batevî Sempozyum Bildirileri*, İstanbul: Şırnak Üniversitesi Yayınlar, s. 183-199.
- Ferit Develioğlu (1996), *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Sözlük*, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara, r. 636
- Ahmet Özel (2004), *İslam Ansiklopedisi*, Diyanet Vakfı, cilt29, Ankara, r. 475
- Ayşe Necla Pekolcay(1993), *Mevlid*, Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, r.40
- Hasibe Mazıoğlu (1997), *Türk Edebiyatında Mevlid yazan Şairler*, Ankara Üniv. DTCF Türkoloji Dergisi, c.6., h.1, r.32
- Tayyip Okic (1995), *Tefsir ve Hadis Usulü'nün Bazı Meseleleri*, İstanbul, Nun Yay, s. 45.
- Ferhad Shakely (1998), *Modern Kürt Öykü Sanatı*, wer. Rohat Alakom, Avesta, İstanbul, r.22
- Abdulreşîb Yusuf, *Şairên Klasîk ên Kurd*, wer. Elî Şêr, *Weşanên Jîna Nû*, Uppsala, 1988, r.67
- Tehsîn İbrahîm Doskî û Muhsîn İbrahîm (2005), *Melayê Bateyî Jiyan û Berhem, Spîrêz*, Hewlêr, r.45.
- Rênas Jiyan, *Melayê Bateyî-Mawlûd û Hemû Helbestên Wî*, Ç. Yekem, Weş., Amed 2013, r.55.
- Mehmet Bulut (2009), *Delilleriyle İslam Akaidi*, Erkam Yayınları İst. s. 123.
- Ali Akdoğan, “Kültür ve Din”, *Din Sosyolojisi El Kitabı*, ss.437-451., ss. 447.
- Selim Eren (2007), *İnanç ve Sosyo-Kültürel Çevre Etkileşimi*, Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, Sivas, c.XI, sayı:1, ss. 129.

- Thomas S. Eliot (1981), *Kültür Üzerine Düşünceler*, çev. Sevim Kantarcıoğlu, Ankara, s. 245.
- Fatih Özkan (1997), *Din Kültür İlişkisi*, Teza Lîsansê ya Neweşandî, Ankara, 143.
- Recep Kılıç (2006), “Din ve Kültür”, *Din Bilimleri 2*, Ankuzem Yayınları, Ankara, s. 322.
- Ejder Okumuş (2003), *Toplumsal Değişme ve Din*, İstanbul, s. 343.
- Bayram Ayaz (2007), kovara Demokrat, Hejmar: 1, Bihar, *Ziman û Netewe, Neteweperwerî û Neteweperweriya Zimanî*, r. 33.
- Resul İzeddin Mustafa (2007), *Bir Şair ve Düşünür Olarak Ehmedê Xanî ve Mem u Zîn*, Avesta Yayınları, İstanbul, 341.
- Cem Dilçin (1992), “Fuzulî’nin Şiirlerinde Söz Tekrarlarına Dayanan Bir Anlatım Özelliği”, *AÜ DTCF, Türkoloji Dergisi*, Sayı: 1/X, s. 321.
- Georges Mounin (1964), “Yeni Bir Şiir Okuma ve Dinleme Tekniğinin Doğusu”, *Türk Dili*, Sayı: 114, Mart s.98.
- Ramazan Kaplan (1998), “Edebiyatta Dilin Önemi Nedir?”, *Edebiyat Bilgi ve Kuramları*, Anadolu Üniversitesi AÖF, Eskişehir, s. 78.
- Ferhâd Şakelî (1996), *Mem u Zîn’de Kürt Milliyetçiliği*, Doz Yayınları, İstanbul, s. 322.
- Kadri Yıldırım, *Çeviri ve Kavramsal Tahlil: Ehmedi Xanî Mem û Zîn*, Avesta Yayınları, 2010, r. 54.
- Mehmet Bulut, *Delilleriyle İslam Akaidi*, Erkam Yayınları İst.2009, r. 66.
- Rênas Jiyan, *Melayê Bateyî-Mawlûd û Hemû Helbestên Wî*, Ç. Yekem, Weş., Amed 2013, r.55.
- Nezîr Ocak, *Edebiyata Kurdî*, Weş. Sîtav, Ç.Yekem, Wan 2016, r. 124.
- Osman Aslanoğlu (2017), "Di Mem û Zîn'a Ehmedê Xanî de Hunerên Wêjeyî", *Şarkiyat*, Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi 14-17 Eylül/September, Diyarbakır, s.371
- Ejder Okumuş (2003), *Toplumsal Değişme ve Din*, İstanbul, s. 132.
- Fatih Özkan (1997), *Din Kültür İlişkisi*, Basılmamış Lisans Tezi, Ankara, s. 125.
- Ayaz, b.n.b.r. 145.
- M.Halil Çicek (2009), *Şark Medreselerinin Serencâmı*, İstanbul: Beyan Yayınları, s.74.

Mehmet Tıraşcı (2013), "Güneydoğu Ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler Ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları" C.Ü.

İlahiyat Fakültesi Dergisi, Cilt: XVII, Sayı: 2 Sayfa: 209-236

Mehmet Yanmıř, "*Diyarbakır'da Mevlid Geleneđi ve Bazı İller ile Karşılařtırılmal Bir Analiz*", Uludađ ilahiyat Fakültesi Dergisi, cilt:21 sayı: 1

İbn 'Ařur, Muhammed et-Tahrır, *et-Tahrır ve 't-Tenvır*, Tunus, Dar Suhnun, trs, s. 141

Ahmet Özel, İslam Ansiklopedisi, Diyanet Vakfı, cilt29, Ankara, 2004, r. 475.

Mebâhis Subhi, *Mebâhis fi 'ulûmi 'l-Kur'an*, Beyrut, Daru'l-ilm li'l-melayin, 1988, s. 20.

Abdulkerim Zeydan (2002), *el-Medhal li dirâseti's-Şerâti'l-İslâmiyye*, Beyrut: Muessesetu'r-Risale, 1423/ s. 95.

Nureddin Abdullah Beydavi, b. Omer, *Envâru 't-Tenzıl ve Esrâru 't-Te'vıl*, (Beyrut: Daru'l-Ma'rife, 1434/2013), s.54.

İbn, Ebu Muhammed Atiyye, Abdulhak b. Ğalib el-Endulusi, *el-Muharreru 'l-Vecız*, (Beyrut: Daru'l-Kutubi'İlmiyye, 2. Baskı, 1428/2007), s. 74.

Fazlurrahman (1996), *Ana Konularıyla Kur'an*, Ankara: Ankara Okulu Yayınları, s. 147.

M.Sait Şimşek (2012), *Hayat Kaynađı Kur'an Tefsiri*, İstanbul: Beyan Yayınları, s.399.

Necdet Şengün(2008), "Hz. Fatıma Mevlidi ve Vesiletü'n-Necat İle Mukayesesi"; *Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, s. 234

Emîn Mutabçî (2009), "Quran di Helbestên Cizîrî de" *K.Roşinbîrî Newê*, J. Melsa Yayınları, s. 49.

Ahmet Yıldırım (2009), *Tasavvufun Temel Öğretilerinin Hadislerdeki Dayanakları*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara, s. 277.

M. Zahir Ertekin (2015), AÇAR, Zafer, "Di Kurmancî De Cotepeyv û Cureyên Wan," *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, Ocak, s. 82

4. PÊVEK

1. FERHENG

Aferîd: Xuliqand

Ahû: Xezal

Al: Sor

Aloz: Tevlihev

Asimîn: Yasemîn

Aşna: Dost

Ateşgudaz: Agirhelîn

B

Badenoş: Meyxwir

Badîger: Yên Din

Baxban: Baxçevan

Berçel: Zozanekî Hekkarî Ye

Berr: Erda Rast

Berze: Winda

Bîm: Tirs

Bîmar: Nexweş

C

Came: cil, kinc

Cebhe: alî

Cebîn: anî

Cebîneş: di cebha wî de, di aniya wî de.

Cedd: bapîr

Cemîl: xweşik, rind

Ceyb: dil, semt, berstûk

Ceyş: deng, artêş, tije

Cûd: merdî, comerdî.

Ç

Cam: Piyale
Cebhet: Enî
Cebîn: Enî
Çeng: Amêrekî Muzîkê Ye
Çeşim: Çav
Çetr: Sîwan
Çîz: Tişt
Çogan: Gopal
Çun: Wekî, Mîna
Curh: Birîn

D

Da'î: Gazîker
Darinde: Malî
Darul Qerar: Bihişt
Dêmmelek: Rûmelek
Dilawer: Mêrxas
Dirav: Pere
Duker: Du Parçe

E

Ecran: Guneh
Efxan: Hawar
'Endelîb: Bilbil
'Eqreb: Dubişk
Ewtan: Pirjimariya Weten, Welat
Exter: Stêr
Eylan: Mar
Ez: Ji

F

Fem: dev

Ferwar: daxwaza alîkariyê, hewar

Fewe: kom

Fî'l-ħal: hemen, di cih de

Firdews: navê Cînnetekê

Fuzûn: zêde, pir

Farix: Vala

G

Gencîne: Xezîne

Gîsû: Kezî

Goş: Guh

Goş: Guh

Gulbav: Gula Bi Xunav

Gulpîrehen: Kiras Bi Gul

Gûşdar: Guhdar

H

Ĥasem: pozê pahn û fireh

Hîzar : dîwar an bena derdora bexçeyan.

Hubel: putê herî mezin yê li ser Kabeyê.

Ĥuccac: pirhejmara heciyan

Ĥulle: Cilê ku ji du perçeyan pêk tê.

Hemail: Jina Bateyî Bû, Curreyek Nivîştan

Hingur: Mexrib

Hullepoş: Kesê Ku Xişir Bi Xwe Vekiriye

Î

Îbham: girtî û veşartî hiştin, ne eşkere kirin,

În: ew

Îna: eş û jan kişandin

În'am: nîmet dayîn, kirina qencyê, xêr, bexş kirin

Înşeqqe' l-qemer: heyva ku bû du şeq
Îrtûhal: koç, mirin
Îstebreç: cilê ji hevreşîmê qewîn çêdibe
Îxwan: bira

K

Kan: Jêdera Madenan
Kem: Kêm
Kewkeb: Stêrk
Kodek: Zarok
Kohsar: Cihê Bi Çiya
Kohsare: Çiyayî
Kozî: Çeper

L

La texafû: ne tirse
Lağer: zeîf
Lamekan: yê ku bêcih e, ne mihtacî derekê ye, Allah
Lat û 'Uza: beriya Pêxembertiya Hz Muhammed (saw), hin navên sanemên li Kabeyê.
Lañîf: 1- yê ku qenciyan dike, Xwedê 2- nazik, xweşik
Layemût: yê ku namire, Allah
Layenam: yê bêxew, Allah

M

Mah: Heyv
Mehd: Landik
Mêhr: Roj
Mehweş: Mîna Heyvê
Mêlak: Ceger
Merdîm: Meriv, Mirov
Merg: Mirin

Metleb: Daxwaz
Mexleb: Pencê Teyran
Mîsaq: Peyman
Mudam: Herdem
Mûn: Temah
Muqteda: Serwer
Muretteb: Rêzkiî
Mursel: Hinartî
Mutrik: Terkkirî
Muxnî: Amêrekî Muzîkê Ye
Muznib: Gunehkar

N

Namiwer: Navdar
Namiwer: Navdar
Nedîm: Heval
Ne't: Medh
Netrik: Xişreke Zînetê Ye
Newm: Razan
Nîgar: Sûret
Nîran: Agir
Noşmendî: Vexwarinî

P

Paspan: Nobedar
Pengiyan: Tijîbûn
Pertew: Tîroj
Perwaz: Firîn
Pider: Bav
Piser: Kurr, Law

Q

Qaht: xela

Qemer: heyv

Qendileb: lêv şekir

Qeşra Buşra: devereke li nik wilayeta Şamê

Qeswere: şêr, yê bihêz, yê ku bi temen ji mirov mezintir,

Qeyxan: tije

Qurre: dilşad, biriqandina çavan

Qurş: gilover, daîre

Qamet: Bejn û Bal

Qelûçk: Qalikê Hişk

Qesar: Cil Spî

Qeswere: Şêr

Qulzem: Behra Sor

Qurmiz: Sor

R

Rehmê Fîzakey: Rehmê Belavkey

Rehzen: Rêbir

Rehzen: Rêberr

Remîm: Riziyayî

Rewan: Ruh

Rewşen: Ronî

Rûbar: Çem

Ruxsar: Dêm

Rûzgar: Dem

S

Se'adet: bextiyarî

Sabi': heftemîn

Şabî: zarokê ku hê ji şîr nebûye.

Sabîq: ya berê

Samin: heştemîn

Sefa û Merwe: cihên Heccê

Sefak - sefik: bi şidda, yê ku xwînê dirijîne

Ş

Şêt: Dîn

Sî: Qaz

Şigerf: Delal, Bêhemta

Şimşîr: Şûr

Sivlaq: Navê Mehabadê yê Kevn

Şol: Kar

Solîn: Kanî

Şor: Peyv

Spîndar: Hewr

Sûç: Guneh

Sûf: Hirî

Sufalîn: Axa ku Hatiye Sotin

T

Taban: Ronahî

Temed: Wek

Temr: Xurme

Tenem: Çermê Min

Terim: Laşê Mirî

Tîn: Herî

Tîra Seqîf: Tîreka Gelek Tîj

Tîz: Xoş

Tûba: Navê Darek Cennetê ye

U

Ummu'l-Qura: Mekke

Uqtulû haze'l-gulame: vî bendeyî an vî xortî bikujin

Usqûf: alimê filleyan

‘Uşşaq: pirhejmara evîndaran

‘Uyûb: pirhejmara ‘eyban

Umm Ul Qura: Navekî Bajarê Mekehê ye

W

Wedûd: yê ku hez dike tête hezkirin, Xwedê.

Wehdet: yekitî

Weheb: yê ku hîbe an beşş dike

We’l-leylî: despêka sûreya “Leyl”, Xwedê li ser şevê sond dixwe.

Weqiye: giraniya 400 dirhemî.

Weyhekê!: raweste, bisekine

Wuşta: Nav

Wuşûl: gihastin

We Mam: Wisa Mam

X

Xab: Xew

Xakipa: Axa Bin Pê

Xeberbezîn: Paşgotiniyê Dike

Xeclan: Şermkirî

Xef: Veşartî

Xelex: Şêlû

Xemmas: Fesad

Xemr: Mey

Xer: Ker

Xezra: Kesk

Xired: Eqil

Xirên: Zingîên

Xurşîd: Roj

Xusan: Pelg

Xusran: Xisaretmend

Xwab: Xew

Xwedawend: Xwedî

Y

Yed: dest

Yehûd: Cihû, Yahûdî

Yesar: aliyê çepê

Yexsîr: esîr, dîl

Yûmn: bihêz, bereket

Z

Zar: Dev

Zail: ya demborî, ya ku diqede

Zamîne: kefila jin

Zebîh : yê ku qurbanê şerjê dike, laqabê bavê Hz Îsmail û Hz Muhammed

Zed: lêda

Zeban: Ziman

Zebed: Maddeyeke Bêhnxweş

Zenexdan: Kortika Çeneyê

Zeheb: zêr

Zîba: bixeml, xweşik

Zîba xitab: xweşgo, xweşbêj, zarxweş

Zimzim: gurmîn, guregur

Zûd: zû